ZANÎGEHA WAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

TÊZA LÎSANSA BILIND

# Di Edebiyata Kurdî ya Kevin û Nû da Erkên Rexneyî

Farman Ibrahım Awla

ŞÊWIRMEND

Alk. Doç. Dr.Nesim SÖNMEZ

Wan - 2017

T.C.

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

YÜKSEK LİSANS TEZİ

# KÜRT EDEBIYATINDA ESKI ELEŞTIRI VE YENI ELEŞTIRI ARASINDAKI ELEŞTIRI GÖREVI

Farman Ibrahım Awla

DANIŞMAN

Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN-2017

# ETİK BEYAN SAYFASI

Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında (Di Edebiyata Kurdî ya Kevin û Nû da Erkên Rexneyî):

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına Uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmasında yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi
- Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
- Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

Farman Ibrahım Awla

3-1-2017

## NAVEROK

NAVEROK ..... I
PÊŞGOTIN ..... III
KURTE ..... V
ÖZET ..... VI
ABSTRACT ..... VII
KURTEBÊJE ..... IX
DESTPÊK ..... 1
BEŞA YEKEMÎN ..... 1
1.Di Warê Rexneya Wêjeyê de Destpêkek Giştî ..... 1
1.1. Destpêk û Têgeh û Pênaseyên Rexneya Wêjeyê de: ..... 1
1.2. Destpêk û Têgeh û Pênaseyên modernism ..... 1
2.REXNEYA WÊJEYÊ ..... 3
2.1.Rexne Di Alîyê Ziman De ..... 5
2.2.Rexnegir Kîye ..... 7
2.3. Rexne Di Alîyê Zar De ..... 10
2.4.Pênaseya Rexneya Wêjeyê ..... 10
2.5.Dîroka Rexneya Wêjeyê ..... 12
2.6.Rexneya Rojava ..... 13
2.7. Rexneya Rojhelat ..... 14
BEŞA DUYEMÎN ..... 21
3.RÊBAZÊN REXNEYA WÊJEYÊ ..... 21
3.1 Rêbaza Dîrokî : ..... 21
3.2.Rêbaza Rexneya Civakî ..... 24
3.3. Rêbaza Rexneya Deronî û Şîrovekirina Deronîyê ..... 26
3.4. Rexneya Sîmolojya ..... 30
3.5. Rêbaza Binyatgerî ..... 32
3.6.Corên Şêwazê ..... 33
3.7.Peywendîya Di navbera Rexneya Wêjeyê û Felsefeyê De ..... 34
3.8.Ehmedî Xanî û Rexneya Wêjeyê ..... 40
BEŞA SÊYAM ..... 51
4.REXNA NÛ YA MODÊRN Û POSTMODÊRN ..... 51
4.1.Modêrnîzm ..... 54

4.2.Rênsanis berî modêrnîzmê ................................................................ 58
4.3.Modêrnîzm û Felsefe........................................................................ 60
4.4.Modêrnîzm û Edebyat ....................................................................... 62
4.5.Postmodêrnîzm.................................................................................. 67
4.6. Form û îstatîka ................................................................................. 72
4.7. Girîngîya Naverokê.......................................................................... 73
4.8.Hebûna Rexneya Wêjeyê .................................................................. 76
4.9.Rêbaza Kilasîzim û Rexneya Wêjeyê ............................................... 79
ENCAM .................................................................................................. 85
Çavkanî ................................................................................................... 86

## PÊŞGOTIN

Rexa edebî ya kurdî êke ji wan karên edebî ku gelek vekolîn li ser hatîne kirin di bwarê edebî da , lê ta niha em neşêyn bi awayekî rûn û eşkra dîrok û vekolînên edebî bi taybet li edebyata kurdî bhête diyarî kirin , ev ve kolîne çarçoveka dîrokî û tieyorî û herwesa praktîkî heye ku neşên vi sê liqên vekolînên edebî bi sivkî cuda bikarên.

Li her vekolîneka rexneyî bi gring dihête zanîn ku dîroka evan karên rexneyî dest nîşan bikrît, înca bi awayekî  tiyorî karên rexneyî bas bikrêt , di dumahya evan karan da di bit hemî deqên hozanî ku grêdray bi van karê, rexneyî bas bikrêt ,her êk jiwan şirovekirin û helsengandin û ravekirdnî jibo bihête kirin .

Rexna edebî ya kurdî piştî seda bîstê dîrokeka dyarî krî heye lê berî seda bîstê neşêyn bi eşkra dîroka rexna edebî bas bikrê  , (Ehmedî Xanî û Melay Cizîrî ) ev dû hozanvane dû  metnin di biwarê rexneyî da di nav edebyata kurdî da , lê her deqeka edebî yên ev dû hozanvane ku karî rexneyî leser  hatye kirin , hêşta nikarin bibêjîn ku dîroka rexneya edebî ya kurdî di serdemê wan dû hozanvanan dest pêka rexneya edebye , çarçoveya vê vekolênê  li sê beşan pêkhatye . Beşa êkê çend babetek li xoe girtye .

Di beşa îkê rexneya edebî  hatye naskrin, vêca di alyê zaravê û zimanewanyê hatye wesf kirin, herwesa rexnegir û ew kesên ku karên rexneyî diken hatîne wesf kirin û karu erkên wan hatîne behis kirin , çunkî rexneya edebî yan kurdî anku her edebyateka din çi wekî zarave çi wekî zimanevanî bi awayekî cuda hatîte behis kirin jiber hindê çarçoveya vê vekolînê rexne di her dû alyan behis kiraye .

Piştî nasandna rexneya edebî dîroka rexneya edebî bi awayekî giştî behis kiraye , wekî naveroka vekolînê bi giştî dîroka rexneya cîhanî û piştra jî dîroka rexneya edebî ya kurdî ,piştî rêbazên rexneyî hatîne behis kirin , çunkî gelek rêbazên ravekirna deqê hen mîna rîbazên rexneya edebî behis hatye kirin , rîbazên rexneyî gelek taybetmendî gring bi deqê didet , bi taybet di bwarê vekolînê da û harîkarya rexnegrî diket ku bşêt karên rexneyî wekî karekê ekadîmî encam bidet .

Herwesa naveroka vê vekolînê peywendî dinavbera rexneya edebî u zanista felsefê hatye behis kirin, zanista felsefê êke ji wan zansitên cuda ku behsê jiyana mirov di hemûy biwaran diket û têda vekolît û peywendyeka rastewxo bi hemya jî heye.

Herwesa li çarçoveya beşa dûyê da bandor û peywendî di navbera zimanê edebî û zimanê rexneyî hatîte behis kirin, zimanê rexneyî cudayî heye digel zimanê edebî, ji berhindê bi awayekî taybet cuday ziman di navebera herdû aliyan hatîte behis kirin, herwesa hebûna rexneya edebî êke ji babetên tewera vekolînê, ta niha bîrokên cuda hene li ser vê babetê, çunkî karê rexneyî ekadîmî û me'rîfye .

Di tewera sêyê da rêbaza kilasîk û dîrok û zanyarêyn vê rêbazê mîna çarçoveka rexneyî hatîte behis kirin , herwesa behsê ewan feylesufan hatye kirin ku di çarçoveya rîbaza kilasîk karên rexneyî encam daye , herwesa evan binema û prensîpên edebyata kilasîk hatiye behis kirin , herwesa hemî corên edebyata kilasîk û kilasîkê kurdî hatîte behis kirin , edebyta kilasîk mîna liqeka vekolîna rexneyî be awayekî giştî û edebyata kilasîk mîna edebyateka kevin û herwesa karên rexneyî û hozanên ehmedî xanî hatîne behis kirin , Ehmedî Xanî êke ji wan hozanvanên edebyata kilasîk , dişêyn wekî karên berawirdikrî di navbera edebyata kevin û nû mîna edebyata kevin(kilasîk) bihête wergirtin.Di beşa duwê jî rîbaz romantîk û romantîka kurdî hatye behis kirin , bê guman di navbera herdû rîbazên kilasîk û romantîk cudayeka taybet heye lê di karên rexneyî ev cudaye pitir dibt û hindek caran jî pêwerên vekolînê di navbera herdû aliyan dibine hevdû . ,Herwes xeslet û aliyên rêbaza romantîk bi taybet di karên rexneyî hatîte behis kirin .Di beşê sêyê da rexneya nû u qonaxên rexneya nû ya modêrn bi giştî behis li ser hatîte kirin , rexneya nû pişt rêbazên kilasîk û romantîk û riyalîzm dirust buye , bi awayekî giştî di edebyata cîhanî rexneya nû dîrokeka eşkra û diyar heye , herwesa modêrnîzim û hokarên peyda bûna modîrnîzimê hatîte behis kirin . Vêca peywendî di navbera felsefe û modêrnîzim û post modernizem hatîte behis kirin, di dumahyê dişêyn bibêjîn ev vekolîne berawrid karye di navbera herdû edebyatên kevin u nû.

Farman Ibrahım Awla

3-1-2017

## KURTE

Rexneya wêjeyî an mijara girîng ji qada wêjeyê de ye, ji ber ku ew di nirxandinê û analîzê yên nivîsên rastîn e, ku ew di navbera nivîsên ciyawazî û ji hev vediqetînin nivîsên baş ji yên xerab, ew jî bi karê pêşxistina tekstên û heta carna nivîskarên tekstên. Ev alîkarî bi xwendevanê bibîne ku xalên lawaz û xalên bihêz yên tekstên bi hêsanî. Ev lêkolîn nîşan dide ku xebatên rexneyên modern û pîr, yên ku xebatên rexne li sedsalên buhurî de bi temamî cuda ji yên ku xebatên wê di dema niha ye, ku cudahiyên di prensîbên û krîterên ji nirxandinên text an pîvanên rexneyî yên herdu in rêbazên. Changes carna ji bo karê ji rexneyên ku ji ber rewşa nivîskar, dewletên civakî, mijarên siyasî û aborî û pêşveçûnê yên zanistê pêk ... ..etc.

Rexneya wêjeyî ye her tim ji bo fêm bike, Xelq vekolînin û perçek ji wêjeya. Di wêjeya kurdî, piştî nivîsandina hevîrê pêşî art, rexneya wêjeyî derket holê. Ji ber ku di dema borî de, em dikarin berhemên wêjeyî bigihîjin ne an jî ji ber ku em ji berhemên wêjeyî hatiye nivîsîn ne kirine, em nikarin ji bo ku di çarçoveya navneteweyî de ji bo rexneya wêjeyî me bûn ne. Lê di van çend salên borî de, rexneya wêjeyî pêş dîtin gelek. Em niha dikarin bêjin ku rexneya wêjeyî ya Kurdî ye di asta ku em dikarin wê bi welatên cîran û heta Rexneya wêjeyî rojava hev.

Di vê xebatê de ji rexne û teşbîhî di wêjeya kurdî dîtin, piştî ku ji rexneyên modern li gor vê bi pêş hatiye. in, hin faktorên ku wek sedema pêşketina nirxandin hene, ku krîterên ku ji bo bi text û teşbîhî baş û pêşkeftî li cîhanê di heman wekî di wêjeya kurd in. Ji bo nimûne, Arstovans di şanoya (Beq) di temenê kevn wek prensîbên nirxandin û her trajediya û comedy hate hesibandin, cûreyeke ji van pîvanan nayê li hin helbestên (Shex Razay Talabany) û prensîbên hem jî hene di heman in, da rexneyên rastîn Kurdish convinces ji xwendevanên destê nirxandin û tekstên û cudatir a yek baş ji yek xerab.

# ÖZET

Yazınsal eleştiri, edebi alanın önemli bir konusudur, çünkü bu, edebi metinlerin değerlendirilmesi ve analizi, metinler arasında ayrım yapar ve iyi metinleri kötü metinlerden ayırır, aynı zamanda metinleri ve bazen de yazarları değerlendirir. Metinler. Okuyucuların metinlerin zayıf ve güçlü noktalarını kolayca bulmalarına yardımcı olur. Bu araştırma, modern ve eski eleştiri çalışmalarını, geçmiş yüzyıllardaki eleştiri eserlerinin bugünkü çalışmasından tamamen farklı olduğunu gösteriyor; farklılıklar, metin değerlendirmelerinin ilkeleri ve ölçütleri ya da her ikisinin de eleştirel ölçümleri içeriyor. Yöntemler. Yazarın durumu, toplumsal devletleri, siyasi ve ekonomik sorunları ve bilimsel ilerlemeleri nedeniyle bazen eleştiri çalışmalarında değişiklikler olur ... ..etc. Edebi eleştiri her zaman bir edebiyat parçasını değerlendirmek, incelemek ve incelemektir. Kürt edebiyatında, ilk sanat eseri yazdıktan sonra edebi eleştiri ortaya çıktı. Çünkü eskiden edebi eserlere ulaşamadık ya da edebi eserimiz olmadığı için edebi eleştiri için uluslararası bir çerçeve yaratamadık. Fakat son birkaç yılda edebi eleştiri çok gelişti. Şimdi şunu söyleyebiliriz ki, Kürt edebi eleştirisi onu komşu ülkelerle ve hatta batı edebi eleştiri ile karşılaştırabileceğimiz seviyededir. Kürt edebiyatında edebi eleştiri çalışmaları, modern eleştirilerin ortaya çıkmasından sonra geliştirildi. Gelişimin nedeni olarak Kabul edilen bazı faktörler vardır, dünyadaki iyi ve gelişmiş bir edebi metin kriterleri Kürt edebiyatındakiyle aynıdır. Örneğin, Arstovalılar (kurbağalar) yaşlılık döneminde yaşanan her tragedyayı ve komediyi değerlendirmenin ilkeleri olarak düşünülmüş, (Shex Razay Talabany) bazı şiirlerinde bu kriterlerin bir tür var ve her ikisinin de ilkeleri aynı, Bu nedenle Kürtçe edebi eleştiri, metinleri değerlendirerek ve iyi olanı ayırt ederek okuyucuları ikna eder. (Ahmade Xane) şiirlerine göre kötü metin yoktur, çünkü yazarların gayretlerinin dikkate alınması gerektiğine inanmaktadır ancak (Mallay Jzire), bu davanın Ahmed khane inancına ters düştüğünü belirtmektedir. Iyi ve kötü yazılmış metinlerdir ve bu, edebi eleştiri eseridir.

## ABSTRACT

Literary criticism is an important subject of literature field, because it is the evaluation and the analysis of literal texts, it differentiates between the texts and separates good texts from bad ones, it also does the work of evaluating the texts and even sometimes the authors of the texts. It helps the readers find out weak and strong points of the texts easily. This research shows the work of the modern and old criticism, the work of criticism in the past centuries is completely different from the work of it in present, the differences are in the principles and criteria of text evaluations or the critical measurements of both of the methods. Changes sometimes happen to the work of criticism because of the author situation, social states, political and economic issues and the progression of science…..etc.

Literary criticism is always to evaluate, scrutinize and study a piece of literature. In Kurdish literature, after writing the first piece of art, literary criticism emerged. Because in the past we could not attain literary works or because we did not have written literary works, we were not able to create an international framework for our literary criticism. But in the past few years, literary criticism has been developed a lot. We can now say that Kurdish literary criticism is at level where we can compare it to the neighboring countries and even the western literary criticism.

The work of literal criticism in Kurdish literature has been developed after the appearance of modern criticism accordingly. There are some factors that are considered as the cause of the development, the criteria's for a good and developed literal text in the world are the same as in Kurdish literature. For instance, Arstovans play (the frogs) in the old ages was considered as the principles of evaluating every tragedy and comedy, a kind of those criteria's does exist in some poems of (Shex Razay Talabany) and the principles of both are the same, so Kurdish literal criticism convinces the readers by evaluating the texts and differentiating a good one from bad one.

There is no bad text according to the poems of (Ahmade Xane ), because he believes that the efforts of the writers must be considered, but (Mallay Jzire ) points to this case reversal to the belief of (Ahmade khane), he says there are good and bad literal texts and this is the work of literal criticism.

**Key world: Literary Criticism , Research , Analysis , Tragedy , Comedy**

**KURTEBÊJE**

| | |
|---|---|
| Amd | : Amadekar |
| B | : Berg |
| Ç | : Çap |
| H.r | : Heman rûpel |
| J | : Jimar |
| C | : Cild |
| Ko | : Kovar |
| R | : Rûper |
| T | : Tercume |
| Wer | : Werger |
| Weş | : Weşanxane |
| P | : Pişt le newa û rû le kirrêwe |
| H | : Hespim hewre û rikêfim çiya |
| d.n. | : dîwanî nali |
| d.h. | : dîwanî hemdî |
| d.c. | : dîwanî cizîrî |
| d.e.x. | : dîwanî ehmedî xanî (memê alan) |

# DESTPÊK

## BEŞA YEKEMÎN

## 1.Di Warê Rexneya Wêjeyê de Destpêkek Giştî

### 1.1. Destpêk û Têgeh û Pênaseyên Rexneya Wêjeyê de:

Di alyên edebî da hemu peyvek yan zaravak bi taybetî karê rexneyê bi çend corekê behs têkirin. Peyv û rexnejî wekî ku me di demê pêşde behsa wan kir, Ferhenga rexneyê emê di alîyê zaravede behsa wê bikin , . Rexneya wêjeyê jî pêktê ji nasandina nirx û bihayê berhemên wêjeyî û şîrovekirina wan bi awayekî baş yan xirap.Dikare vê berhemê saz bike û çavkanîyên wê nîşan bide. Rexneya wêjeyê jî çiqek ya wêjenasîyê ye ,Rexneya edebî êke ji wan karên ekadîmî di warê edebî tê encam dan , di gelek vekolînan pênase û têgeh ji bo karên rexney hatîne encam dan , di nav vê vekolînê hemî avan pênase hatîne behis kirin ku di dîroka rexneyî ta niha hatîne nivîsandin û gotin . . Her netewek xwedîyê wêjeyekê be zanîst û qalibek yê xwe jî heye û cîyawaze ji beşên din jî. Ji ber ku sinorekî taybet di wêje nasîyê de heye. Lê belê haya niha dinava gelên rojhelat de yan jî dınava netewan de sinorek ji bo vî beşî ne hatîye danîn. Di pênaseya rexneya wêjeyê de pisoporan gotîye, hewildan û xwe westandi di berjewendîyê armanca takekesan deye.

Peyva rexne di ziman de tê wateya pesendkirina tiştekî yan jî hilbijartina tiştekî di nava civakê û tiştên din de. Her wiha balkêşîya zimanan û cudakirina rastî ne rastî başî û xirabî hemu mijarên wêjeyê cihê balkêşîya lêkolînvana ne. Rexnegirên wêjeyê heya niha jî dikarin bêjin mijarên wêjeyê cihê balkêşîyê ye û ya rexnegir û lêkolînvanane.

Eşkere ye ku rexne wekî hemû şêweyên din ê wêjeyî peywendîya wê jî bi ziman re heye. Di vir de emê bi şêweyekdin qala ziman bikîn. Belê ma heman ziman di hemû şêweyên wêje û rexneyê de bi kartê. Rexnejî wekî wêje peywendîkirine û amrazekî serekî a zimane. Ji ber vê jî dîsan eşkereya ziman tê de dibe.

### 1.2. Destpêk û Têgeh û Pênaseyên modernism

Rexneya edebî wek her babetekên din yên zansitî anku edebî dîrokeka eşkra û diyar heye bi taybet piştî sedeya nozdeyê da , bi taybet adebyata Modêrnîzm , Di alîyek din de jî

sedemê nebûna dîrokek rast a rexneya wêjeyî, pêwîstîya bi rewşenbîrîya kesên civaka kurd û alîyê civakî û ramyarîya wî demî hebû. Peywendîyên civakî û berhem anîn pişde mabûn. Sedemê wê jî yek jê desthilatdarîya dijminan di her çar parçeyên kurdistanê de bû. Qet karekî rexneyî yan jî wêjeyî ne hatîye xolqandin. Her wiha alîyê paşketina fikrî û civakî, nebûna qet pêwîstîyên goncan ji bo rewşenbîr û neteweyê. Yan jÎ durbûne ji çavkanîyên fikrî û wêjeyî û cîhanî yên diraperîna şaristanyeta sedsala 18-19 an a li Ewrupayê de. Lê belê ji dil li gel vî alîyê paşketî de helbestvanên kilasîk yên kurdî, wekî helbestvanên gelêndin hewildane berhemên xwe bi fikrû ramanê rexneyî bi xemilînin. Ji ber ku qet demekî wêjeyî bêyî rexneyekî tejî sud  ne karîye hewildane xwe bi gulan bavêje di nava meydana jîyanê û nexweşîyên civakê de.

Piştê rexneya kilasîk anku kevin Zaravê (modêrnîzm Modernism) yan jî (modêrnîtî Modernitiy) li ewropa peydabû. Bi taybet li niglistan, frensa û elmanya. Bizaveke ji hindek rêbazên edebî û hizrî pêk hat. Gelek fîlosof û nivîskaran pêşbînî bo wê kirne bigre ji (kant, hîgil û heta to digehî markis) bê ku sîmayên wê diyar bikin. Her êk ji wan hat û hindek nêrînên kesatî, berhev bo teyorîzekrin û praktîzekrinê, pîşkêşî civakê mrovatîyê kirin. Berî ez behsê rêbaz û karên wan nivîser û fîlosofan bikim, baştre hindekê li ser têgeh û pêkhatê modîrnîzmê rawestim û nêrînên cuda cuda diyar bikim .

peyva postmodêrnîzmê piştî modêrnîzmê hat da dumahîka modêrnîzmê ragehînt jiberku nikarî wekî edebyatek weke xwe bimînî, herwek hizirmendê frensî (Fransoa Liyotar )dibêjt. Ew bawer dikt têgeh û pêkhatên kevin wek soşyalîzm û markîsîzm û lîbralîzm û... Hitd, neşyan wî mirovê sade û sakar tenah bikin çunkî wek teyorî heta radekê kamlanebûn, belê wek praktîzekrin li gel dorhîlî hevdij bûn. Erê raste wan têgehan neşyan sozên xwe bich bihînin? Eha li vê derê mirov pirsyarekê bazrînt: erê astê pêşkevtna hunerî, edebî, teknîkî, pîşesazî, zansitî, feleknasî û...hitd, bi saya postmodêrnîzmê yan jî rewşengerî û modêrnîzmêye

## 2.REXNEYA WÊJEYÊ

Beşeke ji wan zanîstane ku ji hemûyan re dibêjin; Wêje nasî, beşên herî giring jî ( Dîroka Wejeyê, Rexneya Wêjeyê û Rêbaza Wêjeyê ) ye. Rexneya wêjeyê jî pêktê ji nasandina nirx û bihayê berhemên wêjeyî û şîrovekirina wan bi awayekî baş yan xirap.Dikare vê berhemê saz bike û çavkanîyên wê nîşan bide. Rexneya wêjeyê jî çiqek ya wêjenasîyê ye. Her netewek xwedîyê wêjeyekê be zanîst û qalibek yê xwe jî heye û cîyawaze ji beşên din jî. Ji ber ku sinorekî taybet di wêje nasîyê de heye. Lê belê haya niha dinava gelên rojhelat de yan jî dınava netewan de sinorek ji bo vî beşî ne hatîye danîn. Di pênaseya rexneya wêjeyê de pisoporan gotîye, *hewildan û xwe westandi di berjewendîyê armanca takekesan deye*[1]. Ji bo ew zanyarîyênku mirov fêmkirîne û di hizirde runîştîne dixwazin derbixin ji derve.Elbet ew pênaseya helbestvan û rexnegirê îngilîz ( Matu Arnuld ) danîye her çiqas corek ji renxneya wêjeyê digirt ji ber vê ev heyînd derdiket dinava gelê mede. (*Ji bo dîyarkirina sinorê vê zanîstê pêwîste em qala bingeha wê bikin, cihê wê yê dinava wêjenasîyê de eşkere bikîn* [2]. Li gorî ( Matu Arnuld ) armanca rexneya wêjeyê ne ewe ku tenê başî û xirabîya berhemekê bide nîşandan. *Derbarê başî û xirabîyê de jî ji wê hurtir dibe ku ew zagon û desturên wisan kirîne ku ev berhem bê pesend kirin yan jî ew bune sedemê retkirinê, heya demekê bikare li ser bi hizire* [3].

Peyva rexne di ziman de tê wateya pesendkirina tiştekî yan jî hilbijartina tiştekî di nava civakê û tiştên din de. Her wiha balkêşîya zimanan û cudakirina rastî ne rastî başî û xirabî hemu mijarên wêjeyê cihê balkêşîya lêkolînvana ne. *Rexnegirên wêjeyê heya niha jî dikarin bêjin mijarên wêjeyê cihê balkêşîyê ye û ya rexnegir û lêkolînvanane* [4]. Her çiqas di hinek alîyan de lêkolîn encam daye jî, lê belê sedemê goherînapileya hinek alîyê rexneyê wisan kirîye ku rezneya nu jî zêde pêşbikeve.Her wiha di çend rêzek din de em dikarin di derbarê rexneya wejeyê de

---

[1] Refîq Hîlmî , *Hozan û wêjeya kurd*, bergî êkê , weş.xwêndinî bala , Erbîl 1988,r43

[2] Selîm reşîd salih, *şêwaz di kurte çîroka kurdî da* , weş .wezaretî roşnibîrî ,slêmanî 2005 ,r33

[3] Husîn Muhimed 'Zîz , *yaqut û zimrrutî kurdî, (siruşt û ciwanî )* ,berg3 , weş .sîma .slêmanî 2007,r23

[4] Xalîd Dilêr , *Hêmin û Hejar dost û dijwar* , weş.dîmukrasî 2003 ,r14

bêjîn *Rexneya wêjeyê pêktê ji çalekîya afrêneran ku rexnegir pê bilindibe* [5]. Bê goman şîrovekirina berhemên wêjeyî çawenîya rengvedanê heyînên cor bi cor ê jîyanê di nava berheman de dîyar dike. Hinek caran wekî kêlîyek a zanîsta wêjeyê di rexneya wêjeyê de tê nîşankirin. Rêbaza wêjeyê û dîroka wêjeyê jî di nava xwe de digire. *Li gorî ramanê hinek zanayan rexneya wêjeyê rêgezeke ji rêgeza wêjeyê* [6].

Rexneya wêjeyê di hemu demande şîrovekirinê têxe ser wan pirojeyan ku rexneya wêjeyê pê serî hildide yan jî bi wan berheman serî hildide ku hatîye nivîsandin. Ji kevin heya niha ev berhem jî wekî berhemên ( Homîros,Fircîl, Dantî,Şekspîr, Servatis,Cizîrî û Ehmedê Xanî... hwkd).

Di serdema Yunana kevind de gotinên nivîskar û helbestvanên wî serdemî ji bo çalakîyên berhemên hunerî dihatin gotin. *Di vî welatî de rexneya wêjeyê çêbûye. Çalekîyên wê destpêkirîye*[7]. Bi tayber di serdema Ronensanê de pêşketin di xwe de dîtîye. Bi awayekî berçav rexneya wêjeyê di sedsala 18 an û destpêka sedsala 19 an de pêşketin di xwe de dîtîye. Di nava wêjeya hemu welatên Ewrupa de belavbûye. Yan jî ev serdeme wekî qonaxa dîroka hestyarîya rexneyê bû.

Di kevin de di zamanê Farisî û Erebî de bi şêweyekî mecazî ji bo nasîna ciwanî û ne şirînîya gotina bi kar anîye. Bi wê armancê ku di roja îro de jî li Ewrupa bi kardê.Di binçîne de tê wateya biryar di babetnasîna başî û xirabîya pêşeng û ne pêşengîya wan berhemên ku pêwîstîya wan bi lêhurbûnê heye. *Nivîskaran her di kevin de cîyawazîya wan tê de dîyarkirîne bi pirsyar û rexneya wêjeyê*[8]. Hinekan jî bi li hevdanê ji wan yên din cîyawaztir helsegandin ji bo mijara wêjeyê kirîne. Rexnegir wekî pêşengê xwêneran û berhemên wan e. Helbestvan ( F.A Cokufskî ( 1852-1783 ) dibêje: Dema ku hun helbestên destanî dixwînîn yan temaşedikîn û goh

---

[5] Siwarey Îlxanî zade , *tapobume lîl* , ç1 , weş ,Salhan , Taran 1379 , r43

[6] Ebdula Agrîn , *bandora hizir û netewe li ser çîroka kurdî li kurdistana 'îraqê (1970-1961*) ,ç1, weş ,zanîngeha selahedîn , Erbîl 1999 ,r65

[7] Fazil 'Mir , *awrek le zimanî kurdî* , dezgeha ya çap û weşanê , weş ,wezaretî perwerde , Erbîl 2004 ,r44

[8] Muhemed Bekir , *pexşane şî'rî kurdî* , ç1 , weş ,aras , wezaretî perwerd , Erbîl 2004 ,r78

didin pêşbirkên hunerî di wî demî de hun hest bi xweşî yan nexweşî dikîni. Ji vê pirojeyê re dibêjin tamgirtin. Her wiha dema hun li egera xweşî yan nexweşîya wan karan digerin wê demê jî jêre dibêjin, rexneya wêjeyê.

Rexneya wêjeyê bi wan erk û afrênera serî hildide ku dinava nivîskar û xwêneran de heye. *Ji ber ku rexneya wêjeyê ew hêzheye ji bo nîşandan û pêşkêşkirina çalakîyên nivîskar beru paş dibe*[9]. Mînak rexnegirê Rusî ( Bînankî ) : Bandorek baş li ser wan nivîskaran kir ku di salên 40 ê sedsala 19 an de berhemên wêjeyî binivîsîn. Bi taybet ev bandore liser ( Dostuvîskî ) bi şêweyekî eşkere û dîyar dibe. Bi taybetî jî karkirina rexneyê li ser xwendevanan bi bandore.

Rexney wêjeyî di çaxa kevinde bi şêweyek giştî heya sedsala 17 an ji rexneya Modül pêkdihat. Ji ber ku rexnegirên wî serdemî berhemên edebî di anîn beramberî hev û li gel wan berhemên ku asayî di hilbijartin. Rexneya wêjeyî a nû di sedsala 19-20 tan de dest bi çalekîyan kirîye. Ji berîya rexneya wêjeyî rexneya hevçerx, kilasîk û ya şîrovê hebû. Di nav bera her du beşan de jî cîyawazîyên cuda hebû. *Rexneya wêjeyê ji bilî alîyê serekî erkê wê ê di alîyê zar û ziman de jî hebû û bi vî awayî hatîye pênasekirin*[10].

## 2.1.Rexne Di Alîyê Ziman De

Eşkere ye ku rexne wekî hemû şêweyên din ê wêjeyî peywendîya wê jî bi ziman re heye. Di vir de emê bi şêweyekdin qala ziman bikîn. Belê ma heman ziman di hemû şêweyên wêje û rexneyê de bi kartê. *Rexnejî wekî wêje peywendîkirine û amrazekî serekî a zimane. Ji ber vê jî dîsan eşkereya ziman tê de dibe*[11]. Di çarçuveya ziman de dîsan em destpê bikin. Dema em qala erkên ziman dikin di du alîyan de em ê bêjin: Li gorî fikrên fîlozofên ziman du erk cih digire. *Biryardana*

[9] Emad Weysî Xald , *cefeng dihozana ryalsitîka kurdî da devera behdînan 1991-1970* , dezgeha spîrêz , weş, wezareta perwerdê ,Hewlêr 2004,r98

[10] Eristotalîs , *hunerî şî'rî* , weş.xana wergêranê , Silîmanî 2005,r43

[11] Rolan Bart , *çêja deqê* , çapa îkê, weş.minare , Hewlêr 2007,r67

*buyeran û xistina ser ya bi karanîna zimanê asayî tenê erkekê dide fêmkirin*[12]. Girekîyan bingeha şaristanyeta rojava di felsefe û hunerê de damezirandîye her ew jî wekî bingeha rexneyê hatîye danîn.

Peyva Rexne ( Kritik ) ji Girekîyan ango Yunanîyan hatîye. Ev peyvjî di bingeha xwe a kevin de du wateyan dide. *Wateya ( Cudakirinê ) wata vê jî ( Wateya hikum yan jî helsegandin Her wiha peyva Rexne ji girekîya kevin û hizirîna ewrupîyan hatîye. Erkê rexneyê jî ji rengê xwe reng girtîye*[13].

Ev peyv jî di ferhenga İngîlîzî de bi vî awayî hatîye bi karanîn.

n : Critik : Rexnegir.

Adj : Critical : Nêçîra xeletîyên xelkê.

n : Criticism : Rexne

*Vctransc : Criticisize : Rexne girtin.*

*n ( Frensh ) : Critigue : Bi firensî Rexne*[14].

Her wiha di fehenga erebî de jî peyva ( Alnqd ) beramberî peyva rexne bi karhatîye. Her wiha di hemu zimanê dinde jî bi vî awayî cîyawaz kirîne.

---

[12] Hîmdad Husîn , *derwazyek ji bo rexneya edebî ya kurdî* , çapa îkê , weş,mukiryanî,Hewlêr 2007,r9

[13] Refîq Hîlmî , *Hozan û wêjeya kurd, bergî êkê* , weş.xwêndinî bala , Erbîl 1988,r72

[14] Ebdî Hacî , *çend tiyorên rexneya edebî* , çapa îkê , dezgeha spîrêz , weş .hacî haşm , Hewlêr 2008 ,r113

## 2.2.Rexnegir Kîye

Rexnegir : Ew keseye ku berhemekê yan hunerek yan jî muzîkekê û her berhemekî din di mejîyê mirovde pêşkêşî xweşî nexweşî û xeyal û tamjê girtinê xeleîyên wan dinirxîne. Yan jî xeletîyên mijarekê dîyar dike û karê şîroveya rexneyî derdixe holê. Em di karin dî alîyê rexnegir de jî çend pênaseyan dîyar bikin.

**Rexnegir :** Ew kese ku pêwîste piportîya wî hebe di hemu alîyan de, yan jî ew kese ku rewşenbîr be û bi temamî pêşketîbe. *Da ku bikare başî û xirabÎya mijarê dîyar bike. Her wiha jî hêza biryardayînê hebe û biryarekî yek alî bide di derbarê mijara wêjeyî de*[15].

**Rexnegir :** Ew kese ye ku pêwîste pisportîyek baş di derbarê dîroka gelê xwe û yê din de jî hebe. Qet nabe rexnegir xwe bi dîroka zanyarîya a di derbarê gelê xwe ve girê bide. Ji ber ku hinek caran jî mijarên wêjeyî ê bîyanî jî tê pêşberî rexnegir. Di nava mijarekî bîyanî de dema buyerek dîrokî a wî gelî tîne bêxe di nava mijara xwe deîste rexnegir zanyarî li ser hebe daku bikare karê xwe encam bide.

**Rexnegir :** Pêwîste rexnegir dialîyê aqil, hiş û temen de bi temamî pêşketî be. Her wiha Îradeya biryardayînê jî hebe di her rewşekî di navde yan jÎ guncav be ji bo şîrovekirinê. Her wiha di dawîyê de karê rexnegir bi bawernamê ve jî girêdayî be. Ew kesê ku karê rexnê dike pêwîste bawernama wî jî gelek bilind be. Hinek caran jî liser jîrî û nasîna kese.

**Rexnegir :** Hunerekî wekî hunerên dine ji bo karê wêjeyî pê bi nirxîne. Dîyarkirina hemû xeletî û nîşakirina di karê wêjeyî, ramyarî, şanoyî de. *Rexne wekî beşek ji zanîsta wêjeyê ye, di alÎyê naverok de peywendÎyek bi hêz li gel her du beşên din Dîroka wêjeyê û rêbaza wêjeyê de heye. Her du beşên din bi hevre kardiki*n[16]. Ev karkirine jî di rîya rexneyê de encam dide. Dinava rexneyê de çend yasa hene taybetin bi rêbaza wêjeyê û dîroka wêjeyê. Di alıye mıtode de hîn zêdetir nêzîkî

---

[15] Perêz Sabîr *, rexna edebî ya kurdî û pirsa nûkrinê* , dezgeha aras , weş.aras 2006, r66

[16] Ezîz Gerdî *, rewanbêjî da edebyata kurdî da* , weş.şarewanî , Hewlêr 1975,r39

rêbaza wêjeyê ye. Di alÎyê Rîkariş de jî wekî amêrekî pêşkêşkirinê ye her zêde jî nêzîkî Dîroka wêjyê ye. Ji ber ku rexne bi şêweyekî zîndî hinek heyînên dîrokî destnîşam kirîye.  Pêwîste, Rexneya wêjeyê beşû lêkolîneye ku peywendî bi pênasekîrina lêkdan û şîrovekirina berhemên wêjeyî ve heye. *Di binyatê de jî zincîrekî zaravayîye bi hevre pêwîste ji bo dabeşkirina grupên şîrove û lêkdana wêjeyî*[17]. Pirtûka nu jî bandorî di wêjeya ingîlîzî de ( Bingeha Rexneya Wêjeyê ) de heye. ( Rîçardz ) di sala 1924 an de belavbuye li gel ( Rêbaza Rexneyê ) a ( Nusrub Frabye ) di sala 1957 an de belav bûye.

Karê Rexneyê : Ew hunera nirxandin û pênaseya karê wêjeyê ku huneran ji tiştê ne rêk cudadike. Di çaxa kilasîk de ( Arîsto- Lon Canîs- Horas ) yek ji wan rexnegiran bu ku di ciwanîya rexneyê de kar dikirin.*Her wiha di çaxa rêxistina pêşketina İngilîz de jî ( Sidnî ) helbestvanê ingilîz jî bandorek zêde li ser rexneyê hebû.*[18]

Beşa rexneyê di zimanê erebî de beraberî peyva ( Alnql ) bi kartê, di ferhengên din ê zimanê erebî de em dibînîn ku rexne ji pêktê ji cudakirina duhem û deranîna baqilan. Ev gotina kev ji bo vê wateyê bi kar hatîye . ( Sîyûye ) dibêje : Tenfî bedha, Alhsî fî kl cahre lfî aldnaîz tnfqad alsîyq Her wiha peyva Rexne di zimanê erebî de bi gelek beşan de bi karhatîye ji van. *Bi wateya pereye, Bi wateya cudakirina dirav ji bo cudakirina başî û xirabane. Bi wateya temaşekirina gotina ji bo cudakirina rastîya wan tiştan û eyba wê derxistine* [19]. Piştre di reftarê din de û piştr di zaravayê taybet ( Astlah ) de anîye ji bo wan zanyarîyan ku gotinê baş û xirap ji hev cuda dike. Rastî jê cuda dike , ew cihê ku xeletî tê deye zanyarîyan jê derxîne. Dizimanê erebî de ew kesêku karê rexneyê dike jê re dibêjin  ( Alnaqd ) Di zimanê erebî de jî rexne heman armanca wê heye ku di zimanê din de jî bi kartê. Her ji bo

[17] Ferhad Pîrbal , *rîbazên edebî* , çapa îkê, weş.minare , Hewlêr 2006, r12

[18] Mela 'Bdalkirîmî muderîs, *bedî' û zeman û 'eruza namî* , weş, dar cahiz , Bexda 1991,r181

[19] Muhimd Bekir , *pexşane şî'rî kurdî* , weş .Aras , çapa îkê ,Hewlêr 2004,r82

cudakirina xirabî û başîyane. *Ka em di zimanê kurdî de jî, bizanîn rexne çawe û ji bo çi bi* kartê[20] ?

Ji ber ku karê rexneyê di wêjeyê de giran û pêwîstî bi eşkerekirinekî zêdeye. Di ferhengên kurdî de ji wan jî ferhenga Şêx Mihemedê Xal û Ebdulkerîm Muderîs û ferhenga Estêre bi vî awayî amaje jêre hatîye kirin.Di ferhenga Şêz Mihemedê Xal de bi vî awayî peyva Rexne eşkere kirîye.

( Rexne ) rexne **رەغنە ( رەخنە )**

Rexnegir : Rexnegir **رەخنەگر : رەغنەگر**

Rexnegirî :Rexnegirî[21] **رەخنەگرى : رەغنەگرى**

*Her wiha di ferhenga Estêra Geşe de jî bi vî awayî peyva rexne eşkere kirîye[22]*.

Rexne: Nqd, antqad, tcîb, tndîd.

Rexnegir : Naqd Mnqd

Rexnegirtin : Nqd

Rexne jê girtin : Tqd û antqad alşxsî.

---

[20] Fuad Reşîd , *bunyadgerî di roşnibîrî û rexneya edebî ya kurdî* , îketya nivîserên kurd , çapa îkê, weş.arabxa , Kerkuk 2007,r9

[21] Heval Selîm teyb , *bunyadgerî di nav rexneya kurdî da* , destipêkê heta sala 2003ê , çapa îkê , dezgeha spîrêz , weş , hacî haşm , Hewlêr 2006,r88

[22] Yasrê Hesen , *wexerek di nihênyên deqêda* , ji weşanên îketya nivîserên kurd , Dihok , weş . Hawar 2004 ,r67

## 2.3. Rexne Di Alîyê Zar De

Di ziman giştî de hemu peyvek yan zanîstek bi taybetî karê rexneyê bi çend corekê behs têkirin. Peyv û rexnejî wekî ku me di demê pêşde behsa wan kir, Ferhenga rexneyê emê di alîyê zaravede behsa wê bikin. *Di nava civakê de dure ji wateya asayî ku ji bo rexne, rexnegirtin û karê rexneyê bi kartê*[23]. Ji ber ku karê rexneyê û rexne di wêjeyê de wekî bazarekê li gel zanîstê dike. Ka em nîşan û asayîya vî corê zanîstê dîyar bikîn. Pêwîste em îşaret bi wan kesan bikin ku divê meydanê de karkirîne. Li ser navê eşkerekirina binyata rexneya wêjeyî de kar kirîne, bizanîn çi binemalek ji bo dîyarkirina asû û alîyên rexneya wêjeyê danîne. *Li gorî Firensîyan ev pêkhateya rexneyê bi vî awayî bi navkirîne. ( Littreire) ( Lectririgue )*[24].

## 2.4.Pênaseya Rexneya Wêjeyê

Karekî fêrkirinê ye yan pesnîye li ser karekî ê dariştinê hukum û şîroveyekî hevdayî be. Her wiha di alîyê zaravayî de di zimanê erebî de ev peyv heya ne gehiştî serdema Ebasîyan wateya wê ( Zaraveya Xwe wernegirt ) di pêşîya wan de jî bi wateya Gazindkirin bikar dihat.Ji bilî vê jî ji bo cudakirina xirabî Û başîyê jî bi kar dihat. Lêkolînvan vî karî bi vî awayî eşkeredikin.

Herî zêde rexneya wêjeyê li ser vê şîrove têkirin li gorî temaşekirina wêjeyê û karê wêjeyê. Ji ber ku rexne li ser wêjeyê encam dide, di alîyê zarava de jî di wan pirtûkên ku di alîyê wêjevanan ve nivîsîbîn di derbarê ziman û wêjeyê de amajeya rexneyê kirîbîn. Her yek ji wan bi corekî cuda vê babetê di nirxînîn. Mînak :

*Di pirtûka Mihemed Mendurde dibêje : Giringîya rexneyê ewe ku lêkolîna karê wêjeyê ye ji bo xwêneran alîkarî dayîne ji bo fêmkirin û tam jêgirtinê. Ev jî di rêya zanayê siroştî wêjeyî dîyar dibe di alîyê bi nirxan de*[25] . Her wih dibêje : ( Yek ji

---

[23] Fazîl Mecîd Mehmud, *Xiwezayî di Hozanên Goran da* , Çapa Îkê , Weş. Serdem , Silîmanî 2007,r 9

[24] Kakey Felah , *karwanê hozana nû ya kurdî* , bergê îkê , weş.zanîngeha selahedîn , Hewlêr 1987,r72

[25] EBidalqadir Muhimed Amîn ,*wêneya şî'rî di edebyata romansîzm ya kurdî* , çapa îkê , weş. Serdem Silîmanî 2002 ,r108

wateyên rexneyê, hunera lêkolîn û şêwaza cudakirinê ye. Ev jÎ eger di wateya berfireh e şêwaza fêmkirinê dibe pêwîste ew ê bizanîn ku armanca şêwazê her gotina zimanîye. Belku armanca wê di wê de ye çawe nivîskarê giştî ye û ev rêye di gotinê de hizirîna hestkirinê wekî yeke ) .

Eger li gorî vê pênaseyê be, erekê rexneyê gelik ji wê giringtire ku beşek ji nivîskaran tenê bi gazind û ramanê xwe di mijaran de lêhurbûna zanîna bi nirx a mijarê li hev dide. Belku ji vê zêdetir jî mijara wêjeyê giringî pê dide û nûbûnekî akademîk jêre dike. Ji bilî nivîskarên pêşî nivîskarekî din jî bi navê ( Dr. Mihemed Lefweyî ) fikrê wî ew e ku *Cewherê rexneya wêjeyî pêktê ji bi destxistina alîyê fêmkirina hunerî di berhema wêjeyê de û cûdakirina wê ji yên din. Ev jî sedemê şîrovekirin û li hevdana dawî de jî biryara dawî tê ser* [26]. Ji bilî van nivîskaran hinek cîyawazîyên din jî tê dîtîn ku di dawîyê de emê eşkere bikîn. Her yek ji van jî bi corekê pêwîste. Hinek ji wan li ser rexnegire bi kesekî matmayî re dike. Hinek ji wan jî rexnegir wekî dadwerê alîyê wêjeyê dinasin. Li gorî wan hukumdana li ser her mijarekê bi armanca nukirina karê rexneyê ye wekî karekî dadwer tê temaşekirin. Mînak : Yek ji wan pênaseyan dibêje : ( Rexneya wêjeyê matmayînê dike li ser temaşekirina berhemên nivîskaran. Ji bo hevçerxan jî şîrovekirin û nirxandine. (*Di pênaseyek din de jî dibêje :*

*Rexneya wêjeyî hukumeke li ser sifet û nirxê tiştên ciwan*[27]. Çi di alîyê wêjeyê de yan jî di malikên dinde rexne wateyekî duwemîn jî heye ku zêdetir sinordare. Ew jî pêktê ji şîrovekirina nîşanên berhemên wêjeyî yan hunera yan jî dîyardeyên sifetan).

Zareveta rexneya wêjeyê piştî hemu wan hevdanan û pênaseyan ji bo wan em dikarin bêjin: ( Rexneya wêjeyê pêktê ji nirxandina mijarekî wêjeyî bi şêweyekî rast. Mijarek beramberî mijara din bi mercekê matbûn kirîbe li ser ramanekî hur û ya beraber de. Destnîşankirinekî wia kirîbe li ser zanyarîyekî bingeh de ji bo hukm wa heya demekî nêzîkî rastîyê be.

---

[26] 'Elaedeyn Sicadî , *edeba kurdî û vekolîna le edeba kurdî* , weş. Me'arf , Bexda1967,r16

[27] Ezîz Gerdî , *rexne û edeb* , weş,hiwadis , Bexda1974,r72

Di zimanê kurdî de peyva rexneya wêjeyê zaraveyekî nuye û babetîye. Beramberî zaravayê *( Alnqd Aladbî ) a erebî ( Critieisim ) ingîlîzî bi kar hatîye. Ji ber ku babeta rexneyê babetekî zêde firehe*. Ji ber vê jî heya niha bi temamî pênaseyek a rexneyê di ziman û zaraveyê kurdî ne hatîye kirin. *Lê belê her yek ji nivîskar û bîrmend û helbestvana li gorî xwe pênaseyek cuda ji bo karê rexneyê kirîye*[28]. Ji van Dr Kamîl Bsîr dibêje : ( Rexnesazî zanîst û hunerekî li hevdayîye. Dikar teksta wêjeyî başî Û xirabî cuda bike. Wateya rast û ne rast nîşan dike ). *Ev jî a herî raste ji wan pênaseyane ku jibo rexne di wêjeya kurdî de kirîye. Ji bilî wê jî corên cîyawazjî qalkirîye*[29].

## 2.5.Dîroka Rexneya Wêjeyê

Her babetekî wêjeyî çêbûn, derketin û serîhildana wê dîrokek taybet a xwe heye. Ji ber ku qet tiştek nîne bi serê xwe çêbibe, belku di çend hewildan û qonaxan re derbaz dibe heya çêdibe. *Di wêjeya cîhanê de wekî ku me di pêşîyê de qala wê kir rexneya wêjeyê li gel rêbaza kilasîk serî hildaye*[30]. Em nikarin bêjin mijar mijar li gel vê rêbazê bû. Lê belê di derdura dîroka vê rêbazê de bûye. Yekem hewildana vê zanîsta nû dizivire ser serdema Yunanîyan. Eşekereye ku destpêka sedsala rexnê yekem car di karê Komedî nivîsê binav û deng ( Arîsto Tales ) de derketîye. Arîsto Tales, di şanogerîyê de binavê ( Beqekan ) rexne li wan helbestvanan girtîye ku di helbestên xwe de rêwresmên olî dayîne alîyekê. Di vê derbarê de helbestvanên me komedya nîşan dane. Tiştên wisan nîşan nedane ku li ser şanoyê de şanazîyê bi xwe bike. Lê belê her çiqas dijmin boxtanya helbest tawanbarkirîne û henekan bi nîştîman kirîne. *Ew dixwazin îro bersiva wî tometê bidin. Ev jÎ yekem hewildana serhildana dîroka rexneya wêjeyê bû*[31]. Di gelek çavkanîyan de ev hatîye rastkirin. Dîroka biçûka a Şano nameya Beqan wekî destpêka dîroka rexneyê danîye.

---

[28] Usman Deştî *, nawerkên siyasî û civakî di hozanên hêmin da* ,weş.ofsêtî tîşk , Silîmanî 2003,r19

[29] Perêz Sabîr*, bînay hunerî di çîroka kurdî da* , heta cenga cîhanî ya dûyê , weş.serdem , Silîmanî 2001 ,r78

[30] Husîn 'Arf , *çîroka hunerî ya kurdî ,1960-1925* , weş.dar tba'e ,Bexda 1970 ,r11

[31] Kameran Mukrî ,*çîroknivîs* , weş.sumerye , Bexda 1988 ,r89

Bi vî awayî helbestvan û komedî nivîs neçar bûn ku beraberî temaşevana renga reng bikin di karê xwede. *Bi vê re destpêka rexneya wêjeyê di wêjya hemu gelekê de her bi vî awayî destpêkirîye*[32]. Bergê helbestvan bi xwe berhemê wîye beramberî xekê. Ev destpêke serbi wêjeya erebîye raste ku hizrên rexneyê têde hene. Yekemcar jÎ di helbestan de reng vedaye. Bi vî rengî destpêka rexneya erebî jî di serdema pêş îslamê de dinava helbestvanan de peydabû. Ji bo demekî dirêjî her wisan maye. *Helbestvan jî destpêkê hewla wê dide ku dilê gelê xwe razî bike di dema cejnê de helbestan ji wan re digotin*[33]. Pişre wisan lêhat ku her hozek di bajarekê de li gelhelbestvanên xwe diçun pêşbirkê. Yekem car rexnegir pispor nebûn rexne bigirin. Belku xelkê hoza wan ê gohgiran ev kar bi cih dihiştin. Dema ku helbestvanek baş dibihîzîn pesend dikirin û hewar dikirin. Xelat jî didan helbestvan. Eger helbestê wan ne li gora dilê wan ba serbi helbestvan de diçûn. Eger wisan be di dîroka helbestên helbestvanan de rexne derdiket holê.

Li gorî dîroka rexneya wêjeyê em dikarin dîroka rexneyê dabeşî ser bi du coran bikîn.

## 2.6.Rexneya Rojava

Destpêka vê rexneyê dizivire ji bo zanînê û di wêjeya Yunan deye. Wekî ku me di pêşdejî qal kir. *Yekemîn hewildana vê jı dem derketî di şano nama Beqan de behsa wê hatîye kirin*[34].

Hibijartin û helsigandin mijara xwe yekek bu ji çalekîya rexneyê. Ji ber ku bi çend pîvanên hunerî hizra mijarê hilbijartîye. Her di vê dîrokê de waneya sedsala pêncem a pêşîya zanînê de ev şano nameye hatîye eşkerekirin û karê rexneyî jî li ser hatîye encamdan. Li gorî çavkanîyên dîrokî di şano nameya Beqan de fikrên rexneyî ê di derbarê van her du helbestvan û fîlozofan de ( Yurbîdîz û Esxîlos ) eşkere kirîye.

[32] Êbîh Muhimed Husin , *afret di çîroka kurdî da* , weş.îketya nivîserên kurd , Dihok 2004, r102

[33] 'Bdalirhmin 'Bidulxefur Husin , *ezmûnên nûxwazî di alyên grûpên nukrî* , zanîngeha koye2012,r18

[34] Kemal M'ruf , *edebyata kilasîk û nû xiwazya kurdî* ,  weş.jîn,Silîmanî 2003,r67

Dîyartirîn çalekîya rexneyê ji alîyê yunanîyan û fîlozofên wê ve bû. *Fîlozofên wan ê herî dîyar û heya niha jî fikrên wan mayîn ( Eflaton û Arîsto ) bûn*[35].

Li gorî ( Eflaton ); helbestvan nikarin rastîyê bi gehînin xelkê û li cihê başîyê bide fêrî wan bike xeletîyan nîşa wan dike. Wisan bi wan bike ku hemu tiştê xwe bi de hest û sozan ne ku bide aqil.

Her çiqas fikrê Arîsto jî di derbarê vî hizrê ( Eflaton ) de, *berhemên helbestvanan bi sud dibîne taybetî jî berhemên Tirajedya ku ya wîye dikare hest û soza tirsê ji wan paqij bike*[36]. Arîsto di vê berhemê de, ku bi navnîşana ( Hunera Şiir ) gelek destur û zagonê hunerî ji bo tirajedyayê dariştîyeû buye bingeha rêbaza rexneya ewrupa. Bi giştî buye bine malarexneya kilasîk a nu. Wekî rêbazekî wêjeyî di sedsala 17 de li Firansa serî hilda û pêşketîye.

## 2.7. Rexneya Rojhelat

Yeke dine di qonaxa dîroka rexneyê de di wêjeya erebî de bi giştî serîhildaye. Ev qonax dikare di nava Tirk û Farisan de jî wekî qonaxa serhildana rexneya wêjeyê bê nasîn. (*Li gelvê jî helbestvanên pêşîya serdema îslamê pabendê corek şêwaza hunerî bûn*). Ji bo dilsozbûna pîvan û rexneyê ne dikarîn di vê pîvana rexneyê bidin alîyekê. Helbestên wan û qesîdeyên wan dirêjbin ku tê de qala geşteya xwe bikin. Rêyekê ji xwe re bibînîn û jê derkevin ji bo armanca xwe. Ev karên rexneyê jî nêzîkî berhemên sitayîşê ne. *Di rexneya rojhelat de ji berî hemu tiştekê pîvana sitayîşê wekî pîvana rexneyê bi kartê*[37].

Rexneya wêjeyê dîrokekî ne ronî heye. Ji bo serhildan û derketina vê zanîstê gelek fikrên cîyawaz hene. Çi di nava wêjeya rojava yan jî rojhelat de be, em dikarin bêjin; dîroka rexneyê di zivire ser wê berhema wêjeyî a ku serî hildaye. Ji ber ku karê

[35] Goran, *Dîwanî Goran* , Muhemdî mela Kerîm , weş.korî zanyarî îraq, Bexda 1980,r87

[36] Kamil Husin Besîr , *rexne sazî û dîrokên peyrewkirin* , Bexda 1983,r49

[37] Nalî , *Dîwanî Nalî* , lêkolînewe û lêkdanewey 'bidulkirîmî muderîs û fatih 'bdaulkirîm û muhimdî melakerîm , Bexda 1976,r14

rexneya wêjeyê ser berhema wêjeyê encam dide. *Heya niha li gorî lêkolînên wêjeyî ê kevin berhemê wêjeya me malikin di hemu wêjeyên zimanê din de*[38]. Ji bo vê jî dinava tezê de me bi pêwîstî zanî ye ku amaje bi malikên ( Helbestê ) bidîn. Ji ber ku ev kar armanca me ne, rexnejî di gel peydabûna helbestê ji dayîk bûye. Ji ber ku helbestvanan bi xwe ramanê wan hebu di derbarê wan helbestên ku di nivîsînin. *Her ji ber vê jî pêwîste em bizanin malika ji bo rexneya wêjeyê çîye*[39] *?*

Malik wekî hunerekî di hunera ciwanîyê de wekî yek ji çalekîyên mirovîne. Her li gel goherîn û berbi pêşçûna mirovan de li gorî şêwe û goherînê de ye. Beşekî çespaw ne bû. Lê belê li gel vê jî pênaseya zêde hebû ji wan ( Malik hestekî wijdanîye ku ev heste gelek dure ji wan tiştên nu ku bikarin behsa wê bikin. Ne hizre ne endîşeye ne soze ji ber ku malik pêwîsteev hemu tê de kombibin. Hemun yek ji van bêyî ya din malikê çênake, bi xwe eger biçe alîyê tiştê kurt ew dibêjin malik îlhama deronîya mirovane. *Di dilê wan kesan de çêdibe ku hunerek cîyawaz hene di mejî de*[40].

Li gorî peyv û gotina cîhanî ev gotin bi xeyalî tê gotin û nîşa kesên din jî tê dayîn. Ji bo vê em herî zêde balê bidin ser armanca lêkolînê emê bi hurtir dîroka wêjeyê destnîşan bikin. Herî zêde li gorî raman û gotinên fîlozof û hunermendan rexneya wêjeyê ji alîyê Girekîyan ve bi du qonaxan re derbaz bûye. ( Qonaxa helbestvan û fîlozofan her çiqas helbestên heblbestvanan wekî ji corê destanê ji bo lîrîk amîz bû û piştre bi corê şanogerîyê serxistîye. Li gorî hinek lêkolînanên wêjeyî di karê rexneyê de Şano wekÎ yekemîn berhema wêjyî a karê rexneyê hatîye danîn. *Ev pêşketin û derketine şano wekî rêkeftekî nebû belku karekî cihihê tamgirtina xelkêye*[41]. Helbestvanan jî ji ber wê di xwestin xelk berhemên wan pesend bikin. Giringî bi helbestên xwe didan û şêwazên nu jî ji wan re dianîn. Ev jî mînakek a bi

---

[38] Nî'mit Alle Hamd nihêlî , *deravek ji rexnê* ,weş.hawar ,weş. Êketya nivîserên kurd Dihok ,2010 ,r89

[39] Yasrê Hesen . *Wexerek di nihênyên deqê da* , rexne û vekolîn , weş. Êketya nivîserên kurd Dihok 2004, r78

[40] Reşîd Findî , *geryanek di nav edeba kurdî* , weş. Êketya nivîserên kurd ,Dihok 2005 ,r89

[41] Emîn 'Bdulqadir , *têksit di navbera gotara rexneyî û rêbazên edebî da* , weş. Êketya nivîserên kurd, Dihok 2008 ,r18

hêza rexneyê ye. Helbestvanan li gorî vê rexneyê di sala ( 2800 ) de zêdetir koka xwe di zemîna şaristanyeta Girekî de kotayîye. Li gorî peresandina vê şaristanyetê pêşketîye.

Her ji ber vê jî her mijar di keve ser şaristanyetê hîn zêdetir a Girekîyan. Di vê şaristanyetê de emê bibin serkêş, her ji ber vê jî emê ji şaristanyeta Girekîyan destpê bikin. Ji ber ku wan bingeha vê zanîstê nivîsandîye. Herî zêde karê rexneyên serdema Girekîyan karkirinek li ser tam,xweza, hinek tiştên civakî, reftar û hemu xelk li gorî wê diçin.Cara dawî jî kêm kêm pisportî jî tê de peyda dikin. Ji bilî ewan yê ku karê rexneyê dikin, carnan helbestvan, nivîskar û xwendevan jî bi ne fermî vî karê rexneyê dikin. Helbestvan li gorî xwezaya xwe peywendî bi rexneyê ve heye. Ji ber ku ew jî xwedîyê kel û pelê sore ku ew jî fikrê temaşevana bi zane û fêm bike ka çi li bazara nêçîrvana heye. Nêçîrvan kel û pelê helbestvan jî dertêxe bazarekî bi nav û deng. Alîkarîya jîyana vê cîhanê dide.

Helbestvan bi xwe pêşengin di lêkolîn û şîrovekirina mijarên wêjeyî de. Ji ber ku kesayeta nivîskar gelek cudaye ji ya kesekî din ku karê rexneyê encam dide. Hemu helbestvanek cîyawaze di karanîna ritma serwayê çi di beyt, rêzik, û gotinên berhemên din ê wêjeyî de. (*Bi bawerî dibêjim hemu xwendevan tamekî baş ji berhemên helbestvanan werdigirn. Dema ku helbestvan qala mijarekî wêjeyî dike*[42].

Pisporîya helbestvan gelek bi bandor û cîyawaztire li ser lêkolînkirina mijarekî wêjeyî ne ya kesekî din. Gelek helbestvan dema helbest û malikan dinivîsîn cara destpêkê belav nakin belku dinivîsin li cem xwe digirin û piştre nubûnê tê de çêdikin.*Gelek carana beşek ji malikan kêm dikin yan jî rêzikên ku rexnejê hatî girtin di avêjin û dubare dinivîsîn*[43]. Ji dil jî ev ezmuna helebstvan zêdetir dike ji ya kesekî asayî radibe karê rexneyê dike. Her di destpêka rexneyê de gelek hewildanana çav li zimanê helbestan ku karê rexneyîye, her çiqas dibêjin her ji ber vê em dikarin bêjin helbestvanan hizir û fikrê rexneyê çespandîye. Ev dîyar de jî wekî derketina dîrokê

[42] 'Ebdula Agrîn *, karîgerî bîrî netewey le geşesendî kurte çîrokî kurdî da* , weş. Zankoy selahedîn , Hewlêr 1999 ,r89

[43] *Şêx Rezay Talebanî* , dîwan , Bexda 1946, r78

zêdetir di çaxa kevin û wêjeya kilasîzmê de derketîye. Em dikarin di vir de amaje bi rexneya wêjeyî a erebî bidîn ku piştî Girekîyan bi şêweyekî cîyawaz derketîye. Li gorî hinek çavkanîyên rexneya wêjeya erebî nêzîkî 150 sal pêşîya belavbûna ola pîroz îslamê derketîye. Wekî ku me di pêşîyê dejî qala wê kir bajarê Mekê bazara Ukaz cihê saxkirina berhemên wêjeyî bu. *Ji alîyê ( Nabxe Alzubyanî ) ku hem wekî helbestvan hem jî wekî rexnegir karê xwe dikir*[44]. Gelek helbestvanan helbestên xwe di anîn cem wî jî ewî jî nubûn jêre çê dikir.

Ev çavkanî bingehekî giringe ji bo wêjeya erebî. Ji ber ku hukimdan û beramberî hebû di nava mijar li ser mijara wêjeyî de. *Ev mînaka rexneyî çi di wêjeya cîhanî yan erebî, Turkî , Farîsî û Kurdî de jÎ berhemekî ya serhildana destpêkirina karê rexneyê ye*[45].

Dîroka rexneya wêjeya kurdî di nava dîroka wêjeya cîhanê de gelek kevne. Wekî gelek zanîstên din jî cara destpêkê li Yunan serî hilda. Di destpêkê de bi awayekî sadebû lê hêdî hêdî pêşket û gohertin bi ser da hat heya li ser destê fîlozofê mezin ( Arîsto ) bi şêweyekî berçav ket ber destan. Di vî demî de hinek rexne wekî şîroveyê hinek jî wekî nujenîyê bi hinek rêziknamê civakî reftarî û têkstî temaşeyî rexneyê dikir. Rexneya wêjeya kurdî wekî beşekî giring ê wêjeyê girêdayîye bi hinek sedemê serekî yên nav xweyî. Serhildana rexneya wêjeya kurdî di her çarparçên kurdistanê de wekî yek nebûn belku her yek li parçeyekê derketîne. Di başurê kurdistanê de Mijarên Babe Tahirê Hemedanî wekî destpêka karê wêjeyê tê zanîn di nav wêjeya başur de jî em dikarin bêjin bûye destpêka rexneya wêjeya kurdî jî. Em dikarin berhemên wî jî dîyar bikin, bê pirsgirêk em dikarin bikin destoêka rexneyê. Ev berhem jî pêşîya 1000 salane.

Em dikarin bêjin ew şêwazê hunerî a berhemên Babe Tahir pê nivîsîye em dikarin bêjin şêwazekî a hunera bilind bû. Ew jî belgeyekî rexneyî a wî demî de hebû. Ji ber ku bêhêzîya berheman nîşane ji bo rexneya wêjeyê. Lê belê qet

---

[44] *Mehuy* , dîwan , vekolîn ( mela 'bdalkirîm muderîs û mhimdî mela krîm ) ,çapa dûyê , bexca 1984,r44

[45] 'Bdalle Yasîn 'Elî , *peydabûnî rexney edebî le şî'rî klasîkî kurdî ta cengî cîhanî yekem* , (master) , Hewlêr ,r62

belgeyek nîne ku bi pexşan nivîsî be. *Di wêjeya kurdîya bakur de jî gelek berhemên wêjeyî hene. Em dikarin çêbûna dîroka wêjeya kurdî bi wê bidest bixin*[46]. Çavaknîyê rast jî Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanê û Feqîyê Teyrane. Her wiha berhemên Mela Mensurê Girkendî di sedsala 16 an de nivîsîye. Mînak ji bo vê babetê jî eve; *Em dikarin di alîyek dinde dîroka wêjeyê lê bikolîn*[47]. Dîroka rexneya wêjeyê dibe pileya pêşketina wêjeya xwe. Her çi qas kurdî jî be em dikarin destpêka çêbuna pêşketina wê destnîşan bikîn. Eger wisan be pêwîste li piştî berhemên *Babe Tahir ê Hemedanî û Melayê Cizîrî Xanî em berê xwe bidin folklorê*[48].

Folklor Pêktê ji efsane, çîrok, gotinên pêşîyan û pendên pêşîyan, beyt, sitiran û desturên ayînî...hwd ev hemu di binçîneya wêjeya kurdî dene. Her wiha rewşenbîrên wêjeya kurdî dem bi dem ji nameyekê ji bo nameya din maye. Herî zêde jî di mizgeft û malan de hatîne gotin. *Her wiha ji kevin de bi dirêjî dîroka dîrokekî çir û pir berhemê şopên vî gelîne*[49]. Di nav van berhemên dewlemend û rengînde şeklê gelê kurd jî di nav de dîyare. Eger em dinava mijarên kurdî de çend mijarên asayî û sadeyî ê rexneyî bînîn, bi şêwaza malik,pend, metelok û amrêrên foklorên din. Lê belê di vir de em nikarîn ji bo derxistima dîroka serhildana reneya wêjeyê bi foklorê ve girê bidîn. Di wêjeya cîhana kurdî de dema ku dîroka her zanîstekê bi temamî nasnekîn berhem ji nakeve li ber destê nivîskarên me jî. Di wêjeya folklora kurdî de pêwîste em vê bizanîn kîjan berjemê wêjeyî nivîsye û li ber deste dîrokekî gelek kevin jî hebe.Kevintirîn berhema wêjeyî a hatî nivîsandin wekî destpêka wêjeyê jî tê nasîn. Her berhemek di destpêka wêjeyê de bê danîn ew dibe karê rexneyê.

Dîroka serhildana rexneyê di vî demî deye. *Ji ber vê jî wêjeya nivîsî bi şêweyekî giştî ew a ku ji sedsalên borî de ketî ber destê me tenê wêjeya hunandîye*[50]. Ne wekî wêjeya pexşane. Ji ber ku di wî serdemîde hunandî bi zimanê wijdanî bû. Bi karanîna

---

[46] Refîq Hîlmî , *Hozan û wêjeya kurd, bergî êkê* , weş.xwêndinî bala , Erbîl 1988,r14

[47] Selîm Reşîd Salih, *şêwaz di kurte çîroka kurdî da* , weş .wezaretî roşnibîrî ,slêmanî 2005,r72

[48] Muhemed Bekir , *pexşane şî'rî kurdî* , ç1 , weş ,aras , wezaretî perwerd , Erbîl 2004 ,r62

[49] Mes'ud Muhemed , *zarava pêwanesazî* , weş , roşnibîrî , sumer , Bexda 1988 ,r72

[50] Nefîsa Esma'îl Hacî , *teknîka vegêranê di kurte çîroka kurdî fazl 'umerî da* , ç1, weş , îketya nivîserên kurd –Dihok , weş .hawar ,Dihok 2005 ,r44

hest û soz li gorî wê ne bû ku wêje li bendê bû. Bi vî awayî em dikarin bêjin: *Rexne li cem kurdanjî wekî li cem gelek gelên din dinava helbestvanan de çêbûye. Em jî vê didîn destnîşan kirin ku piştî wêjeya folklora kurdî pileya helbestane*[51]. Belku di kevinde karê rexneyê wekî karekî akademîk ne bû. Belku rexne sade û di hicreyê Mizgeftê, dîwan û cihên din de diruniştberhemên hev du dikirin karê rexneyê. Em dikarin bêjin rexne karekî kevne di wêjeya cîhanê de. Wêjeya kurdî jî raste ji ber ku em dikarin bêjin dinava civaka kurdînîyê de gelek kevne û derketîye holê. *Bi hurî û bi ramanên hur em dikarin biryarê li ser wê bidîn ku destpêka çaxa niha de jî me ne bihîstîye ku berhemekî rexneyî bi pîvanên rexneyî pêşketîbe û zanîstî be*[52]. Her yek jivan pîvanên rexneyê pêktên ji pîvanên sade, gitugoyên asayî, ciwanîya peyvan û bi tenê bûye rêziknama vî karê rexneyê.

Belku sedemek din jî ew be ku heya niha kesekî wisan me ne bu ku vî karê rexneyê bike. Ji ber ku di karê rexneyê de ji bilî hebuna giringîya mijara kesê rexnegir ji ya hemuya girîngtire. Wekî zincîre mijarekî û rexnegir bi hev re girêdayîye her du bi hevre karê rexneyê encam didin.

Di alîyek din de jî sedemê nebûna dîrokek rast a rexneya wêjeyî, pêwîstîya bi rewşenbîrîya kesên civaka kurd û alîyê civakî û ramyarîya wî demî hebû. Peywendîyên civakî û berhem anîn pişde mabûn. Sedemê wê jî yek jê desthilatdarîya dijminan di her çar parçeyên kurdistanê de bû. Qet karekî rexneyî yan jî wêjeyî ne hatîye xolqandin. Her wiha alîyê paşketina fikrî û civakî, nebûna qet pêwîstîyên goncan ji bo rewşenbîr û neteweyê. Yan jÎ durbûne ji çavkanîyên fikrî û wêjeyî û cîhanî yên diraperîna şaristanyeta sedsala 18-19 an a li Ewrupayê de. Lê belê ji dil li gel vî alîyê paşketî de helbestvanên kilasîk yên kurdî, wekî helbestvanên gelêndin hewildane berhemên xwe bi fikrû ramanê rexneyî bi xemilînin. Ji ber ku qet demekî wêjeyî bêyî rexneyekî tejî sud ne karîye hewildane xwe bi gulan bavêje di nava meydana jîyanê û nexweşîyên civakê de.

---

[51] Xalîd Dilêr , *Hêmin û Hejar dost û dijwar* , weş.dîmukrasî 2003 ,r23

[52] Ebdula Agrîn , *bandora hizir û netewe li ser çîroka kurdî li kurdistana 'îraqê (1970-1961)* ,ç1, weş ,zanîngeha selahedîn , Erbîl 1999 ,r33

*Bi vêre eexne û berhemên wêjeyî heryekê di alîyekê de temam dikin. Bi alîkarîya her duyan kar dikin li ser çêbûna berhemê goncav ê wêjeyê*[53]. Karê rexneyê ji bo rastkirina wêjeyê û ciwanîya rek kirina berhem û mijarên wêjeyîne. Wate nabe ku karê rexneyê beşekî asayî û wesfî be ji ber ku hemu karên rexneyê di xizmeta wêjeyê deye. Bi giştî bi vî rengî em jî her di destpêka vî karî de biryarekî wisan di çespênin ku em jî wekî gelên din xwedîyê berhemên wêjeyî bîn. *Ji ber ku em xwedîyê wêjeyekî dewlemendbîn,li ser kilasîkî û rêbazên dine*[54]. Ji bilî wan helbestvanên ku me qala wan kirîn di başur û bakur de em dikarin bi giringî pesna binemala bedirxanîyan jî bidîn li şamê. Her wiha ew rojname û govarên kurdî yên pêşîya sedsala 16 an derketin. *Hemu yan jî rupelekê yan jÎ çend rupelekê ji bo karê wêjeyî û çend berhemên wêjeyî danîne. Ewa ku bi destê me ketî serdema serhildana dîroka rexneya wêjeyakurdî di zivire ji bo serdema Babe Tahirê Hemedanî.Berhemên wêjeyî ê kurdî dikevin de hejmarek zêde jê winda bûne*[55]. Eger gelik bi eşkereyî dem û dîroka rexneyê destnîşan dike.

Her çiqas winda jî bûne heya niha wêjeya kurdî û nivîskar û dîroknivîsan ne karîne bi rastî serdema serhildana wêjeyê destnîşan bikin. Her karekÎ rexneyî pêwîstî bi berhemekî wêjeyîye her ji ber vê jî dîroka serhildana karê rexneyê ne eşkereye. Ji bilî her du parçên başur û bakur li her du parçeyên Rojhelat û Rojava de jî hiç mijarekî pêwîst li ber dest de nîne ku bi kare bi serhildana wêjeya me di alîyê parçeyan de destnîşan bike.

---

[53] Eristotalîs, *hunerî şî'rî,* weş.xana wergêranê , Silîmanî 2005, r98

[54] Perêz Sabîr *, rexna edebî ya kurdî û pirsa nûkrinê* , dezgeha aras , weş.aras , 2006,r98

[55] Rolan Bart , *çêja deqê* , çapa îkê, weş.minare , Hewlêr 2007,r102

## BEŞA DUYEMÎN

## 3.RÊBAZÊN REXNEYA WÊJEYÊ

### 3.1 Rêbaza Dîrokî :

Yekemîn rêbaza rexneyê ye di nav çaxa nude. Ev rêbaze zanyarîyên jîyanî, xwezayî, civakî, nivîskar û lêkolînvanan li ser berheman derdixe holê. Rêbaza dîrokî şêwazekî rexneyîye Li cem wan rexnegiran buyerên dîrokî bu balkêşî derxist ji nirx û bihayê berhemên wêjeyî. *Her wiha dema ku ev rêbaze li ser berhemekê lêkolînê dikin wan buyerên dîrokî yên wî serdemî ku di mijarê de nivîsî derdixe*[56]. Ew reftar û rewşe di demê berhem hatina mijarê de derdixe. Di rastîyê de rexneya wêjeyê wekî sedemek ê lêkolîna dîroka wêjeyê tê danîn. Di derbarê vî fikrî de ; ( Dr Salih Fesel ) : *Eşkere dike ku ev rêbaz pêwîstîya wê bş wan tiştan heye ku yê di mejîyê mirovan de çêdibe. Ji çaxekê heya çaxa din hatîye gohertin*[57] . Rêbaza dîrokê buyerên dîrokî, civakî sîyasî ji boxwe dike amêrek ji bo şîrovekirina wêjeyê û nasandina hemu heyînan.

*Eger di fêmkirina helbestên wêjeyî de wekî hemû berhemên ciwan rexneya dîrokî her çiqas bi sud û pêwîst jî be nikare wê berhemê dewlemend bike*[58]. Ji bilî wê ew kesên ku hewildane di alîyê dîrokê de rexneyê li helbestvan û nivîskaran bike. Di rastî de her carê bi xwesteka xwe hiç tiştek ne kirîne li ser jîyana helbestvan û nivîskaran. Ew soz û bandorîye bi zindî derketîne. Eger em ew helbestvan û nîvîkarên ku me qal kirî pesend bikîn rewşa wan û şêweyê wan jî emê behs bikin ku ketine di bin bandora hest, fikrê pak û resenû bilind. Eger ji wan acizjî be peywendîya jîyana wan yan jî yan jî rengvedana jîyana wan di berhemên wan de bi şêweyekî ne hemwar bê bandor derdikeve. Ji ber ku ziman çêkera wêjeyê ye. Ji ber vê jî wêje qet nabe nermî tê de hebe. Wêje di encama berhemên mirovan de derketîye holê. Ev wêjejî bi huner û rewşenbîrîya hemu zimanan deslemend bûye.

Ji ber vê jî rexnegirê firansî ( Hîbulît Tîn ) wiha dibêje : Dîroknasek dikare wêjeya gelekê di jêr navê vê rêbazê de şîrove bike. Ev jî sê sedemên serekî dinav xwe de

---

[56] 'Bdalxalq Î'qubî , *rexna edebî û dibistanan* , weş.aras , Hewlêr 2007 ,r123

[57] 'Ezîz Gerdî , *rewanbêjî da edebyata kurdî da* , weş.şarewanî , Hewlêr 1975,r122

[58] 'Ezîz Gerdî , *serwa* , dezgeha aras , weş , aras , çapa îkê , Hewlêr 1999 ,r112

digire. ( Xweza, Rêgez, Çerx ) ango karê wêjeyê ji alîyê nivîskar ve tê danîn. Ev nivîskare jî di encama bandora van sê rêbaza van berheman tîne ew jî evin. *Reftara nivîskar û jîngeya dinav de peyda bûyî di vê çaxê de jîyayîye*[59]. Li gorî ramanê rexnegirê fernasî fakturekî jingeyîye di heman şêweyê rêbaza civakî deye. Her ji ber vê jî belku wêneyekî civakîye . Hişmendîya dîrokê jî bi peydabûna rêbaza romansî re derketîye. Bi vê rêbazê ve hatîye girêdan. *Piştre jî Emrîkî û Ewrupî jî girtîye di sedsala 19 an de di Elmanya de jî peyda bû*[60]. Em rêbaze herî zêde di alîyê demde qala wêjeyê dik. Bawer dike ku Hişemdîya wext bi rengekê ji alîyê mirovan ve hatîye girtin. Li gorî vê ramanê mirov dinav dem de li piştî zagona pêşketinê û hişmendîya xwe dibîne, hinek fikrên cuda jî di derbarê rêbaza rexneya dîrokê de emê eşkere bikin ji bo lêkolînê di berhemênwêjeyî de :

*Fikrê Yekem : Pêwîste ev nivîskara di rêya wê xwezayê de bê nasîn yan di nav de mezin bibe. Ev fikre hinek lêkolîn vanan wekî rexnegirê Firansî ( SAnt Bîf ) bu*[61].

Fikrê Duwem : Di nava fikirên rexnegir û helbestvanên ingîlîz de ( Samuîl Kulrdc ) bi xwe dibêje: Li gorî ramanê vî peywendîyekî kur di navbera nivîskar û xwezayê de heye. Di dawîya sedsala 19 an û destpêka ya 20 an de rêbaza dîrokê di nav karên ( Gostaf lansûn ) berdest bûye. Ev nivîskare pirtukekî bi navê ( Rêbaza Lêkolînê Di Nava Dîrokê ) de danîye. Xalên giştî di nava rexneya dîrokê de derxistîye. Di nava rexneya wêjeyê de dubare beşê dîroka wêjeyê û rexneya wêjeyê destnîşan kirîye. ( Lansun ) Misogerî li ser dukumanta dîrokê kirîye. Di nava lêkolîna rexneyê de pêwîstîya wê bi dîroka wêjeyê heye. Ew kesê ku lêkolîna wêjeyê dîyar dike her wekî wî lêkolînê li ser dîroka deronîya mirovayetî û şaristanyeta netewî jî dike. Di encamê de ev kese digehe rêxistina hizir û jîrîya mirovatîyê. Bersivdayîna kesan fakturekî giringe ji bo lêkolîn û tamgirtinê di nava rexneya wêjeyê de. Lê belê pêwîste rexnegir kesayetîya xwe di nava rexnegirtinê de neke . Pêwîste rexnegir hest û soz û fikrê xwe bixe di nava rexneyê de. Her wiha pêwîste rexnegir hemu ramanê

---

[59] Ferhad Pîrbal , *rîbazên edebî* , çapa îkê, weş.minare , Hewlêr 2006,r99

[60] Mela 'Bdalkirîmî Muderîs, *bedî' û zeman û 'eruza namî* , weş, dar cahiz , Bexda 1991,r15

[61] 'Alî Tahîr Hesen , *rexneya bunyadgerî di tiyor û praktîzekrinê* , ,çapa îkê , weş,dezgeha serdem , Silîmanî 2008,r89

nivîskar li ber çavan bigire. Bi kurtî rexneya dîrokêı di çend şêweyan de xwe di razîne. *Hinek caran hewil dide di nav xweza helbestvan û berhemê de corê peywendîyê çêbike. Di vî demî de babet û qehremanê destanê buyerên helbestvana xweye û di gotinê de jîyana xwe zêdetir tiştekî din nîne*[62]. Hinek caran jî hewil dide ku berhemê helbestvana wekî neynîkekê nîşan bide.

Buyer û serpêhatîyên dîrokî bûye hêvênê berhemê di rastîyê de. Ev corê rexneyê jî tenê hewildanekî ji bo bi destxistina peywendîya di nav bera du gotina û peywendîya wan bi hevre heye. Bi her rewşê rexneya dîrokê li gel hemu rexneyan ne razîye ew di serî de be. *Rêbaza wê wekî hemu rêbazên din sudê xwe heye lê bê sudî kêmasîya xwe nîne*[63].

Di rexneya dîrokî de yekemîn pêngava lêkolînê ye di rastîyê de. Bi kurtî dîroka wêjeyê armanca rexneya dîrokîye. Ji ber ku lêkolîn û pirsyarê dîroka wêjeyî ji bo lêkolîna mijara nu sud û bibandore. Di heman demê de eger em bizanîn lêkolîn ji bo biryardana lêkolîna dîroka wêjeyê û rexneyê bi taybet rexneyawêjeyê peywendî bi mijara nu ve heye. Ev fikre jî ne raste. Cîyawazîya rast a di navbera rexneya dîrokê wêjeyê di vê de ye ku dîrok wekî her dîrokek din di rêya rexneyêde belgenameyekî biditê û li ser mijara wêjeyî lêkolîne bike. Lê belê rexne ji bilî vê şêwazê dikare bi şêwazek din bi mînakên bi sud di rêbaza rewşenbîrîya civakî û deronasîyê de werbigire. Her ji ber vê jî em dikarin bêjin nivîskar û rexnegir û helbestvan di sê keresteyên serekî de berhemên wêjeyî di karê rexneyê de giringîyê bidinê.

---

[62] 'Ezîz Gerdî , *kêşên hozanî dinav klasîkyeta kurdî û cuday dinavbera 'eruza 'erebî û farsî* , weş .wezareta roşnibîrî , Hewlêr 1999 ,r44

[63] 'Bidulqadir Muhimed Amîn , *wêneya hozanan dinav edebyata modêrnîzm ya kurdî* , weş.serdem , Silîmanî 2002 ,r45

## 3.2.Rêbaza Rexneya Civakî

Rexneya dîrokî bervajî çû û goherî corekî din yê rexneyê ku jêre dibêjin rexneya civakî. Rêbaza rexneya civakî yek ji wan rêbazane ku wekî rêbazekî serekî di lêkolînên wêjeyî û rexneyî de rolekî girîng dibîne.

*Di vir de civak pêwîste çavkanî ji bo vê rexneyê di destpêka sedsala 19 an de li firansa wêje bi vê civakê şîrovekirîye*[64].

Rêbaza rexneya civakî girîngîyê bi çavkanîya serekî dike. Ji ber ku wêje bi rengekî zindî bi civakê ve girêdayîye. *Rexneya civakî pêktê ji xwendina Dîrok, civak, bîr û baweî, aydolojya û rewşenbîrî* [65]. Dinava tekstê de dîsan peywendîyekî ji dil dinava vê civakê û rêbazê de heye ku tê de berhem hatîye. Di rexneya civakî de bandora wêjeyê li ser civak û her wiha bi bandora cibakê jî li ser wêjeyê heye. Wateyek din di alîyê alîgirên ser bi rêbaza rexneyê gotina wan li ser wêye ku hemû şêweyên fikrî di berhemên wêjeyî dene. Dayîkbuna berhemên wêjeyî jî di civakê de ji dayîk dibe.

Di sala ( 1800 ) an de ev sal dibe sala dîroka rexneya civakî. Ji ber ku di vê salêde pirtûk bi zimanê Firansî di jêr navê ( Derbarê Wêjeyê ) de derketîye. Xwedîyê vê pirtûkê jî nivîskar ( Medam Dî Sitayl ) bu. *Di vê pirtûkê de ev eşkerekirîye ku bi zehmet em ji berhemên wêjeyî fêmdikin*[66].Bêyî ku reftarê civakê li ber çavan bi girîn berhemê wisan dinav de berhem hatîne, di sala ( 1806 ) an de ( Yunald ) ev gotine gotîye û dibêje : ( Wêje gotina civakê ye ) .

Li gorî pirtûka ( Derazînek Ji bo Rêbaza Rexneya Civakê ) ( Medam Dî Stayl ) wisan fikir dike; Wêje bi goherîna civakê tê gohertin. Herwiha bi ramanê fîlozofê Elamnî ( Hegel ) jî ( Cîhan di barekî berdewam deye lê belê rêketin van binemalan

---

[64] 'Ezîz Gerdî , *kêşên hozanî dinav klasîkyeta kurdî û cuday dinavbera 'eruza 'erebî û farsî* , weş .wezareta roşnibîrî , Hewlêr 1999 ,r56

[65] Celal Mustefa , *biyavê xiwandinê* , ç1 , ji weşanên ekteya nivîserên kurd – Dihok , weş .hawar , Dihok 2004 ,r54

[66] Êbîh Muhimed Husîn , *çend rêyek bo deqê* , ç1 , weşanên êketya nivîserên kurd –Dihok , weş , hawar , Dihok 2004 . , r102

de heye. Wisan dibe pîlanek ji bo her babetekî wêjeyî goherîna çendîn jî dibe goherîna çaweyî ). Her wiha janerên wêjeyî bi civakê ve girêdayîye û di navde peyda bûne. Dîsan vî fîlozofî gotîye ( Roman destana çaxa ronesansêye ) . Lê belê di wî demî de destan di çaxa kilasîk de çêbûye yanî çaxa destpêka mirovatîyê. Helbestvan û nivîskar alîyê aborîya civaka xwe pişt goh dikin. *Ev jî dibe sedemê ku li gel derdora xwe nakokîyan çêbikin û hewildidin vê bi goherînîn ( Voltayîr ) Di daşurîna tîjekan de li dijî pîvanên ayînî û sitemkarê dinîvîsîne*[67]. Her wiha pesend bûna wan jî li ber çavan ne digirt. ( Nasir Xosreî ) Bi acizî dîn firoşên xoresanê û cîhanxwaran dixist li ber neştegerîya rexneyê û goh ne dida ka ew razîne yan ne. Wêje jî wekî sedemekî bi bandor li dijî rewşa serdemê kardikir. *Ev jî beramberî berjewendîya kesan û çînan dihat. Bê goman ev jî dibe cihê nefret û bêzarîya armanca rexneya rast*[68].

Di vê derbarê de pêwîste em vê li ber çavan bigirîn wêje û civak her du jî di rewşa goherîn û bizavtinê de bûn, bandora wan jî li ser hev heye. Di vî alî de nabe çalekîyê wêjeyî ji çalekîyên giştî ê civakê cuda bibe. *Hinek hunerên wêjeyî hene di alîyê rastîde zêdetir siroşta wan a civakî heye*[69].

Helbesta Hemas û ayî zadeya jîyana civakîne. Bê goman siroşta civakî jî hene. Sitayîş û şêwejî xwedîyê armanca civakê ne. Armanca wan ew e ku di nava çîn û kesan cîyawazîya wan a civakê dîyar bikin. Lêkolîna goherî û pêşketina şaristanî jî bandora jîyana civakî di çawenîya derketina helbest û wêjeyê de heye. Ew gel û netewe di goherîna jîyana cotyarîyê de fêmkirîne ku helbest û wêje li gel milet ku heya niha jî di qonaxa şivanîyê de ciyawazîya wan heye. *(Alîgirên rêbaza ( Rexneya Civakê ) van sedeman bi ( Rêgez û Xwezaya Serdem ) didin nivîsandin*). Ev jî cihê giftoguyê ye destpêkê ğêwîste em bi pirsîn armanc di rêgezê de çîye ? Pêktê ji civak û amadeyî sifet û demê ku mirov heyî. Ev jî herî zê de bi şêweyekî bingeh û mimîkê cîyawaz de li gel mirovan derketîye.

---

[67] Celal Mustefa , *biyavê xiwandinê* , ç1 , ji weşanên ekteya nivîserên kurd – Dihok , weş .hawar , Dihok 2004 ,r87

[68] 'Zedîn Mustefa resul , *edebyata nû ya kurdî* , weş , wezareta xiwendna blind ,Erbîl 1989 ,r98

[69] Selîm Reşîd Salih, *şêwaz di kurte çîroka kurdî da* , weş .wezaretî roşnibîrî ,slêman 2005 ,r100

*Fîlozofê Elmanî ( Hegel ) di vî fikrî deye ku Xweza û Coxrafya di peydabûna bîr û bawerîyan de qet bandorîyek nîne li ser zemîna Yunan*[70]. Mînakê tîne û dibêje: Yunanîyan di xwezaya coxrafya xwe de berhemên ku hunerî û dibîn berjewendîya wan de pêşketîye. Di demekê de di heman xwezaya coxrafîya tirk û farisan û gelên din jî hevşêwene û tiştek ji dest ne dihat. *Xwezaya coxrafî bi sedemên din bandorekî ber çav nîne belku bi hebûna sedemên din bandor dibe*[71]. Eger wisan be xwezaya coxrafî ne hemu sedemeke. Belku beşeke ji sedemane nikare hunera wêjeyê bi giştî ji coxrafyayê cuda bike. Xwezaya coxrafî wekî alîyekî civakîye gelek bandorbûn derdikeve li ser wêjeyê. Ji ber ku berhemên wêjeyê zextê naxe li ser civakê di alîyê civakîde. Ev jêkçûna di navbera helbesy û berhemê du helbestvanê tirk yan ereb her nikare beraber bike li beramberî berhema nivîsakrê gelê din.

*Helbest û mijara nivîskarekî tirk rengvedana civaka tirkîye*[72]. Binemal û pirensîbên civakê ye ji bo berhemanînê cuda li gel berhemên nivîskarê kurd ku xwezayekî cuda heye. Di xêzan huner û rewşenbîrîyê de jî ev hemu jî bandorekî dîyar a wan heye li ser helbest û helbestvanan. Em gehiştîne wê rastîyê ku em bêjin ev rexneye di rêbaza rexneya civakî de heye. Bi şêweyekî tayber hebûna kesan dîyar kirîye.

## 3.3. Rêbaza Rexneya Deronî û Şîrovekirina Deronîyê

Peywendîya di navbera wêje û deronîyê de gelek kevne. Di wî demî de destpêkirîye dema ku mirov rêyek ji bo deronî û hestên xwe çêkirîye. Fîlozofê Yunanî ( Arîsto ) di nava pitûka xwe a bi navê ( Hunera Şiir ) de qala beşê paqijkirina deronîyê kirîye. Ev beşe jî Arîsto di alîyê karê dîmenên Tirajedyayê li ser temaşevanan de dabeş kirîye. Belê bi çi awayî van dîmenan bandorî li ser bîneran kirîye.

---

[70] Siwarey Îlxanî zade , *tapobume lîl* , ç1 , weş ,salhan , Taran 1379 ,r12

[71] Fazil 'Mir , *awrek le zimanî kurdî* , dezgeha ya çap û weşanê , weş ,wezaretî perwerde , Erbîl 2004 ,r17

[72] Muhemed bekir , *pexşane şî'rî kurdî* , ç1 , weş ,aras , wezaretî perwerd , Erbîl 2004 ,r17

Bi vî awayî li gorî fikrê Arîsto tê hejmartin wekî yekem kes yekem mamostaye ku qala peywendîya di navbera wêje û deronî yê de kirîye li ser bingeha zanîstê. *Her bi vî awayî pêşîya Arîsto Fîlozofê yunanî Eflaton qala bandorîya lasay kirina sodar li ser kumara ayîdyayî kirîye*[73] .

Hinek ji rexnegirên rexneya wêjeyê pişt bi xasyet û binemala deronasîyê ve girêdaye. Ew rexnegirane hewildayîne deronî û aqil helbestên veşartî ê nivîskar derbixin. Hêza amadeyî û pekhatina nuye. Hêza soz û xeyalê wan dîyare.

Ew bandora dewruber ji edeta civakê hatîye di barê deronî yê de. Di vê rêyê de corê hizir û bingeha can û soza helbestvana nîşan dide. *Ev mijara rexneyî di destpêê de li ser meseleya aborî û helbestan lêkolîn dike*[74]. Di wê xalê de helbest û wêje weku hemu beşekî hunerî ji berî hemu tiştî pêktê ji cîhanekî ku wisan rih û dil tê de bi lerize. Di anîna jîyanekî xeyalî û hemu hêza deronî de hunermend beşdar dibe. Meseleyekî din jî gelik ji fîlozofan pesnê bingeha ( Kant ) dikin û piştgirîya bîrdozîya Kant jî dikin.

*Cara destpêkê wî ev mesele bi şêweyekî zanistî eşkere kir ku helbest huner û zanîsta deronîya derbarê wêjeyê de bi çend helwestan li ber çavan girt*[75]. Ji ber hemu helwestekê qonaxên jîyana mirov pêkhateya kesayetî derketîne li ber çavan. Dîsan jî em ê qala wan faktoran bikîn ku dibin asten ji bo wan kesan. Yan jî pêşîya navbirina kesayetîyê digire. Dîsan jî emê qala wî karî bikîn ku peywendîya xwezayê li ser deronî ya kesan dike.*( Di heman demê de qala peywendîya sozdara kes û afrêner bikîn)*[76]. Ji qonaxa zaroktî, ciwantî heya di gehe qonaxa hizir emê qallbikîn. Zanîst şîroveya deronîye û bi rengekî çalak li gel çêbûna zanayê deronnasî(Sîgmond Fîruîd ) hat dinava wêjeyê û rexneya wêjeyê de. Di rastî de Fruîd di destpêka karê xwe de pena birîye ser wêjeyê ji bo encamdana piraktîka li ser rêbazên deronîyê.

---

[73] Muhemed Me'ruf fetah , *sebah reşîd qadir* ,hindek alyên morfolojî , weş ,rûn 2006 .r76

[74] Nefîsa Esma'îl Hacî , *teknîka vegêranê di kurte çîroka kurdî fazl 'umerî da* , ç1, weş , îketya nivîserên kurd –Dihok , weş .hawar ,Dihok 2005 .r89

[75] Newzad Ehmed Eswed , *hozanêtî têksit û şîrînya vexwandinê* , weş . Renc slîmanî 2001 . r102

[76] Hoşeng Şêx Muhemed , *gutarên rexneyî* , ji weşanên îketya nivîserên kurd – Dihok 1986.r16

Mînak di sala 1897 an de di Şanogerîya ( Odbîn Paşa ) yê ( Sofulkîs ) û şanogerîya Hamlet ya ( Şekspîr ) xistîne di ber şîroveya deronîû rêbaza xwe de. *Ew kesen ku rastî nexweşîya deronîyê bûyîn di derbarê her du têksta şanoyan de nubûn û şîroveyekî rexneyî a deronî derxist holê*[77].

Yek ji girîngtirî têgehiştinan deronîye, li ser avakirina navê ( Giry Odîb) danîye. Piştre di sala 19298 an de ( Firoîd ) romana ( Destavîskî ) a bi navê ( Birakanî Karamazûn ) liser her du şanoyan zêde kirîye. *Li gorî fikrê Firoîd karê wêjeyê ji çend parçeyên li ser hev pêktê û çend ramana ji di nava xwe de digire. Pêwîste lêkolîn jî di nava van beşan de bê bikirin.* [78]Da ku hemu dawîya wan berheman eşkere bike. ( Firoîd ) zaravê ( Nestî ) danîye, ev zarava jî ramanê wê dide pêwîste mirov giringîyê bi hêza we bide li ser bingeha deronîyê. Di derbarê vê lêkolînên de her gotine çi ûreftarbe yan pirsgirêkek be hemu ji civakê pêktê. Hemu peywendÎye xwedîyê girê ne û diçin nav wan karan ku mirov hizir dike.

Nest di alîyê deronî de behsa kok, sozdar û jîya Seksê dike. Pêwîste ev bê têrkirin yan kêm kirin. Rexneya civakî jî bêbar bûye û dibe sedemê têrnebûna wê heskirinê.

Helbest û wêje ji goncan û hevsengîya deronî û hizrê di encama sedemê merîfî bi destê re pêktê. *Di barekî hestî de derdikeve. Westan û hestên mirov beramberî wan hevahengîyan ( Kant ) de be di demê pêşde qala wêkirî bû di derbarê ( Ciwanasîyê ) de*[79]. Her ev biryare jî piresîba tam dîtina hunerî a ciwan û çavkanîya rexne hevsengîya hunera wêjeyê dîyar dike. Ev şêweye helebstên wêjeyî jî wekî wan hunerên din dîyardeyekî deronîye. Di alîyek din de jî helbestvan yan jî nivîskar di afirîne û dilê xwendevana jî xweş dike. Ji ber ku di alîyê peywendîyê yan jî alîyê helbestvan û nivîskar de helbest û wêje karekî yê afirandinê ye. Ev û ew meseleye di

---

[77] şukirye Resul , *teknîka vegîrranê di çîroka marf berzincî da* , ç1 , weş , wezareta perwerdê , Erbîl 2005 ,r67

[78] Celal Mustefa , *biyavê xiwandinê* , ç1 , ji weşanên ekteya nivîserên kurd – Dihok , weş .hawar , Dihok 2004 ,r113

[79] Hesen Caf ,*çîrokî niwêy kurdî* , weş .'ela , Bexda 1985 ,r9

gotina deronasan de derdikeve. Ev jî wê ra digihîne helbest û wêje ji bilî heyînekî deronî ne tiştekî dine. Lê belê di alîyê peywendîya xwendevanan de helbest û wêje dengekî deronîye. Di mirovan de di be sedemê lezet, xem û karkirinê. Hinek caran jî wisan dike îrade û karekî encam bide. Ev meselejî dîsan helbest û wêje jî dibe karekî deronasî.

Her bi fikrên ( Kant û Firoîd ) karê hunerê bi giştî karê wêjeyê bi taybet rêyeke ji bo wan gotinan ku heskirine di nava deronî û nefsa mirovan de heye. Her wiha ( Firoîd ) wisan dike şahkarê deronîya nivîskar û piştre berhema xwe dinivîse. Ev hunermende yan jî nivîskare hest bi aramî û xweşîyê dike . Ji ber vê jî pêwîste lêkolînvanê wêjeyê ji jîyan û dîroka hunermend û nivîskar bi gerê.Derbarê ( Hez ) di wêjeyê de bi fikrê Firoîd nabe rêgirek bikeve di navbera hez û têrkirinê de. Wekî ( Ayîn, metirsîyekî civakîye û edeta xelkê ye ). [80]Ji ber vê jî heskirina durperestîyê diçe di nava nefsa mirovan de. Firoîd komek mekanîzim destnîşan dike ku nefs dema ku derketina wê heskirina afrêner di encam wê heskirinê û têrkirinê de dibe. Mekanîzma wan jî eve.

**1.Çirbûn :** Ji reşkirina dana paşyan hinek amêrên nefsê pêktê. *Piştre ji tevlîhevkirina rêgezên din ê legel yek ta ku di encamê yekekî temam bîne çêbike*[81].

**2. Dirûşm ( Sembol ) :**

Nişandana heskirineka dengê nizim ê babeta seksê ye. Di rêya babeta seksê de ev babete hinel alîyê heskirina nizim amajeyekê pê di bexşîne. Li gorî bîrdozîya Firoîd çalakîya deronîya li ser sê hêzan danîye.

1- Ez
2- ew
3- Ez ya bilind.

[80] 'Bdalxalq Î'qubî , *rexna edebî û dibistanan* , weş.aras , Hewlêr 2007 ,r19.

[81] Mela 'Bdalkirîmî muderîs, *bedî' û zeman û 'eruza namî* , weş, dar cahiz , Bexda 1991,r98.

Pêşbirk di navbera van hêzan de berdewame. ( Ez ) ji tevlîhevîya hest û nefsê pêkhatîye. Ev tevlîhevîye jî peywendî bi jîyana civakî û reftarê ve heye. Li gorî gotinan hersê hêz jî peywendîyekî zêde li gel xwezayê heye. ( Ez bilind ) ji wan bîr û bawerîyan û heskirina di alîyê mirovan de pêktê ku hevgirê ( ew ) ye. *Ji ber ku ( ew ) zêde pêwîste ji bo heskirina seksê. Bi kurtî helbestên her helbestvanekê xasyet û taybetmendîya xwe heye*[82]. Yan jî bi têgehek din deronasîyê di nivîsîne. Bi heman şêwe di nava lêkolînvanan de di barekî deronî de lêkolîn dike. Deronasîya wî yan jî nubûna wî derdixe ji ber vê xalê jî rexneya deronnasîyê ji hemu beşên din ê rexneyê û corên din girîngtir tê zanîn.

## 3.4. Rexneya Sîmolojya

Bandora heyînan li ser serhildana corekî giring yan jî beşekî yê rexneya wêjeyê heye ev jî rexneya sîmolojya ye. Sîmolojya wekî rexneya nu yan jî rexneya pêşîya kilasîk hemu wekî mîtodekÎ rexneyî rêbaza wêjeyê di sedsala 20 an de pêşketîye û serî hildaye. Ev pêşketine jî di rêya karê nivîsînên komek nivîskarên cîhanî yên wekî *( Rolanbart, Cirar Cînît, Elgirad Colyan Girîmas, Roman Cakbsun û Tirfîtan Tudrûf ).* [83]Yekem pêngava bingeha wê pêktê ji derbazbûn û zivirandina gohertinekê pêşkêşî ewrupayê û ji bo berê xwe bide Emerîka û rexneya Emerîkan. Li gel vê jî belku kêm be sinorê bingehê di rojava de dîyar bike bi vê dikarin bêkin bingeha berhema rêxistinên Ewrupa di destpêka Sedsala 20 an heyan niha berdewame. *Ji bo pêşketin û di pişt nivê duwem ê heman sedsalê de pêşketinên mezin di xwe de dît*[84].

Ev beşê rexneyê pîvanekî a babeta xwezayê te beşê rexneyê di bingehde geraye. Gelek ji nivîskaran berê binî yê vê beşê nu danîye. Pêşî serdar û peşketina binyatgerîyê bûn. Di pêşîya hemu yan de ) Lîv Ştraûs û Roman Cakbsun û Rolan

[82] Hîmdad Husîn *,rêbazên edebî* , çapa îkê , weş,mukiryan , Hewlêr 2007,r89

[83] Muhemd Bekir *, pexşane şî'rî kurdî* , weş .aras , çapa îkê ,Hewlêr 2004,r11

[84] Fuad Reşîd , *bunyadgerî di roşnibîrî û rexneya edebî ya kurdî* , îketya nivîserên kurd , çapa îkê, weş.arabxa , Kerkuk 2007,r78

Bart, Colya Kirîstîva û Krîstîva Mêz ). Belku hinek ji van bîrmendan dibêjin ; Me pêwîstî bii gotarekî modern û post modern heye. Zaravayê post modern jÎ tenê amajeyekî sîmolojîye.

Di dawîya hefîyan de bingeh gerê du carî êrîş bi berdewamî binyat geran bûn. Rexne ji wê digirt ku ne xwezayekî edebîye, hewlekî zanistî ya ruteji bo tengkirina ziman. Ev hemu jî xist dinava çarçuveyekî dij yek de. her wiha  bangeşeya binyat geran bûye. Xwe xwedîyê mîtodekî zanistî û bê xeletî dur ji hemu nubûna dibîne. Karê şîrove kêm kirîye di çêkirina pesnê de. *Bi pişt girêdana bi peywendîya zindî a beşê ( Nîşankar û Nîşanker )*[85]. her wiha çarçuveya cîyawaz çêkirina di navbera ziman û bêjer de wekî sîstemekî giştî çalekîya kesê bêjere. Sîmolojî wekî bilez zindî bûye karîye beşê dîwarê binyatgeran rast bike û rêya xwe jî veke ji bo serhildana mîtoda nû ya wêjeyê di Ewrupa de.

*Em dikarin sîmolojyayê wekî zanistekî nu binasîn wekî amrezekî yan jî rêbazekî nû derketîye. Di zanistekê de babetek hêma û amraza mijarekî karekî hunerî û ne hunerîye*[86]. Di naverasta salên 60 an de sîmolojya buye rêbazekî serbixwe. Erkê wê jî perdeya li ser kêmasîyan rake ye û mînakên zimanî jî dîyar bike. Binyat ger şidandibu li ser hemu zanîstên din. Sîmolojya di hewildana rê vekirina xwendinê deye bi binyatgeran re ew xwendina ku girtî bu kirîbû armanca xwe. Sîmolojya erkekî giring dibîne di xistina mijaran de.

---

[85] N'mit Alle Hamd Nhêlî *,pêlê, rexneyî –komeka vekolîna di têkistanda* , çapa îkê , weş , hacî haşm , Hewlêr 2007  ,r56

[86] 'Ezîz Gerdî , *serwa* , dezgeha aras , weş , aras , çapa îkê , Hewlêr 1999 ,r87

## 3.5. Rêbaza Binyatgerî

Di vê lêkolînê de emê giringîya binyatgerî wekî alîyekî ê rexneya wêjeyê bidîn destnîşankirin. Herwiha alîyekî hizrîye di Sedsala 20 an de li Ewrupa belav bûye.her wiha li ser wan çavkanîyan di sekine li firansa bi taybetî bi negeha xwe danîye. Xwe nêzîkî sitiratejîya binyatgerên din kirîye. Wekî rêbazekî rexneyî ji alîyê mirovên Ewrupîyan ve hatîye bi karanîn. Binyatgerî alîyekî zanistî heye. Wekî zanîstekî xwezayî ji bo lêkolîna wêjeyê.

*( Kludlêv Ştraus ) dibêje: Binyatgerî dixwaze bibe rêbazek a hizir. Wekî rêbaz û mîtodên zanîsta xwezayî. Dixwaze peywendîya di navbera parçeyên bingeha wêjeyê dîyar bike*[87].

( Fêrdînand Dî sosêr ) Karekî di nav zimannasî de kirîye û belavbuye di eşkerekirina hizrê binyatgerî de. Girîngtirîn tişt tê de qalkirîye xwendina zimanê hevçerx beramberî zimanê gotinê ye. Em dikarin bêjin wegerekî mezin bû di hizrê zimanasê hevçerxde. Ji ber vê jî em nikarin peyv wekî zindîyekî serbixwe danîn. Formalîstên rusîyan jî zêdetir dixwestin wêjeyê û rexneyê bi taybet ji destê derekîyan bi parêze. Pêçewana rêbazên din ku rêxistin û çalekî encam didin di barê kesê nivîskar , jîyan, sîyasî û alîyên din. *Lêkolînvanê rexneyê di mijara de bi tenê peyda dibe. Li firansa salên 40 û destpêka salên 50 yên sedsala 20 an taybet efsaneyên emrîka xistin li ber lêkolînê*[88].

**5- Şêwzgerî :** kargehekî mezin ê peyv hevok û gotinên cuda cudane. Gotinbêj nikarin di yek demê de sudê ji hemuyê werbigire. *Belku peyvek di nava sed peyvan de dihilbijêrin yan jî hevokek di nava sed hevokan de di hilbijêrin ji bo gotina armancan. Ez kare di zimanê otumatîk de karekî bi lez û derbazbûyî ye*[89]. Lê belê di

---

[87] Fuad Reşîd , *bunyadgerî di roşnibîrî û rexneya edebî ya kurdî* , îketya nivîserên kurd , çapa îkê, weş.arabxa , kerkuk 2007,r98

[88] N'mit Alle Hamd Nhêlî ,pêlê, *rexneyî –komeka vekolîna di têkistanda* , çapa îkê , weş , hacî haşm , Hewlêr 2007 ,r87

[89] Heval Selîm teyb , *bunyadgerî di nav rexneya kurdî da* , destipêkê heta sala 2003ê , çapa îkê , dezgeha spîrêz , weş , hacî haşm , Hewlêr 2006, r98

zimanê helbestê de helbestvan hurîyek di hilbijartina peyc û hevokan de dike. Her helbestvanekî jîli gorî hêza ferhengê û gotinê corê zimanê mijarê di goherîne.Bi giştî helbestvan dîyar kirîne û di demekî dîyar de wekî heyvek yan çend heyvek hêza zimanekî di demekî de diçe û nasdike. Lê belê di demekî dirêjtir de li gorî rewşenbîrîya helbestvan heyîna hêza ziman û corê zimanê helbestê ji helbestekê ji bo helbestek din cîyawazîyekî zêde tê de dîyar dibe. Bi mercekê jî her du helbest jî afrêner û nû bin. Mijara wêjeyê wekî ku me di pêşde jî behsa wê kir pêwîste bi jîngeya nivîskar yan helbestvan re be. *Ji ber ku bê girîngî dayîna wê kêmasîyên zê de derdikeve di nava karê rexneyê de*[90]. Ji me re derdikeve her helbestvanek zimanek û şeklekî û şêwazekî taybet ê xwe heye di karê nivîsînê de. Her wiha lêkolîn di taybetmendîyên şêwazên wêneyê helbestan û berjengan de jî dike. Di sîstema mijar û zimanê helbestê dîroka bi karanîna efsneyê pend û hemu amêrên rewanbêjîyê lêkolîn dike. Sudê ji çêkera zimanewana wedigire.

### 3.6.Corên Şêwazê

1- Şêwaza Dengsazî :

Giringîyê bi muzîka helbestê dide. Di ziman de alîyê weznê dixe li ber lêkolînê, di alîyê zanîsta dengsazîyê de diçe û zimanê helbestê di kiteya kurt û dirêj a dengî de derdixe. Bêdengî û rêzbûna wana di kiteyê de lêkolîn dike.

2- Şêwaza Pêkhateyê :

*Giringîyê bi lêkolîna wan amrazan dide ku helbestvan bikartîne di afirandina helbesytan de*[91].

[90] Ferhad Pîrbal , *hozana nû ya kurdî , (1985-1898)* .dezgeha kurdistan , Hewlêr 2005 ,r9

[91] 'Bidalqadir Muhimed Amîn ,*wêneya şî'rî di edebyata romansîzm ya kurdî* , çapa îkê , weş. Serdem , Silîmanî 2002 ,r54

3- Şêwaza Erkî :

Beşdarî karê gihandina peyaman dike. Ew rêgezên ku kesayetîya nivîskar an germahîya wî ve dike corê şêwaz gerîyê ye. Pişt bi xwendekar ve girê dide ku bikare rêgezên mijaran cuda bike.

4- Şêwaza Amar :

Ev şêwaz jî hewil dide di rêya zanîsta amarê de lêkolînan encam bide. Şêwaza zanîstî jî ji şêwaza wêjeyî cuda dike.

5- Şêwaza Rêzimanî ( Sîntaks ) :

Li ser wan zagonan lêkolîn dike ku ji alîyê sîntaksî û mijarê pêkhatîbe. *Fi çawenîya guncav û ne guncavbûna mijar û hevokan di çarçoveya nivîsandinê de lêkolîn dike. Eger wisan be hemu corekî ê şêwazgerîyê wekî bingehekî di karê rexneyê de bi kartê. Ji bo nubûna lêkolînên mijarên wêjeyî*[92].

## 3.7.Peywendîya Di navbera Rexneya Wêjeyê û Felsefeyê De

*Felsefe zanîsta zagona giştî a hebuna ( Xweza û Civakê ) ye di hizirîna mirovan û heyînan de tê nasîn. Berjengên wê jî jihevgirtina giştî û lêhurbûna şîroveya lêkolînê pêktê*[93]. Her wiha lêkolîna sedemê bingeha destpêkê ye jî. Lê belê rexneya wêjeyê ji hunera lêkolînê di şêwaz û taybetmendîyên cudade pêktê. Beşeke di hizrê mirovayetî û armanc nasîna wêjeyê deye, eşekrekirina taybetmendîyane.her wiha hemu ew tiştên din kû di çalekîyên mirov de berê xwe didin wêjeyê. Ji ber vê jî felsefe zanîsta zagona giştîye û hizrê mirovatîyê rexneyê jî pêktîne. Rexne jialîyê fîlozofan ve pêkhatîye. Wisan lê hat ku ev karê rexneyê ji alîyê fîlozofanên yunanîyan bi rexneya wêjeyê ve girêdayîye. Heya ku wisan lê hat rexne wekî beşekî ji beşên felsefeyê bê navkirin. *her fîlozofek jî di xwaze hevaltîya felsefeyê binge bîne*

---

[92] Kakey Felah , *karwanê hozana nû ya kurdî* , bergê îkê , weş.zanîngeha selahedîn , Hewlêr 1987,r56

[93] Fazîl Mecîd Mehmud , *xiwezayî di hozanên goran da* , çapa îk ê , weş. Serdem , Silîmanî 2007,r19

*û raste rast ev jî tevlî karê rexneyê dibe*[94]. Wisan pêwîste ku di beramberî wêjeyê de helwestekî bikîn û bi hurî li ser de biçîn û biryara xwe jî di vê derbarê de bidîn.
Eger fîlozofek helwesta xwe di wêjeyê de ranegihand ne karî ewa ku heye û peywendîya di navbera felsefê û wêjeyê de eşkere nekir tenê wê ranagehîne ew fîlozofe di beramberî wêjeyê de bê helweste. Belku helwesta wî di kurahîya felsefa wî de çûye. Kesê ku di wê felsefê delêkolînan dike dikare bi hêsanî helwesta dinav bera wan de hilbijêre û destnîşan bike. Di navbera felsefe û rexneyê de gelek alî hene ku her duyan bi hevre girê dide yan nêzîkî hev dike. Di vir de emê behsa her yekji wan babetên felsefê bikîn :

### 1- Rastîya Ku Nehatî Zanîn :

Fîlozofan di alîyê gerdunê de gelek tişt dane eşkerekirin. Di vir de jî felsefe çaxekî bi bandor dibîne di eşkerekirina zanayarîyan de. *( Eflaton ) fîlozofê Yunanî ( 347 P.Z* [95]*)* yekemîn fîlozofe ku hizra rexneyê di derbarê hemu babetên gerdûnê de daye eşkere kirin. Babet û hizrên rexneyan jî di şeklekî tam û rast dene. Naveroka felsefeya Eflaton pêktê ji : Ew tiştên ku çar dewrê wan hene, berdewam di goherîna li ser şêweyê tiştên gihayî û bê kêmasî deye. Ev jî di cîhana ayîdyayî de heye û hatîye çêkirin. MÎnak ew sîstema bi xwe wesfê wê dike li ser wêneyê sîstemekî gihayî ku di cîhana ayîdya de heye. Ev heyîn jî bi wê rastîye diçe.

Bê goman ev lêkçune bê bingehe. Her ew qas jî belku ji bilî siha rastîya tiştekî din nebe. Em di karîn di karê rexneyê de nêzîkatîyekê di vê derbarê de bikîn. Wekî wênekirina her amêrekî zemînî bi çav nayê dîtîn li ser şêweyê xeyalî wêneyê wê hatîye çêkirin. Gotina li ser peywendîya felsefê u rexneyê di vî karî deye. Her ji ber vê jî rexne ji hemu zanîstên din xwe nêzîk dike. *Dema ku wênekêş wêneyan digire çi dike yan jî di dema gotina helbestan ji alîyê helbestvan ve em nikarin bi*

---

[94] 'Bidalqharî Şêx , *ezmûnên hozana kurdî* , weş.pak , Hewlêr 2001 , r56

[95] 'Ezîz Gerdî , *rexne û edeb* , weş,hiwadis , Bexda 1974 ,r44

*temamî beramber û cuda bikîn. Ev berhem di şibe cîhana ayîdya û tiştên din ê vê cîhanê*[96].

Eflaton dibêje : ( Ew ji rastîyan dur dikevin karê wan jî ji bilî foto kopî tiştek din nîne. Lêkolîna lêkolînekê dikin. Ji ber vê jî tabluya wênekêşek û helbesta helbestvanekî ne rastîye. Ne şayenê wê ye ku mirov wer bigire.

## 2- Berpirsyartîya Aqil :

*Eflaton di wê hewildanê de bû komarekî bi mînak damezirênê ku aqil serkêşîya wê bikit hest û soz nebin desthilat da*[97]*r*. Karê mirov û armanca mirov jî nêzîkirina di armanca reftarê de bû. Siroştîya helbestê jî ew ku çi demekê piştgirîya hewar û girîna li xwe danê neke. Bel ku bi rengekî din dibîne û hêvîyê ji bo wê digehîne .

Li gorî fikrê Eflaton helbestvan qet karekî yan xizmetekê bi civakê ne kirîye. Helbest di alîyê Eflaton de di qonaxa retkirinê deye. Her wiha li gorî wî helbest ne tişteke di meydana merîfîyê de cih hebe. Ji ber wê helbest xwarinê dide hest û nestan. Di alîyek din de jî gehiştina mirovdi pileya kamilîyê de rêgirîyê dike. Ev her du dijyekîye helbest di a yekemîn de epostî jî di ya duwemde reftarîye.

Her du yan jî ji wê felsefeyê çavkanî girtîye. Eflaton ger ku qala vê bikiria wê Arîsto jî behsa wê bikiria ( 332 P.z ) ew mamostayê vê qonaxê bû. lê belê ev rê ji Arîsto ne girt û pêçevana mamostayê wî be. Bila mamosteyê wî fîlozofekî mezin jî be ( Rafîl ) nîgar kêşê çerxa ronesansê bû. Di wêneyêkê de cîyawazîya di navbera Arîsto û Eflaton dîyar kirîye. Armanca wan jî eşkere kirîye. Eflaton di hizirîna xwe de ji tiştê hest û hestyar dur dikeve. berê xwe daye ayîdyaya ebstraktan. Lê belê

---

[96] 'Usman Deştî , *nawerkên siyasî û civakî di hozanên hêmin da* ,weş.ofsêtî tîşk , Silîmanî 2003,r98

[97] Ahlam Minsur *, bînay hunerî di kurte çîroka kurdî da* , weş.serdem , Hewlêr 1999 ,r99

Arîsto pêwîstîya wî bi buyerên ezmungerîyê hebû. *Her wiha Arîsto xwe girêdaye bi buyerên rast û waqiî. Ji bo wê xwezayê û ew zagonên ku bazarê li gel siroştekî dib dikin dîyar bike*[98]. Hizir û fikrê Arîsto û Eflaton du fikrên cudane di asta helbest û wêje û rexneyê de. Bi tayber hizirîna Arîsto mişt û mirekî goftogoyî di nav xwe de digire. Bi taybet ew goftugoya di navbera wî û Eflaton de. Ew bi hurî diçe ku pirsgirêkên ku Eflaton pêşî çareserkirî hewildaye bêxe di çarçoveyek din de. Eflaton wiha diçe û li gorî wû helbest dure ji rastîyan. Ji ber ku hest û nestên bi zîyan yên me eşkere dike. Eger helebstvan di rastîyan de jî bi xeletî biçe zîyana wê nîne. Ev xeletî her çi bin jî ne tiştekî civakîne belku rukêşe tenê rune. *Qet bandorekê li ser rast gotina helbestê ji bo helbest danînê eşkereye*[99]. Cudahîya di nav bera merîfîya zanîstî û rast gotina pêşî di alîyek din de xeyal û rastgotina helbestan di alîyek din de dike. Ev bi karê derxistina ku lêkolînan Eflaton bi hevre tevlîhev û aloze.

## 3- Şêwaza Cîyawaz :

Helwest û mijara di navbera her du fîlozofan de ( Eflaton û Arîsto ) du şêwazên giştîne. Li ser hizrê mirovatî de ew jî pêktê ji şêwaza ayîdyalîst û şêwaza rastî. Armanca di vê şêwazê de pêktê ji lêkolîna li ser hemû tiştên aloz û eşkere kirina wan tiştên ku ne dîyarin. *Bi corekê şêwaz jî ne lêkolîneke li ser alozîyan belku komekî dîyarkirîye li ser mijara*[100].

Bê goman pirojeya rexnegirtinê di keve pişt pireojeya çêkerê û ya nivîsîna mijaran. Ev jî me re dîyar dike ku her mijarekî wêjeyî dikeve jê karê rexneya wêjeyê. Her wiha hemu mijarekî wêjeyî di wextê ji dayîk bûnê de hemu berhem wek yekin. Hemu li ber devê pirojeya rexnegirtinê wekî yekin. Ev jî ser dikêşe ji wan rastîyan ku hemu mijarek di heman astê dene. Bi hemu janerên xwe ve diçin di nava bazneya hunera kurdî de.

---

[98] Heme Se'îd Hesen , *hizru şêwaz di çîroka kurdî da,* weş.aras , Hewlêr 2005,r44

[99] Kameran Mukrî ,*çîroknivîs* , weş.sumerye , Bexda 1988 ,r91

[100] Şikrî Muhimd 'yad , *tiyorên edeb* , wergîran(serdar Ehmed ) ,weş.mardîn ,Hewlêr 2010,r9

Êdî di vir de destbi cudakirina cor û biryardana liser mijarê dike. Pirojeya nubunê dîyar dibe. Ji ber vê jî em nikarin mijarek ya Nalî, Ehmedê Xanî, Melayê cizîrî û Mehwî bêxîn di bazneya hunerê de. Em mijarek a Nalî yan jî ya her helbestvanekê nakîn di yek bazneyê de. Ji ber ku hemu wekî yek berhemên gelê kurdin.Êdî wê rexne biryara wê bide kîjanê bêxe di pêşîya kîjanê de. Rexneya wêjeyî karekterekî afrêner bû. Rolekî pêwîst ji civakê girtîye.Erka wê eşkerekirina wê hunera rexneyê ye ku kes bi xwe çêbike.Pirsgirêka ber bi alîyê çareserkirinê ve dibe, her di vê rêyê de jî civak asude dibe. *Di vir de jî giringîya erkê rexneya wêjeyê derdikeve. Ji ber ku dibe pêkhênera kesan û dîyarkirina xeta giştî a bextewarîya civakê. Wêje jî dapoşaye ji komek sembûlû hêma di encamê de corekî acizî pê ve dîyare*[101].

Di pişt vê de jî qonaxekî nu destpê dike. Tê de azadîya sîyasî û ayîdlojîya di nava mijarê de reng dide. Bê goman ev jî siroşta jîyanê ye her qonaxek û reftarê taybet ê xwe heye. Ji ber ku her qonaxek dengek taybet ê xwe heye. Ji ber vê jî ev denge di berhema wêjeyê de reng dide. *Lê belê ev lêkdane bi hurî balkêş dike û ji rexneya wêjeyê pêktê*[102].

Di vir de em dikarin vê eşkere bikîn rexneya wêjeya kurdî di astekî baş de nîne. Ji ber ku sîmayê corê di alîyê bandorbuna li ser kes û civakê de ne pêwîst bû. Carek din jî emê bi zivirin ser siroşta rexnehilgir fikrê cîyawaz û lêkdana şîroveya mijarê. Ji ber vê kî şayenê wêye ku xelkê bi zivirînîn ser wê ji bo pê fireh bikin. Ev di demekê de nava mijarê tenê armanca tam girtinê werdigire. Eger em bixwazin axaftinê li ser gotara rexneya kurdî bikîn pêwîste li pey pêşengîya rexneyê bi gerin. Lê mixabin çend hurbûna di dîrokê de wêjeyê û rewşa wê çênake. *raste rexne qonaxên cuda bi xwere dîtîye wekî di pêşîyê de*[103].

---

[101] Êbîh Muhimed Husin , *afret di çîroka kurdî da* , weş.îketya nivîserên kurd , Dihok , 2004,r89

[102] 'Bdalirhmin 'Bidulxefur Husin , *ezmûnên nûxwazî di alyên grûpên nukrî* , zanîngeha koye, 2012,r98

[103] Kemal M'ruf , *edebyata kilasîk û nû xiwazya kurdî* , weş.jîn,Silîmanî 2003,r74

Me amaje bi wê kir ji ber ku her qonaxek û hilgirek corekî ji sîma bexşînê ye. Lê belê di nava wêjeya me de ev bingeha pitew nîne ku pêşeng bi kar bîne. Felsefe bi giştî diwan kar û çalakîyan de lêkolîn dike ku kar dike ser mijara wêjeyê û tayber mijara wêjeya kurdî. Belku pişt bi mijara wêjeyê bi gire ta wê demê ne gehe asata sinora bazdanê. Ne be sedemê têkdana şîraza wêjeya kurdî a giştî. *Dibe bi corekî din li ser vê mijarê bêjin mijara wêjeya rengdana wêjeya gelê xwe ye*[104]. Wêjeya kurdî jî rengvedana gelê xwe ye. Dema ku ev her du rengvedane tevlî yek dibin belku karekî xirap jî hebe li ser ruyê wêjeya kurdî. Belku di alîyê naverokê de hunera wêjeyî bîyanî  bike û ber bi bîyantîyê ve bibe. Ev karê wêjeyê jî jêre tê gotin afrêner belku hinek wêjenasan lê belê her afrênerek nıne. Di cîhana rexneyê de bi eşkere dibînîn

[104] Kerîm Hîsamî, *yadî hêmin* , weş.serdema nû , siwêd 1987,r119

## 3.8. Ehmedî Xanî û Rexneya Wêjeyê

Ehmedê Xanî di sala 1650 an 51'ê de li bajarê Colemêrgê hatiye dinyayê, Navê bavê wî Şêx Îlyas e, navê kalikê wî Eyaz e.Xanî perwerdehiya xwe ya pêşîn Quran û fiqihê li cem bavê xwe Şêx Îlyas digire, piştî xwendina li cem bavê diçe di medreseyên Bidlîs û Xelatê de dixwîne, xwendina xwe li Bexda, Şam, Heleb û di medreseyên Îranê de jî pêş ve dixe. Di medreseyên Îranê de hînî felsefeya îslamê, astronomî û fîlolojiyê dibe. Di medreseyên Sûriyê de jî hînî felsefeya yewnanê dibe û di vê pêvajoyê de fîlozofên weke Aristoteles, Platon, Farabî, Şihabedînê Suhrewerdî, Muhyedîn ibn Erebî, Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û gelekî fîlozofên din hîn dibe û di bin bandora wan de dimîne. *Piştî demekî diçe Mekeyê heca xwe dike ji wê şûn de diçe Misirê jî digere û dizivire Bazîdê*[105].

Ehmedê Xanî di dîroka kurd û Kurdistanê de bi nav û deng e. Derbarê pêşveçûna çand, huner, wêje û zimanê kurdî de cihê wî cuda û pir girîng e.

*Xanî di 14 saliya xwe de dest bi nivîsandinê dike, piraniya pirtûkên xwe bi kurdî bi zaravayê kurmancî nivîsandine*[106], Xanî bi taybetî ji bo ku zarokên kurda baş dîn û zimanê xwe hîn bibin pirtûkeke bi navê Nûbihara biçûkan dinivîse û nîvê pirtûkê jî dike ferhenga kurdî-erebî û ev ferhenga wî di dîroka kurdan de bûye ferhenga herî pêşîn û bi sed salan ve di Medreseyên kurdî de hate xwendin.

Xanî tevê kurdî, çar ziman (tirkî, erebî û farsî) dizanîbû.Ehmedê Xanî ji bona perwerdehiya zarokên kurdan medrese jî vekiriye û li wir ders daye telebeyan. Di medresa *Ehmedê Xanî de dersên olî fiqih û hedîs û dersên zanistê yên weke felsefe, dîrok, wêje, erdnîgarî, astronomî û hwd. dihatin dayin*[107].

---

[105] Nî'mit Alle Hamd Nihêlî , *deravek ji rexnê* , weş.hawar , weş. Êketya nivîserên kurd Dihok 2010 ,r98

[106] Yasrê Hesen . *Wexerek di nihênyên deqê da* , rexne û vekolîn , weş. Êketya nivîserên kurd Dihok 2004, r14

[107] Celal Mustefa , *biyavê xwandinê* , (vekolîn) , weş. Êketya nivîserên kurd Dihok 2004 ,r62

Helbestvanê bi nav û deng Îsmaîlê Bazîdî û gelek wêjevanên kurd di bin bandora Xanî de mane.Ehmedê Xanî sala 1707'an de li Bazîdê diçe ber rehma Xwedê û tirbeya wî li Bazîdê ye. Ehmedê Xanî netewperwerekî kurd bû û xwestiye ku yekitiya kurdan çêbike. *Îxtîlafên di nava kurdan de ji bo wî, pirsgirekeke mezin bûye. Ji ber hindê ye ku wî di helbestên xwe de hertim qala yekitiya kurdan kiriye û li ser mijara pirsgirêka perçebûna civak û erdnîgariya Kurdistanê sekiniye û di berhema xwe de çareseriyê wisa nîşan dike[108];*

Ger dê hebûya me ittifaqek
Vêk ra bikira me inqiyadek
Rûm û ereb û ecem temamî
Hemiyan ji me ra dikir xulamî
Tekmîl dikir me dîn û dewlet
Tehsîl dikir me ilm û hikmet .

Kurmanc ne pir di bê kemal in
Ema yetîm û bê mecal in,
Fîl cumle ne cahil û nezan in
Belkî sefîl û bê xwedan in.

Li gor Xanî, kêmasiya kurdan ji ereb, tirk û farsan nebûye, tenê kêmasî bêrêzanî û neyekbûna kurdan e. *Bi kurtasî Xanî xwestiye ku gelê kurd ji binê mêtingeha ereb, tirk û farsan rizgar bikin[109].*

Helbesteke Xanî ya li dewletiyê:

---

[108] Hîmdad Husîn *,rêbazên edebî* , çapa îkê , weş,mukiryan , Hewlêr 2007,r54

[109] N'mit Alle hamd nhêlî *,pêlê, rexneyî –komeka vekolîna di têkistanda* , çapa îkê , weş , hacî haşm , Hewlêr 2007 ,r86

Ez mame di hîkmeta Xwedê da
Kurmanc di dewleta dinê da
Aya bi çi wechî mane mehrûm?
Bîlcumle ji bo çi bûne mehkûm?

Lê di berhemên Ehmedê Xanî de, nijadperestî li dijî tirk, ereb û farisan tuneye. Ji xwe di hinek helbestên xwe de bi tirkî, erebî û farisî jî nivîsiye.

Berî Ehmedê Xanî helbestvanên wek Elî Herîrî, Baba Tahir Hemedanî , Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran jî bi zimanê kurdî berhemên hêja afirandine, ango Xanî ne kesê yekemîn e ku bi kurdî helbest nivîsîne, lê ferqa wî ji wan helbestvanên kurdî yên berî wî ev e ku wî doza azadiya gelê kurd wek mijara sereke daye ber xwe. Berhema wî ya menzûm "Mem û Zîn" wek sertaca wêjeya kurdî ya klasîk tê pejirandin. Ew ji bo gelê kurd bûye çavkaniyeke netewî ya giranbiha. Xanî ji bo afrandina nasnameya netewî, ji bo bilindkirina alaya yekitî û azadiya kurdan ev berhem nivîsiye. Herçend ew destan-çîrokeke evînî be jî, hozanê mezin xwestiye bi riya wê çîrokê fikr û ramanên xwe, daxwaz û pêşniyazên xwe pêkêşê gelê xwe bike.

Ehmedî xanî di çend alyekanda babetên rexneyî di afrînî  yek jiwan , behsê ewan kesan diket ku dil ê wan paqij e û bo wan jî dibêjî ku wan hemî dema dilxoşin be karên edebî  û dibêjî:

Xelkî kujisîne û ji dil saf

Pakîze siruşt û ehlî însaf

Bîlcumle biken ji bo methesîn

Bêjin kub qencî hatete duyn

*Her di beytên din ehmedî xanî di (mem û zîn)ê da rexne li wan kesan digrî ku bi nezanî karên rexneyî dken û gwe nadene granya erkê nivîserî ku çewa mandî bûye û dibêjî*[110]:

Lî hîvî dikem ji muste'îdan herfan negrin ji mustefîdan

Ev name eger xrape eger qinc me kêşaye digel wî dûsed renc

Edebyat yêk li esasên serkîyê ferhenga her netewekêye, lê edebyat jî wekê gişt astên ferhengî, heta bêtir li her astekê pêwîstê pîvan û nirxandinêye. Dirastîda bêy helsengandin, edebyat bitaybet û huner bigiştî nikare ber bi pêş be û bikemile. Bêgoman edebyata bê rexne duçarî sekinîn û nemanê dibe. Loma çaxe şa’ir û nivîskarên netewekê ji pîvan û nirxandinê dûrin, li afirandin û nûvejandinê jî agadar nînin, vêca ewê dakevin sernişvê tundê gote gota bê wate û kilîşeyî û çavlêk kirinekî wêzar ker û yek rengî cihê afirankarîya resen digire û babet û berhemên bêqîmet û xusar çêdibin ku xincî zerarê tiştek ji xelkêra nînin.Neteweyên ku xwedîyê çand, huner û wêjeyekî bitev û dewlemendin, bêgoman xwedîyê rexne û pîvanên hunerîyê bihêz û bizavin. *Li her dera cîhanê gelek şakarên hunerî/edebî, bar û berê nirxandin û rênimûnîyên hunernas û karzanên hunerî/ edebîne, bo mînak, Eresto, Horas û Buvalo, bêgoman li geşandin û bişkivan dina helbesta kilasîka Evropî xwedîyê bandorekî mezinin. Loma pewîste civata Kurdî û bitaybet civata ronakbîr û hunermendên Kurdan*[111].

[110] Yasrê Hesen , *wexerek di nihênyên deqêda* , ji weşanên îketya nivîserên kurd , Dihok , weş . Hawar 2004 ,r16

[111] Fazîl Mecîd Mehmud , *xiwezayî di hozanên goran da* , çapa îk ê , weş. Serdem , Silîmanî 2007,r19

ji boy çare seryîya walayîyên çand, huner û wêjeya Kurdî hengavên bilind raken. *Bi rêya rexne û pîvanên rast û zelal, nirx û bihaya karê hunerî/ edebî wê were xûya Kirin û xelk jî di nasîna huner û edeba baş û xirab, şaş namînin*[112].

Lê rexne bitena sere xwe bêy şarezayîya rexnegiran li ser şêvaz û prînsîpên taybet bi xwe nahê dabîn Kirin. Di vê rexnegir bi agadarîyek tam li ser prînsîpên rexnê, karên huner û edebyatê binirxîne. Mixabin, îro li civata Kurdî rexne û pîvana zanistî pirr kêmasin, ewên heyî jî ewqas lawazin ku bidujwarî dikarin werin rêza rexna zanistî, eger jî ewe ku rexnegirên me li gor boçûn û nêrînên kesîyên xwe birryar diden. Carna bi gotinên xwe yên şaş û şêlû ji tine, butên hunerî çêdken, carna jî xudawendên hunerî û edebî bêtine diherrişînin, carna bi sedan laperan tenê serbora nivîskarek dinivîsînin, *carna jî tenê bîr û bawirên xwe li ser karekî hunerî disapînin, carna rûmetê edebî û formê binirx dizanin, carna jî tenê naverokê dinirxînin*[113]. Li halekê ku divê rexnegir *bigiştî corên rexnê binase û her berhemekî edebî li barê civatî, revanî, form, ziman û nawerokê binirxîne, bi gotinek din rexna hunerî û edebî bigişt têknîkên hunerîve girêdayîye*[114]. Pêwîste rexnegir bizane ku rexna edebî bêy agadarî li ser şêwe, dîrok, qonax, peyv û zimanê edebî çênabe. Zêdebarî wan xalan, rexne bêy li berçav girtina revannasî, civaknasî, civanînasî, felsefe, zimannasî û watenasîyê dabîn nabe. Ew giştbabet û têknîk bona ragehandina peyamekî çend alîkî bikar tên, *vêca rexnegir divê berfirehîya vê peyamê famke, çonku bêy agadarî li çavayîya ragehandine, şirovekirina ragehandinê tiştek neraste û xelk jî li vergirtina vê peyamê şaş dimîne*[115].

---

[112] 'Bidalqadir Muhimed amîn ,*wêneya şî'rî di edebyata romansîzm ya kurdî* , çapa îkê , weş. Serdem , Silîmanî 2002 ,r39

[113] 'Alî tahîr Hesen , *rexneya bunyadgerî di tiyor û praktîzekrinê* , ,çapa îkê , weş,dezgeha serdem , Silîmanî 2008,r42

[114] 'Bdî hacî , *çend tiyorên rexneya edebî* , çapa îkê , dezgeha spîrêz , weş .hacî haşm , Hewlêr 2008,r52

[115] Rolan Bart , *çêja deqê* , çapa îkê, weş.minare , Hewlêr 2007,r86

Loma şêxê edeba Kurdî, Xanîyê mezin jî xemdar û nigeranê vê pirs girikêye û li çend cihên pertûka xwe da nigeranîya xwe li ser rexne û pîvanên hunerî û edebî di cavata xwe da nîşan dide.

*Vê perdegîya efîfe mestûr*

*Vê bê gunehê ji tuhmetê dûr*

*Meşhûr bikem bi terz û uslûb*

*Momtaz bibin muhêbû mehbûb*[116]

*Xelkê ku ji sîne û ji dil saf*

*Pakîze sêrêşt û ehlê insaf*

*Bîlcumle biken ji bo metehsîn*

*Bêjin ku biqencî hate tedwîn*

*Li vir babê edeba Kurdî, Ehmedê Xanî basa sê tiştan dike ku her sê jî mercên serekîyê rexna edebîne*[117]

1.Xanî basa "terz û uslûb"an dike. Mebesta Xanî şêwaz û prînsîpên hunerî û edebîne,

2. Xanî basa "momtaz" bûnê dike, wata rastê wê peyve temîz kirin û lêk cihê kirina xalên baş û xirab û bihêz û bêhêzin. Erka serekîya her rexnegirekî edebî divê ev şole be. Yanî bi agadarî li ser (terz û uslûb)an ji bona destnîşan kirina babetên baş û xirabên berhemekî hunerî/ edebî karê rexnê dabînke.

---

[116] 'Ezîz Gerdî , *rexne û edeb* , weş,hiwadis , Bexda 1974,r39

[117] Hisîn 'Arf , *çîroka hunerî ya kurdî ,1960-1925* , weş.dar tba'e ,Bexda 1970 ,r18

3. Ji boy rexnegirtin û pîvana hunerê/ edebî tişte here girîng hebûna “dilekî saf û siriştekî paqîj û insafe” da ku rexnegir ji mercên rexnegirîyê dernekeve û zehmetî û hasila temenê hunermendekê neşevitîne.

Ezê li vir carek din gotinên çend raydarên rexna edebî li bare girîngîya rexna sîstimatîk yan wek Xanî dibêje rexna agadar li ser (terz, uslûb, û insaf)ê vegêrim. Corc Istaynêr di yêkem mijara dawîtîrîn pertûka xwe ya bi navê “*Amade bona rasteqîne*” da ha dibêje: *“Megirtî li civatekê li ber egerekê, rênedin gotinên rexnegirane û tene mecal biden karên resene hunerî werin berhem kirin, bêy kesek bikare wan rexne bike û li serwan bicive. Li civatekî wisada ku bi gotina Istaynêr “dij armance şarê Eflatûnî”ye çi diqewime?*[118]

Bersiv gelek hêsane, ew karên resene hunerî/ edebî jî êdî berhem nabin. Rexne netenê ji bona geşepêdan û bilind kirina edeb û hunerê mercekî pêwîste belku li gor vê kiryara girê gîrê û lêk aliqî her berhemekî nûjen bixwe dikare ji boy şûnwarê hunera kevn hukmê rexnê hebe.” Bi gotina Istaynêr hunera micid, mosîqa û edeb hemû ser bend û berbendên kiryara rexnegiranene[119]. Yan weku Drîda dibêje her berhemekî nûjene edebî/ hunerî rê xweşkerê afirandin û rexna edebîy/ hunerîye. Vêca daxwaza Xanî jî eve ku karê wî were rexne kirin, lê Xanî bi diristî tiştekê dibêje. Xanî dibê min ev zehmetî ji boy gişt xelkê kişandin, lê heku kesek bixwaze li ser karê min bi peyive dive “nezer baz, ehlê hal, ehlê îrfan û xwedan kemal be.” Yanî bi giştî xanî dava dike kesên pispor û şareza karê wî binirxînin da ku başî û xirabî ji hev momtaz bin.

*Înaye nizam û întizamê*

*Kêşaye cefa ji boy amê.*

*Evreng bikem ji no serefraz*

---

[118] Selîm Reşîd êalh „*şêwaz di çîroka kurdî da* , weş.wezareta roşnibîrî , Silîmanî 2005,r13

[119] 'Bdalirhmin 'Bidulxefur husin , *ezmûnên nûxwazî di alyên grûpên nukrî* , zanîngeha koye 2012,r19

Armanca min livir ne eve ku li ser karekî mezine edebî rexnekî edebî binivîsînim, belku dixwazim bêjim nebûna rexnekî rast û dirist di civata meda egerekî mezine ku em bîr û bawirên geş û zelal di edebyata xwe ya nûxwazda ji bîr biken û bi lez û bez li wan derbaz bin. Li halekê ku pêwîstê sekinîn û lê fikirînekî dûr û dirêjin. Em bi hizaran car bextereşîya xwe dipêjirînin lê her carê jî wê mihane bar dken. Xanî li serdema xwe hertiştê xirab di civata xweda pêşbînî dike. *Xanî bi avakî hostayane û şareza civata xwe li her astekê rexne dike*[120]. Lê babê edebyata nûxwaza Kurdî perêşanîya xwe li barê vê pirsgirikê venaşêrit û hê di çaxê xwede vê nîgeranîya xwe eşkere dike. *Ew bi xemekî giran li nifşê pêşerojê dava dike rêka raste rexnegirtinê vebînin, xanî hêvîdare ku zana û pisporên Kurdan xwe ji rexne û pîvanên hişk, direw*[121]*,*

nerast û şaş biparêzin. Ew derheqê karê xwe û rexnegiran wisa dibêje:

*Nobare eger şirîn eger tal*

*Metbû’e ji rengê new’ê etfal*

*Min hêvî heye ji ehlêhalan*

*Teqbîh neken ewan tefalan.*

Li wan çend beytanda bîr û boçonên Xanî li bare rexna edebî xûya dibin. Bêgoman xanî pê agadare ku pivan û rexnekirina karekî hunerî/ edebî nikare li demekî kurt di nava Kurdan da cihê xwe veke. *Ev nêrîna Xanî bêgoman li barê civatên Rojhelata Navîn bigiştî raste, çunkî li wan civatan rexne bi pirranî yan keristê şikandina kesayetîyên hunerî/ edebî û wêrankirina şakarên hunerî/ edebîye*[122], yan jî amêrê tole sitandin û gef û gorrên kesîye, yan ji berwajî vêhindê tenê medhe karîya pirr û poçe. Elbete bi hejmara tilîyên destan rexne û rexnegirên baş jî di civata

---

[120] Kerîm Deştî *, edeb û felsefe* , weş.şivan , Silîmanî 2004,r54

[121] Kemal Mîrawdelî *,felsefe wicwanî* , (îstatîka) , weş,.qan' , Silîmanî 2005,r76

[122] Elaedîn Secadî , *deqekanî edebî kurdî* , Bexda 1978, r98

Kurdî da hene ku em jî wan awarte dikin û hurmeta endîşe û qelemê wan digirîn, Xudê wan rêzdara ji me nestîne. Xanîyê mezin bi tewayî endîşe û hizra xwe ya bilind, li hember rexnêgirên hunerî/ edebî serê xwe diçemîne û xwe wekê şagîrdê wan dizane; ev karê xanî ruha hunerîya wî ya ber fireh nîşan dide û divê ji hemû hunermend û edîbên Kurda ra bibe sermeşqê xebatê:

*Hê hêvî dikem ji mostefîdan*

*Herfan  negirin li moste'îdan*

*Ev name eger xirabe ger qenc*

*Kêşaye digel wê me dused renc*

*Nobaweye têfle no resîde*

*Her çend nehin qewî gozîde*

*Xanîyê mezin li ser vê bîr û rayê ye ku divê pispor û şehrizayên edebî û hunerî li gor yasa û mercên rexnê karekî hunerî binirxînin. Elbete bi nêrîna Xanî baştirîn kesê ku dikarin li ser esera wî bicvin ehlê îrfanin. Ev birryara Xanî dikare du eger hebin*[123]

1.Kare Xanî karekî îrfanîye

2. Bi dîtina Xanî ehlê îrfan li ser sîstima hebûnê agadarin û naverok û têma karê Xanî babetekî îrfanîye ku bêtir di pîvanên îrfanî da tên guncandin.

*Umîd ewe ji ehlê îrfan*

*Ew dê negirin li min çu herfan*

---

[123] Husîn 'Lî şanuf *, şî'rî şa'îranî hevçerx* , wer(şikur mustefa) , Bexda 1975,r62

Ehmedê Xanî fylesofê Kurd bixwe rexnezanekî mezin bû; wi bidiristî civata xwe nasdikir û rexnegirekî bihêz bû; heku em rexna ku ew li ser civata xwe dike bi hurgilî vexunin, emê bironî bibînin ku Xanî çiqas li barê zanistî karbîn û zanaye. Loma Xanî bi caran şepirzeyîya xwe dîyar dike da ku karê wî dûr ji kerb û kîne û nezanîyê were helsengandin.:

*Teşn'î neken wekî xeyûran*

*Îslah biken li min qusûran*

Xanî hêvîdare kesên ku karê rexnê dikien tarî û ronên şola hunerî nîşan biden û wê ji şaşî û kêmasîyan veşoneve; *xeletîyan rast biken û gilî û gazindên bê wate ji hunermendan neken*[124]. Ev nêrîne, baş yan nebaş, nêrîna Xanîye û bi hizra min mebesta xanî eve ku edîb û hunermendên Kurdan bi hevre têbikoşin da huner û edeba Kurdî ber bi geşbûnê here.

*Eshabê kemal di perde poşin*

*Erbabê xerez di pirr xuroşin*

Wisa xûyaye ku Xanî li ser rexna Rojhelata Navîn û bitaybet rexne di nava Kurdan da agadare, *loma Xanî dava dike karê rexnê bêy alîgirîyên nerast û li ser esasekî lojîkî were kirin*[125].

*M'emul ewe ji ehlê razan*

*Ewdê nekirin bimin tinazan*

[124] *Dîwanî Kurdî* , çapî sêyem , Hewlêr 1973,r54

[125] Yasrê Hesen . *Wexerek di nihênyên deqê da , rexne û vekolîn* , weş. Êketya nivîserên kurd Dihok 2004,r65

*Îmza bikirin bi husn û eltaf*

*Îsxa  biken ew bi sem’ê însaf*

*Eshabê xerez ku guh bidêrin*

*Eyban bikerem li min veşêrin*

*Ava rûyê şa’irî nerêjin*

*Ger mumkîne yêke qenc bibêjin*

Hevîdarim rojek bê ku xwe perestî li meydana huner, çand û wêjeya edebî binbirr be û hunermend û edîbên Kurdan walayî, kêmasî û qusûrên çand û edeba Kurdî nasken û ji bona çareserîya wan bixebitin da ku awat û xazîyên Xanîyê mezin jî bicî bên.

## BEŞA SÊYAM

## 4.REXNA NÛ YA MODÊRN Û POSTMODÊRN

Mrov, ew bûnewerê ji raz û nihênîyan avabûîy, berdewam pirsyaran dikt û li berisivan digert. Peywendîya mrovî li gel hebûn û jyan û axê bûye serpirsyar û berisva rasteqîne jî, bi hizra min, hêj nehatîye dan. Nivîsîn derbarê mrovî û pirsên kevnar û serdem, *berê min didt xiwandna zansitê entropolojî û teyorîya etnografî jiberku ew dikarn sîstemekê hizrî û epistmî avabkin û ew sîstem kefîle ku pêkhate û têgehê mrovî heta radekê ravebkit*[126]. Ez bawer dikim, mrov bi xwe proseseke hem taybet hem jî cudaye ji tev bûnewerên dî. Bûnewer hene bê ruh, hene ruhdar belê bê aqil, hene jî ruhdar û bi aqil, lê bê şehwet. Belê mrov ruhdar, aqildar û şehwetdare. Lewra jî barê mrovî grane û berpirsyarîya wî li beranber jyan û hebûn û gerdûnê mezintre. Belê heta kîjan radê mrov ji derheq wê berpirsyaryê derdikevt? *Diyare berisva wê pirsyarê bi hinde pirsyar û bersivên dîve grîdayye, herwek: mrov ji kûve hat? Mrov kîye? Mrov çiye?*[127] Erê mrov ji berê were bûnewerekê aqildar bû, xwedanê pirsyaran bû? Yan bunewerekê heywanî bû, ageh ji pris û pirsyarên xwe nebû? Yan jî bûnewerekê zindî û berheve bo guhorînê û werarê dikt? Erê organekê xwezayye û bi bandorên wê ve pabende? Yan jî zat û kyanekê serbixweye? Erê mrov têgeh û pêkhatan dixulqînt, yan ew mirovî dixulqînin? Erê bzavên wek (rênsanis, modêrnîzm û postmodêrnîzm) heta kîjan radê beşdarî nivîsandna dîroka mrovî dibin? Erê ew bizav, kiyan û pêkhatên serbixwene, yan bi bûyerên gelwazên xwezayêve grêdayne? Erê pêştir bi form û navên dî hebûn, yan bi saya hewildan û guhorînên berdewam hatne Îktîşafkrin? *Erê mrov bi xwe, kiyanek serbixwe yan xiwegritîye? To bêjî qûnaxên dîroka mrovî bikarn astê serixwebûn yan xwegirtna mrovî biselmînin? Heta kîjan radê mrovî şya mifayî jezmûn û serborên dîroka xwe werbgirt? Û... Hitd ji van pirsyarên derazînkî.*[128]

---

[126] Selam Balayî , *liber derzînka têkistan* , weş. Êketya nivîserên kurd Dihok 2004,r44

[127] Emîn 'Bdulqadir , *têksit di navbera gotara rexneyî û rêbazên edebî da* . weş. Êketya nivîserên kurd, Dihok 2008 ,r54

[128] 'Ebdula agrîn , *karîgerî bîrî netewey le geşesendî kurte çîrokî kurdî da* , weş. Zankoy selahedîn , Hewlêr 1999 ,r43

Di pertûka felsefe û modêrnîzimde hîgil bi dirêjî behsê qûnaxên werara mrovî dikt belê - bo mexsed - ez dê bi kurt amajê bo kim:

*Qûnaxa xwezayê: mrov wek heywanekê bû, xiwarn û vexwarn û guhnêlî û bes .Qûnaxa tofanê: tofan ne sizadan bû, belê belkî derseke dîrokî bû mrovî fêr bikt li xwe bigert û xwe nas bik*[129]*t.*

Qûnaxa serhildanê: mrov dêşt, hizra xwe bikardihînt û jnû dizant çi b serê wî hat, berevanîyê ji xwe dikt û serhildanê dijî xwezayê radgehînt .Qûnaxa serkevtna ruhê: piştî serkevtna wî, xiwazt bi hizra xwe peyama serkevtinê ragehînt belê çawan? Lewra ziman hat û ew peyam bo dîrokê ragehand.

Piştî naskirna wan qûnaxan, ez dixwazm dîsan pirsyar bkim: mrov kîye؟Erê em ji kîjan corê mrovîne heger hat û danasîna mrovî weku têgeh, mahîyet û fankisyon li ber çav wergrin? Berî wî, aya me têgeh, mahîyet û fankisyon naskirîye heta em wê pirsyarê bazrînin? Erê mrov qable ku xiweristekê dî wergirt, yan formek dî, yan jî corekê dî pêk bihînt? Erê çu peywendî di navbera corên mrovî de mayne herçende mrovê niha ked û îmtîdade bo hemî qûnaxên raborî? Dipertûka "dîroka rojhelata kevnar"  de hatîye ku sê corên mrovî hebûn:

Mrovê meymûnik (Sinantihropus): berî pêncsed hizar salan hebû. Hîngê bi tinê bûnewerekê heywanî bû wek meymûnkê, ne hezaret û ne hizir û ne felsefe, belê bi tinê xiwarn û vexwarn li bext û barê xiwezayê.

Mrovê niyandertal (Neandertalinsis): berî sêsed hizar sal hebû. Ew jî di navbera şikevt û byababan de digerîya, *anko her pena bo xiwezayê dibir. Hizir û ziman bi fankisyona xwe ranedbû çunkî hêj peyda nebûbûn*[130].

Mrovê  bi aqil (Sapienis): berî pêncî heta sedhizar salan hebû. Mrovê bi aqil anko ne mrovê meymûnik û ne jî yê nyandertal, belê hêj bi temamî bi aqil nebûye

---

[129] Muhimed mela Kerîm , *nalî le kilawrojney şî'rekanî da* , Bexda  1979 , r78

[130] 'Bdalle Yasîn 'elî , *peydabûnî rexney edebî le şî'rî klasîkî kurdî  ta cengî cîhanî yekem* , (master) , Hewlêr , r54

çunkî hîngê jî hizir û ziman xaîb bûn. Ew mrov ne bi aqil bû, lê şya dûndehek bi aqil li pey xwe bihêlt ew jî piştî diyarbûna bergehên civak û hezaretan.

Erê em dikarn mrovê niyandertal bikin mrovekê modêrn li beranber mrovê meymûnik? Yan, to bêjî mrovê bi aqil modîrne li beranber yê niyandertal? Mebesta min ne modêrnîzm wek bizav û dîrok, belê ptir weku têgeh, pêkhate û berhem.

*Erê ji destipêkê mrovî pêdvî bi modîrnîzmê (têgeh, pêkhate û berhem) hebû, yan pêdvî û ezmûngeryê mrov gehande wî astê hizrî ku li dûv pêkhatên wesan bigert? Erê bizava modêrnîzmê peywendî bi demî û chî û pêdvîya qûnaxêve heye, yan bi ç halê hebt xwe disepînt?*[131] Erê modîrnîzmê peywendî bi hizir û nasnama mrovîve, yan bi form û cor û regezîve heye? Aya modêrnîzm li her cih û demî peyda dibt, yan peywendî bi cih û demîve nîne? Eve me dizivrînt pirsyara berî nha: erê têgeh û pêkhatên serbxu ene, yan bi bûyerên gelwazên xiwezayêve grêdayîne? Erê hezareta fîr'ewnîyan li gor hezaretên dî, bizaveka modêrnîzma wî serdemî bû, yan jî bi tinê werarek bû dibyavekê taybetde? Ezmûna somerîyan li gel nivîsînê, aya bizaveke modîrnîzm bû, yan jî bi tinê bersivdana pêdivyên demî bû? Erê ew bizav bi xwe hebûn û nedhatin îktîşafkrin, yan jinû, li gel demî û daxwaza mrovî, hatin çêkrin? Erê ezmûnê çu peywendî li gel heye? Axir ew ezmûn dê her berdewam bit û dûr nîne hindek berhem û pêkhatên dî yên nû pêşkêşî cvakê mrovatîyê bikin؟

*Erê modêrnîzm bi xwe hatye fêhimkrin ta mrov li dûv postmodêrnîzmê bigert؟Erê destipêka postmodîrnîzmê ramana dumahîka modêrnîzmê didt? Erê postmodêrnîzm weku destipêk piştî kîjan dumahîkê hat؟*[132]

Erê sazî û rasteqînîya bizav yan livînekê bi rewşa berî hîngêve grîdayye, yan bi werara ku piştî hîngê peyda dibt? Û gelek pirsyarên dî ez dixwazm dimîhraba xwandevanê hêjade bazrînim bi hîvîya ku em pêkve, heta radekê, têbgehin.

---

[131] 'Bdalirhmin 'Bidulxefur husin , *ezmûnên nûxwazî di alyên grûpên nukrî* , zanîngeha koye 2012 ,r43

[132] Kerîm Deştî , *edeb û felsefe* , weş.şivan , Silîmanî 2004,r54

## 4.1.Modêrnîzm

Zaravê (modêrnîzm Modernism) yan jî (modêrnîtî Modernitiy) li ewropa peydabû. Bi taybet li niglistan, frensa û elmanya. Bizaveke ji hindek rêbazên edebî û hizrî pêk hat. Gelek fîlosof û nivîskaran pêşbînî bo wê kirne bigre ji (kant, hîgil û heta to digehî markis) bê ku sîmayên wê diyar bikin. *Her êk ji wan hat û hindek nêrînên kesatî, berhev bo teyorîzekrin û praktîzekrinê, pîşkêşî civakê mrovatîyê kirin. Berî ez behsê rêbaz û karên wan nivîser û fîlosofan bikim, baştre hindekê li ser têgeh û pêkhatê modîrnîzmê rawestim û nêrînên cuda cuda diyar bikim .*[133]

bzava modêrnîzmê hewildane bo bikarhînana hindek zaravên ku bayexê bi edebyatê di din, jibo hevsengî û pîvana prensîpên civakî jî bkardihêt, herwesa jibo her karekê hebt bê ku ew kar ziyanê bigehînt gewherê edebyatê". (Luys mînand - teyorîya modêrnîzmê ). Em dikarn ji tevnê gotna luys mînandî hindek pirsyaran vehînin: erê to bêjî gewherê modêrnîzmê bi xwe çi bit? Bê ku ziyanê bigehînt bizava edebyatê yan her pêkhatekê dî li derveyî edebyatê çunkî raste jedebyatê destipêkir belê sînorên wê bezandin û ber bi hindek sînor û rûberên dî çû? Erê modêrnîzmê peywendî bi jiyana rojaneya civakîve heye, heger rewşa wê jiyanê ji chekê bo chekê dî li ber çav werbigrin? Luys mînand bi xwe jî wê pirsyarê bi awayekê dî araste dikt, dibêjt: "hindek kes wesa têdgehin ku modîrnîzm formalîste, riyakisyone bo jiyana serdem..." erê to bêjî rast bit? Belê kesekê dî bi navê cuys ortîka kasêt nêrînek dî pêşkêşî me dikt, dibêjt: "modêrnîzm herfandne bo prensîpên sereke yên kevin di edebyata romansî û xwezayî de. Ew nehatîye daku hunerê pêş bêxt, belê ber bi zulumat û herayêve bibt."...

*Bnêre cudahî dinavbera herdû nêrînan de çawane, lê ew cudahî buha û gringî û bandora modîrnîzmê diyardikt. Rolan part bi awayekê dî bo diçt, bi bistehî dibêjt: "modîrnîzm teqîneke epistmîye*[134], mrovê serdem nikart wê zeft bikt...", diyare modîrnîzm hewildana îktîşafa mechulî bû, lê dyare jî heta radekê li ser hesaba

---

[133] Kemal M'ruf , *edebyata kilasîk û nû xiwazya kurdî* , weş.jîn,Silîmanî 2003,r98

[134] Kerîm Hîsamî, *yadî hêmin* , weş.serdema nû , siwêd 1987,r83

dorhîlî. Heta kîjan radê şya mechulî bibînt, yan bixûnit? Diyare hêj hewl didt belê bi hindek nav û awa û mêtodên dî herwek postmodêrnîzmî, lewra jî nêrînek dî heye, dibêjt: "pêdvîye modîrnîzm berdewam şerî bikt belê bê ku bi serkevt, çunkî serkevtna wê wata dumahîka wê radgehînt, wê bi xwe bêwate dikt...", gotna dumahîkê pirsyarekê li nik min çêdkit: *erê postmodêrnîzmê dumahîka modêrnîzmê ragehandîye yan îmtîdade bo wê? Erê bserkevt yan hêj şerî dikt? Heger bi serkevtibt pa çima postmodêrnîzm hat û ew bezand*?[135]

Modêrnîzm weku bizaveka serwext peydabû, bû rastîyek didîroka mrovatîyê de. Lê çima û çawan peydabû? Erê raste modêrnîzm bi tinê wek bizavek edebî serhilda yan jî weku bizaveke sertaserî hat da bergêrîyê ji jiyan û cîhanê bikt û li hember desthelatên cudacuda berevanyê ji mrovî û maf û hebûna wî bikt? Heta kîjan radê modêrnîzmê mifa ji dîroka rênsansê wergirt? *Erê modêrnîzm hat da gumanê di rabridûyê mrovî û civakî de bikt, yan jî da hizra xwe di avakirna dahatûîy de bikt, yan jî îlxaa herdûyan bikt û rojgarê û mahîyeta wê bidt sepandin ew jî li gor awayên serederyê û rêkên çareserîyê bo pirsan*?[136] To bêjî modêrnîzm peywendîya mrovî li gel civakî û pêkhatan mukim yan lawaz dikt? Erê modîrnîzm hat da mrovî ji dîn û kultûrî mucered bikt yan jî da hindek raveyên nû bidt wan û prên nû ava bikt? Erê modêrnîzm ji nişkekêve peydabû yan jî îmtîdade bo hindek hewl û bizav û înisyatîvên xurt bo hindek kesan weku herdû helbestvanên frensî rêmbawd û loteryamun? *Raste ew ne damezrînerên modîrnîzmê bûn, belê kî nabêjit kesên weku wan menafîsta modêrnîzmê çêkrin*?[137]

Hokarên peydabûna modêrnîzmê

1. îmtîdada bandora hezaretan seranser cîhanê : dyare pranîya jê derên hizir û felsefê bûne rêbaz û xwandingeh û gelek ji fîlosof û nivîskarên hatîn li ser berdewam bûn, bi xwandin û teyorî û ravekrin şiyan hevgirêdaneka zemenî neêkser di navbera

---

[135] Kamil Husin besîr , *rexne sazî û dîrokên peyrewkirin* , Bexda 1983,r82

[136] Elaedîn Secadî , *deqekanî edebî kurdî* , Bexda 1978, r87

[137] Marf  Xeznedar , *kêş û qafye le şî'rî kurdî da*  Bexda ,1962,r86

dîroka hezaratande çêkin û hindek wekhevîyan bibînin bi taybet di biwarê berhemdana epistmolojî de.

2. lawazbûna mesîhyetê weku diyanet û nikarîna wê bo xulqandna bawerî û hevgirtna milletên ewropî: damezrandna civakan peywendî bi takekesên azad heye, azadîya jiyan û hizrîn û bawerîyê. Heta niha jî li chên cudacuda mrovê sade penayê bo hêza derekî dibt û hawara xwe digehînt xwedawendî. Berê jî weha dikir belê heta kîjan radê hêza derekî li hawarê dihat, yan bersivda? Wî mrovî înkara hêza zatî dikir û aqil û berhestên xwe mandel dikrin. Hatna diyaneta krîstyanî elternetîvek bû bo mrovê krîstyanî da ji her alekêve azad bit, belê dyare li gel demî diyanet jî tûşî hindek qebixwazîyan dibt û kêmcare dimînt, lewra jî nikart mahîyeta xwe bi parêzt û fankisyona xwe encam bidt bi taybet heger astê hizir û hişyarîya mrovî zê de bibt herwek li ewropa çêbûîy. Heger xayeta serekî ya diyanetê blindibûna mrovî bit (herwek diyanet îdî'aê pê dikin) to bêjî diyaneta krîstyanî, heta berî dûsed salan jî şyabt mrovên ewropî blind bikt? To bêjî bawerî li nik wan xulqandibt evcar mukim kirbit? To bêjî hevgirtin di navbera wande peyrew kirbit? Diyare neşyaye lewra ew neşyane bû hokarek bo lêgeryanê li xilaskerekê dî lê vê carê nexeybî, yan derekî, belê zatî.

3.cudakirna dînî ji civakî: her diyanetek wextî dihêt civakî bo xwe dikt binistir belê li gel demî dixwazt blind û blind bit. Lê blindibûna avahî li ser hesaba bnistirêye. Diyare syaset nabte diyanet belê diyanet berheve bibt syaset, ew diyarde bi dirêjîya dîrokê ruyda bi taybet li gel diyaneta krîstyanî herwesan ya îslamî jî. *Syasetkirna diyanetê zyanê digehînt pêkhatê civakî û astê bawerîyê*[138], herweha prên peywendîyê jî di navbera mrovande lawaz dikt û xalên ciyawazîyê zê de dikt. *Diyanet rehaye, belê çu civakên reha nînin, lewra jî demê ku diyanet zal dibin mirna hevgirtna civakî radgehînt û hîngê hemî têgeh û pêkhate lawaz û berguman dibin û tevilhevîyek êkcar mezin peyda dibt*[139]. Demê desthelata dînî mayê xwe di karubarên civakî û pirsên mrovî û jiyanê de dikt, wî çaxî civak û takekes radwestin û êdî nkarn afrandinê bikin,

---

[138] Dîwanî Nalî , *lêkolînewe û lêkdanewey 'bidulkirîmî muderîs û fatih 'bdaulkirîm û muhimdî melakerîm* , Bexda 1976,r98

[139] Elaedîn Secadî , *edebî kurdî û lîkolînewey edebî kurdî* , Bexda 1968,r92

yan berhemdaneka epistmî pêşkîş bikin, çunkî jiyan weku gerreka mend lê dihêt û ber bi genîbûnê diçt. Nivîskar û fîlosofên ewropa zû bi xwe hesyan û dest danan ser brînê , lewra jî hewildan civakî jidyanetê cuda bikin.

4.biserkevtna ezmûnên zansitî dûrî bandorên kultûr û dînî: diyare li gel ezmûnê hizir û aqlê mrovê pêş kevt û bûne hokar bo lêgeryan li pey zansitên mrovatîyê û ezmûnên cuda cuda. Bserkevtna mrovî di wan bwar wibyavande, ji alekêve bawerîya wî bi hêza zatê wî mukim dikt û sazîya azadîya hizir û lêgeryanê diselmînt û jalekê dîve berxistekên dînî berguman dikt. Kî nabêjt ku ezmûna zansitî dikart hindek rehend yan rastyên dî bo pêkhatên berbelav îktîşaf bikt bo nimûne xwedî, gerdûn, mrov, jiyan, mirin, zindîbûn û... Hitd؟

5.şoreşa pîşesazî li frensa û hindek welatên ewropî û dabeşbûna civakî li ser texên cuda cuda: dewlemend û hejar, zana û nezan, derebek û koledar û...hitd. Ka encamên wê şoreşê çend bawerî li nik berjewendixwaz û vyanên desthelatê çêkir, eha hind guman jî çêkir bi taybet li nav texa rêncber û kedkeran. *Raste şoreşê ta hînate desthelata dînî, lê her neşya xayeta serekî ew jî azadî, wekhevî û êksanî, peyda bikt. Jiberhindê lêgeryan li elternetîvekê bû serkarê nivîser û fîlosofên serdemî.*[140]

6. ji alê praktîzekrinêve, bizava rênsansê nikarî weku pêdvî fankisyona xwe encam bidt lewra hindek nivîskar û fîlosofan bawerî pê nehînan û berdewam hewildan li elternetîvan bigern.

7. wek her civakekê dî demê desthelat lawazdbin, diyardên nerênî peyda dibin herwek: *gendelî û qeyranên berdewam di bwarê exlaq û bawerî û tenahîyê de. Eve li ewropa jî peyda bûbû.*[141]

---

[140] Selîm Reşîd salih, *şêwaz di kurte çîroka kurdî da* , weş .wezaretî roşnibîrî

,slêmanî 2005 , r77

[141] Siwarey Îlxanî zade *, tapobume lîl* , ç1 , weş ,salhan , Taran 1379 , r73

8. paşxaneya epistmî û hizrî li ewropa bû zemînek munasb ku hindek pêkhatên nû li ser bihên avakrin çunkî rûberekê mezn digirt belê di heman demî de valatîyeka mezn jî hebû.

## 4.2.Rênsanis berî modêrnîzmê

Wextê (bruno) sera prispektîvên xwe hatî yegirtin û paşî hukmê şewtandna wî hate ragehandin, çend derfet û delîve bo peydabûn ku dagêranê bikt û peşêmanîya xwe diyar bikt, belê ewî gringî bi heluyist û biryara xwe da, dibt çunkî wî dizanî ku rojekê kesek weku (sarter) dê hêt û bêjt: "mirov heluyiste û bes, bi rastî jî bruno nedixwazt bîr û boçûnên xwe yên ku derbirîna kesatî û bûnewerîya wî dikin, bo xatir û razîkirna desthelata kenîsê, biguhort. *Ewî rêz li hezretê 'îsayî digirt belê rexna xiwe jî bi wêrekî radgehand*[142]: ku kes neşêt bibt (xwedê û kur û ruh) û nedixwazt bawerîya kenîsê derbarê hezretê 'îsayî pesend bikt û xaçê maçî bikt çunkî bawerî bi teyorîya bercestekrinê nebû. Bruno dihête şewtandin û ne tinê hizir, belê pirsyar û rexnê jî li pey xwe dihêlt. Şewtandna wî bi xwe jî dibt pirsyar, herwesa dibt êstgehek di sêrêyana dîroka ewropî de bi taybet bo kesên li dûv wî dihên weku (galîlo). Galîlo jî piştî pêkolek berdewam, *dgeht bawerîyê ku zemîn dizivrit. Hizra wî derbarê zivrandna zemînî dibt pirsa rojevê. Teyorîya wî dibt qebixwazî bo felsefa kenîsê çunkî zivrandna zemînî, heger rast bit*[143], wateya berhavêtna gelek teyorîyên pêştir didt. Kenîse desthelate û desthelat di bertengîyan de amadeye sercem alavan bo berevanîyê ji hizir û felsefa xwe, bi karbihînt. Belê zanayye ku bawerî jê dere bo dogmayê, lewra jî desthelat bi şêweyek dogmayane serederîyê li gel galîlo dikt û biryara serbrrîna wî didt. Bi darê xurtîyê galîloyî neçar dikt ku dagêranê bikt, îmza bikt û peşêmanîya xwe bo rayê giştî ragehînt. Zêrevanek çengilê wî dgirt û hêdî hêdî bo serbrrê dibt da ku serê wî yê tijî hizrên nû, bibrrin. *Raste galîlo bi neçarî îmza dikt, belê li kêlîka dumahîyê, berî serê wî li ber pên bawerdarên selefî grêlebt, ew hêv dikt zêrevanî û dguhê wî de dibêjt: "her dizivrit."!*[144]

---

[142] Newzad Ehmed eswed , *hozanêtî têksit û şîrînya vexwandinê* , weş . Renc silîmanî 2001 , r54

[143] Selam Balayî ,*li ber derzînka têkistan* , weşanên êketya nizîser kurd-Dihok , weş ,hawar , r43

[144] Anwer Muhimed tahir , *çend gutarekê rexneyî* , ç1 ,1988,r76

Ew herdû bûyer bi gelek tiştan ji hev cuda bûn, belê bi gelek tiştên dî ji hev nêzîk bûn. Ez dixwazm xwandevan hizra xwe di heluyistên herdû kesan de bikt. Aya bruno û galîlo dikarîn dagêranê ji hizrên xwe bikin yan no? Aya dikarîn hizra selefîya kenîsê pesend bkin yan no? Aya wan dizanî dumahîka wan dê bi hindek awayên tirajîdî bit yan no? Aya wan bawerî û prinsîpên xwe paraztin yan no? Aya rol û fankisyona rewşenbîrîyê tekûz krin yan no? Û... Hitd. Ez bawer dikim wan pêşbînîya vê rojgarê dikir, guman dikrin ku kenîse bikart xwe li beranber pirsyar û gumanê bgirt lewra jî berdewamî dê bi kar û bizava wan hête dan, ew bû ku (dîkart) hat û şerê xwe li gel wê tirsê, dûdlî û darzînê ragehand. Dîkartî dikarî wan herdû bûyeran bo xwe bikt 'îbret, xwe bê deng bikt û pris û pirsyaran bo serdemek dî bhêlt, belê çunkî dîkart bû û ne kesek dî, lewra xwe radestî desthelata kenîsê nekir, nexwazt tûş jî bibt, *belê bi erkê xwe yê exlaqî û dîrokî hesya lewra jî viya bi alavên xwe yên aştyane kar û xebata hevbîrên xwe berdewam bikt. Dîkart gumanê bi kardihînt û guman dijimnê herî mezne bo desthelata bawerîyê*[145]. Bi awayek hişmend û jêhatî, wî şiya bi gumanê tecawza hizrên selefî û lahotî bikt. Anku: pirsyar û guman baştirîn çekin li beranber rastî û pîrozîyan. Piştî dîkartî û peyrewê gumanê û pirsyaran, (frensîs bîkon 1561–1626) hevdemê wî, dihêt û heluyistê wî pesend dikt bi taybet demê gotî: "heger em ji rastîyê destipêbkin, li dumahîyê dê gehin gumanê. Belê heger em ji gumanê destipêbkin, li dumahîyê dê gehin rastîyê", eve baştirîn û bihêztirîn heluyist bû kesek weku frensîs bîkonî di derheq serdem û dîroka xwe û hevbîrên xwe de diyar bikt.

*Bizav û xebat berdewam dibin heta ku hevbîrek dî (con lok 1632-1704) dihêt û hest bi dijwarîya trajîdîya mirovane dikt û dizant ku desthelata kenîsê sedemek serekîye bo alozîya rewşê û kambaxîya dorhîlî*[146]. Con lok bi hostayane alavên xwe bi kardihînt û desthelata wî demî li seranser ewropa têdgehînt, ku çênabt kenîse bi hizir û felsefa xwe ya dijwar jiyana zindîyan displîn bikt çunkî jiblî bezandin û pêşêlkirna mafê mirovan û têgehê rastîyan,

---

[145] Celal Mustefa , *biyavê xiwandinê* , ç1 , ji weşanên ekteya nivîserên kurd – Dihok , weş .hawar , Dihok 2004 , r98

[146] 'Ezîz Gerdî , *kêşên hozanî dinav klasîkyeta kurdî û cuday dinavbera 'eruza 'erebî û farsî* , weş .wezareta roşnibîrî , Hewlêr 1999 ,r65

*nikart tiştek dî pêşkêş bikt. Dibêjt jî ku desthelata dînî / lahotî bûye sedemê serekî bo têkdana barudoxî û peydabûna nakokîyan di nav texên cvakî de*[147], ewan (zelamên dînî) yasa bezandin û mafên mirovan pêşîl kirin û eger jî ne bi tinê hizir û felsefa selefî, lê têkilyên desthelata kenîsê li gel çîna derebeg û sermayedaran bû. Diyare guman pirsyaran çêdikit û pirsyar li pey rastî û berisvan digert. Eve hemû li gel rojgarê dibt îdolojî di ferhingande, nemaze piştî hatna hindek zana û fîlosofên dî weku: (nîçe) û ( froyd) , eve herdû hatin û awayê lêgeryan û enalîzê bi carekê guhorîn, alavên lêkolîn û pêzanînan peydakrin û bûne damezrînerên îdolojîyê .

## 4.3.Modêrnîzm û Felsefe

Piştî hîngî, hindek pirsyarên gring hatin azrandin, mînak: çawan em dê şên tiştan, ne wek em dixwazn, belê wek rastî û mahîyet, bbînin û têbhizrînin? Mirov pêkhatekê psîkolojîye , ne bi tnê fisyolojî û bîlojîye , lewra pîwîste ew pêkhate bihête naskrin û ziman û hizir dibin baştirîn alavên prosesa naskirnê. *(Eve wata helweşandinê/ Deconistruction) radigehînt, belê paşî (cak dirîda) dê hêt û bi dirêjî li ser wê felsefê rawestit û dê bi navê wî hête naskrin.emanoêl kant 1724 – 1804) hat, bi dirêjî behsê (felsefa rexnê  Ciritical Philosophiy) û rewşengerîyê kir*[148]. Li gor felsefa wî, ew bawer dikt ku rewşengerî rizgarkirna mirovîye ji wesyetên kevnar , anko mirov bingehe bo prensîpên xwe heger prensîp hebin, herwesa jê derê kiryarên xwe ye, ew li ser dîn wexlaq û pirsên mirovane rawestya û piştî çûîy jî, tivakek ji berhemdana epistmî li dûv xwe hêla, herwesa pirsyarên hilawîstî jî, *ku bûne chê îctîhada birrek ji nivîskar û fîlosofên niha. Belê serpirsyar eveye: erê berî û piştî peydabûna modêrnîzmî, to bêjî bi rastî mirov ji wesyetên kevnar rizgar bûbû*?[149] Yan bingehê prensîpên xwe bû? Pirsyar berdewam dibin heta (hîgil 1770 – 1832) dihêt û felsefa îdyalîzmê pêşkêşî me dikt. Raste ew dibêjt aqlê reha xwedêye, belê di heman

---

[147] 'Alî tahîr Hesen , *rexneya bunyadgerî di tiyor û praktîzekrinê* , ,çapa îkê , weş,dezgeha serdem , Silîmanî 2008 ,r87

[148] 'Bdî Hacî , *çend tiyorên rexneya edebî* , çapa îkê , dezgeha spîrêz ,  weş .hacî haşm , Hewlêr 2008 ,r19

[149] Rolan Bart , *çêja deqê* , çapa îkê, weş.minare , Hewlêr 2007,r97

demî de "rexneyek tund arasteyî îbrahîm pêxemberî " dikt herwesa 'îsa pîxemberî û hindek xalên exlaqî û îdyal derbarê qurbanîdan û pêşengyê pêşkêşî mirovatîyê dikt. Paşî (forbax 1804 – 1872) dihêt û behsê metiryalê dikt û (karl markis 1818- 1883) behsê metiryalîzma cedelî û dîrokî dikt, ku xwedê nîne. *Bi wateka dî: core dabrranek li gel kultûrî hate ragehandin, sînorên bawerîyê hatin bezandin û dîn jî bergumanbû. Derbarê hatna metiryalîzma cedelî û dîrokî*[150], ez dixwazm hindek pirsyaran araste bikim: to bêjî guhorîna kultûrî êk ji xayetên serekî bû? Axir kîjan kultûr? Kultûrê civakî yan siyasî? Erê armanc ji wê felsefê guhorîna jiyanê yan jî cîhanê bû? Erê jiyan cîhanê diguhort yan cîhan jiyanê diguhort? Lê guhorîna hizrî li kûve bû? Herwesa guhorîna aborî? Aiya em dikarn bêjin ku felsefa metiryalî ew hemû corên guhorînê bi xwe ve digirtin yan hindek jiwan? Nexwe, diyare hîgil behsê îdyalîzmê û aqlê reha dikt. Paşî fîlosof (şupinhawer 1788 – 1869) dihêt û rexna felsefa hîglî dikt, dibêjt reha ne aqle belê viyane. Herwesa (kîrgard 1813- 1855), evcar êke dî bi navê (nîçe 1844 – 1900) dihêt û berevanîyê jaqlî dikt û paraztna wî dikt serkar. Eha li vê derê pirsyarek dihête pêş: erê em dşên bêjn modêrnîzm bû destipêka hevgehandna felsefa îdyalîzm û metiryalîzmî؟

Diyare felsefe bi dumahîk nahêt belê berheve bo destipêkên nû. Felsefa îdyalîzm dîsan serî hildidt belê vê carê li niglistanê û bi saya (biradlî). Bradlî bû îmtîdad bo felsefa hîglî. Li vê derê em dikarn pirsyarekê bikin: erê heman felsefe bû, yan nûkirnek bû? Ez dibêjm berisva dûyê beraqiltre, belê pirsyarek dî jî çêdbit: erê hewildana veguhaztin û nûkirna felsefa îdyalîzm li niglistanê, bi awayekê jawayan, ramana modêrnîzmê nadt? Paşî felsefa fînomonolojî (hosrel) dihêt û bi cidî gewher û mahîyeta diyardan enalîz dikt. Erê em dişên bêjn ku felsefa fînomonolojî, bi taybet li destipêka sedê bîstî, bi felsefa îdyalîzmê daxbarbû? Diyare felsefa fînomonolojî, heta radekê, bandor gehande felsefa rexneyya emanoêl kantî, herwesa bandor gehande ryalîzma nû û felsefa metiryalîzmî û li dawîyê felsefa hebûngeryê (destovêskî, kafka, sarter).

[150] Muhimd Bekir , *pexşane şî'rî kurdî* , weş .aras , çapa îkê ,Hewlêr 2004,r54

## 4.4.Modêrnîzm û Edebyat

Diyare guhorîna rewşê herdem bi înisyatîvêve (mbadre) grêdayye. Belê kî bi înisyatîvan radbit? Desthelata dînî, yan desthelata syasî, yan jî desthelata civakî? Binavkirna van hersê elternetîvan nahête wê me'nê ku lazme êk jiwan bit. Çunkî dîrok şahde ku li gelek cih û zemanan hersê desthelat beşdarn di çêkrin yan xrabkirna dorhêlî de, baştirîn nimûne jî dorhîlê kurdistanêye. Kesê înisyatîvkar kesekê berpirsyare ji paraztna buha û prensîpên mirovî û jiyanê. Paraztna buha û prensîpên mirov û jiyanê serkarê felsefe û edebyatêye, lewra mirovê fîlosof û edîb jalê exlaqîve berpirsyare. Bi dirêjîya dîroka bizava rênsansê û modêrnîzmê ta digeht postmodêrnîzmê, behra ptir ji nisyatîvkaran fîlosof û edîb bûn. Eha li vê derê ez hezdikim pirsyarekê araste bikim: çima li rojavayê rênsanis, modêrnîzm û postmodêrnîzm li derveyî edebyatê jî berceste bû, fîlosof û edîban xwe havêtin dinavde, belê çima li cem me nivîskar bi tinê di edebyatê de, li ser kaxezan, îdî'aê bi bizavên serwext dikin? To bêjî sedem çîye gelo? Erê wek pêdvî di modêrnîzm û her bizaveka dî gehiştne heta ku buha û gringîya wan bihête zanîn? Erê raste kawdanên kesatî dibin mehanên rewa bo kêmasî û dirêxîyê*? Erê pêdvî dikt kesên înisyatîvkar (nivîser, hunermend, entilkitwêl û...hitd) li bendî destûra desthelatê bmînin heta berpirsyarîya xwe ya dîrokî û exlaqî bich bihînin* ؟[151]

Modêrnîzm wek bizav, hindî to bêjî wêrek û aşkerabû. Kesên damezrîner jî kesên cegerdar bûn di hizir û peyamên xwe de, lew ew hizir û peyam hatne xwandin û paşî ravekrin, evcar pejrandin. Nivîserek weku (holbax 1632 – 1704) hat û bi dengê blind got: *"gereke em bawerîya xwe hemûyê bidin zanînê û xwe dûrî xeyb û nezanînê bigrin. Gereke jî hemû harîkar û bi tifaq bin daku berjewendîya giştî bhête paraztin"*[152], herwesan helbestvanekê wêrek weku (vladîmêr maykovsikî 1894-1930) hat û bi têksitên xwe niqîlabek çêkir bê ku hizrekê bo riyakson û bandorên kesatî bikt, wî bi dengekê blind got: " ey roj, ez jte û helatna te bêzar bûm, were li gel

---

[151] Hîmdad Husîn , *derwazyek ji bo rexneya edebî ya kurdî* , çapa îkê , weş,mukiryanî,Hewlêr 2007,r65

[152] Yasrê Hesenî , *binyatê rîtmê di şî'ra nû ya kurdî da* ,weş .spîrêz , Hewlêr 2007 ,r19

min çayekê vexwe..." wî bawerî bi azadî û yaxîbûnê hebû heta ku ruha xwe danaye ser.Diyare edebyat sergehê herî başe bo her kar û rêkxistneka cdî, *belê bi şert ku paraztna buha û binemayên jiyan û mirovatîyê li berçav werbgirt*.[153]

Edebyat damezrandin û berhemdane, derbazbûne jî. To dikarî bi prên edebyatê derbazî her cih û demekê bbî. Gelek jinvîser û edîbên byanî bi saya edebyatê û prên wî, derbazî hindek cîhanên dî bûn: *siyaset, zansit, feleknasî, civaknasî û... Hitd, herwesa derbazî hundirê rasteqîneyê gelek têgeh û pêkhatan bûn wek, azadî, jiyan, mirin, zindîbûn, evîn û... Hitd.*[154]

Gelek ji nivîskar û helbistvanên rojavayê şiyan heta radekê baş edebyatê bikin maka pranîya bizavên serdem. Çend ez nivîskar yan helbestvanekê rojavayî dixûnim, rehendên nû bo min kfiş dibin, herwesa ramanên nû bo pranîya têgeh û pêkhatan, anko min nêzîkî gewherê tiştan dikin. Ewan xem ji saz krin w damezirandinê dixwar, lew ez dibêjm edebyat damezrandne.

Niha jî dixwazm ez û xwandevanê xwe pêkve ber bi hindek êstgehîn felsefe û edebyatî, bigre jirênsansê heta postmodîrnîzmî, seferê bkin û jinêzîk hizir û bîrên hindek fîlosof û edîban nasbkin, kanê çawan kesên înisyatîvkar, biryarder û cidî bûn di serederîya xwe de li gel mirovî û pirsên zindî:

Con lok 1632– 1704: *"bi tinê berjewendîya giştî şer'îyetê didt hukûmetê... , Nivîser û fîlosofekê niglîzî bû di biwarê zansitên xiwezayî û aqlî û siyasî de, dûrî bandor û şirovên kevnar wek yên eristoyî.*[155] Hizra wî ya siyasî bû bingehê lîbralîya dîmokrasî li cîhanê. Herwesa gringî bi avakirna aqlê zansitî û rizgarkirna civakî û siyasî jî da. Con lokî gelek pirsyar û hizrên ciwan pêşkêşî mirovatîyê kirin wek: çawan şer û têkdan li cîhanê peyda dibin, li demekê ku hertişt li cîhanê bi emrê

---

[153] N'mit alle Hamd nhêlî ,pêlê, *rexneyî –komeka vekolîna di têkistanda* , çapa îkê , weş , hacî haşm , Hewlêr 2007 ,r54

[154] Yasrê Hesen , *wexerek di nihênyên deqêda* , ji weşanên îketya nivîserên kurd , Dihok , weş . Hawar 2004 ,r87

[155] 'Bidalqharî şêx , *ezmûnên hozana kurdî* , weş.pak , Hewlêr 2001 ,r141

xwedê diqewmit? binêre çawan di serdemê hukmê kenîsê de bi wêrekê hizra xwe dida xiwandin! Ewî zaravê berjewendîya giştî jî vehand, herwesa pirsa cudakirna desthelatê jihev azrand, (paşî montîsko pitir li ser wê çendê radwestit.

Voltêr 1694 – 1778: " kesê ji qebixwazyê hez nekt ew ne hêjayî jiyanêye, mirîye û nanê saxan dixut", êk ji meznên bizava rewşengeryê bû li frensa û ewropa. Raste voltêr layengirê desthelata syasî bû, belê fîlosof, helbestvan, romannivîs, rexnegir û syasî jî bû, di pranîya byavande serkevtin selmand. *Voltêr piştevanê azadîya hzir û baweryê bû, nedhêla rewşa wî ya kesatî bandorek nerênî li têgeh û prispektîvên wî bo pêkhatan bikt, çunkî rewş bo wîye belê yên dî bo jyan û cîhanêne. Peyamên wî derbarê buha û gringîya azadyê li her drê deng vedan*.[156]

Montîsko 1699 – 1755: gereke mirov dinhênî û mahîyeta xiweza û mirovatyê bgeht paşî rêkxistin û yasayan damezrînt", êk ji înisyatîvkarên bizava rênsansê bû. Kesatîyeka aşkera û rastyar bû, çu paradokis li ser xwe qebîl nedikrin. Wî şiya bandorê li hizra teşrî'î û siyasî li cîhanê bikt. Derbarê guncandna yasa û kultûrên civakî, dibêjt: gereke yasayên siyasî û medenî li gor pêkhatên civakî û kultûr û dîn û ziman û regezan û rûberê azadîya heyî, biguncin."...

Can cak roso 1712 – 1778: pêşkevtin û zansit mirovan dûrî resenatîyê dikin û bere bere havî dikin..., nivîskar û fîlosofek newaz bû. Xiwedanê pertûka hevbesta civakî ye. Ew bi xwe mirovekê hejar bû, bi zimanê hejaran dipeyvî. *Digot hezaret xirabe û ziyanê digehînt mirovî û jiyanê. Aqlê wî ji mirovê sade û seretayî dibrrî çunkî ew aştî û azadyê diparêzt neku têkdidt*.[157] Belê mirovê serdemî, mirovekê berjewendixwaze, amadeye hertiştî gorî berjewenda xwe ya kesatî bikt, roso bawerdikt ku xweza jîderê xêr û viyanêye, belê pêşkevtna zansitî û kultûrî jîderê ziyanêye. Heta radekê ew ji dahatûîy û ezmûnên zansitî ditirsya, ku mirovî biguhorn (nerênî) û êdî tiştên bedew û ciwan jidest bidt.

---

[156] 'Elaedeyn Sicadî , *edeba kurdî û vekolîna le edeba kurdî* , weş. Me'arf , Bexda 1967,r76

[157] 'Ezîz Gerdî , *rexne û edeb* , weş,hiwadis , Bexda 1974,r76

Hilfîsyos 1715 – 1771: metiryal negringe, lê hizir û ruh gringin çunkî ew bi karê xulqandinê radbin, ew bi xwe werzişvan bû belê bi hizra xwe dijî kenîsê rawestya, ( binêre çawan wî peywendîya werizşê bi hizrêve grêda, belê werzişvanên me werizşê bi rahînan û masilkanve grrîddin) ewî bi tundî înkara xeybê dikir, digot: *aqil û berhest kefîln ku pêşkevtinê peydabkin. Sera bîr û boçûnên kesatî, perlemantoyê parîsê biryara şewtandna pirtûkên wî da* [158].

San sîmon 1760 – 1825: nabt em hukmî bidin kesên siyasetmedar û 'esker çunkî ew xiweperêsn û li kursyê digern, ya baş ewe em hukmî bidin zana, nivîser, *hunermend, werzişvan û sosyolojan... êk ji nivîskar û hizirmendên frensa û ewropa bû*[159]. Bi awayekê bisteh peyama xwe radgehand bi taybet derbarê hukmî û desthelatê.

Destovêskî 1821 – 1881: hişyar bin, ne webt hûn bawerîyê bi êktahîyê bihînin, romannivîsê sovêtistanê. Bi rêka romanê derbazî felsefê bû, lew kesek weku walter kofmanî dibêjt: "destovêskî bi romanên xwe bû serdarê felsefa hebûngeryê.

Franis kafika 1883 – 1924 : hindî bimînim pitir havî dibim, xwedanê sê nasnaman û hêj hest bi havîbûnê û biyanîbûnê dikir. Ew jî nivîskarekê bi hêz bû di biwarê hebûngerîyê de. Raste gelek nivîskarên dî jî derbarê havîbûnê nivîsandine, belê çu kes negehaye kafkayî çunkî havîbûn di nav wî de mezn dibû.

Rolan part 1915 - 1981: ez 'aciz dibim wextê wêneyek bo min dihête çêkrin û navê min dihête blêvkrin...", nivîskar û hizirmendek firensîye, li parîsê mezn bû, derçûyê zankoya sorbonêye. Daxbarê felsefa hebûngerîyêye, bispore dibwarê rexneya edebî û zimanê sîmyolojî de, *pirtûkên buhadar derbarê têksit û rexna edebyatê belavkirne ji wan jî (rexne û heqîqet, çêja deqî) û gelekên dî. Part dixwazt hizir û zeynê mirovî berdewam kar bikt,*[160] bê rawestan, gelek li ser binyatgerîyê

---

[158] Perêz Sabîr, *bînay hunerî di çîroka kurdî da , heta cenga cîhanî ya dûyê* , weş.serdem , Silîmanî 2001 ,r19

[159] Hisîn 'Arf , *çîroka hunerî ya kurdî ,1960-1925* , weş.dar tba'e ,Bexda 1970 ,r72

[160] Kameran Mukrî ,*çîroknivîs* , weş.sumerye , Bexda 1988 ,r54

rawestaye û prispektîvên taybet derbarê wê ragehandne. Ewe yê mirna danerî ragehandî û meqamê xwandevanî blindtir krî.

Mîşêl fogo 1926 - 1984: rizgarkirna hizrê jixyal û nircsîyê û şkandna baznên berteng gereke bibt serkarê mirovan", ew bawer dikt zanîn hêza herî gringe bo mirovî li hember her diyardeyeka hebt. Hindek kes bawer dikin ew fîlosofê frensa yê dûyêye piştî sarterî, *belê hindek kesên dî hizir dikin wî ji sarterî borand. Pê xemetî paraztna mirovî û jiyanê û hizra serdem, berdewam heluyistê xwe dijî desthelatên cuda cuda radgehand*[161].

Cak dirîda 1930 - 2004: têksit serbixwe ye û hêrmênotîka tradîsyonêl nikart ramana wê îktîşaf bikt, belê dibt hêrmênotîka ciyawazîyê bikart", fîlosofê helweşandinê, cak dirîda dixwazt bi felsefa xiwe bêjt çu tişt li derveyî têksitê nîne, ramanên ku dihêne dîtin û yên hêj nehatîne dîtin hemû di têksitê de hene û berhevin bo guhorînê. *To dikarî bêjî ew kodetayek bû li ser teyoryên berê û ravkirnên wan. Dibêjt: têkista edebî serbixwe ye, dibt nivîskar bi xwe jî tênegeht*."[162]

Con sitrok di pertûka "binyatgerî û rehendên wê" de brek pirsyaran araste dikt, bi hizra min baştirîn dumahîke berî ez bgehim postmodêrnîzmê. Ew pirsyar jî eve ne: to bêjî modêrnîzm weku bizav hewildanek bû bo rawestandna dîrokê û paşî dadgehkirna wê? Axir kîjan qûnaxa dîrokî, yan jî mebest dîrok hemûye? Erê bi rastî modêrnîzm hevdija burijwazîyê bû? Nexwe çima çîna burijwazyê seranser cîhanê bi hêz peyda bû bi taybet li ewropa di sêsed salên borî de*? (Heman pirsyar derbarê rewşengerîyê jî dihête kirin). Erê modêrnîzmê beşdarî di avakirna sermayedaryê de kir yan no? Nexwe kîjan bizavê sînor bezandin û bazarên vekrî û azad seranser cîhanê peydakrin? Erê modêrnîzm li hember rabridûîy rawestya?*[163] Anko serkarê wê ew bû şerê rabridûîy bikt, yan bo dahatûîy kar bikt? Serbarê asankarî û pêşkevtinê, çima modîrnîzmê havîbûn û mewda peyda kirin? Aya modêrnîzmê

---

[161] Heme Se'îd Hesn , *hizru şêwaz di çîroka kurdî da*, weş.aras , Hewlêr 2005,r65

[162] 'Bdalirhmin 'Bidulxefur husin , *ezmûnên nûxwazî di alyên grûpên nukrî* , zanîngeha koye 2012,r42

[163] Kemal M'ruf , *edebyata kilasîk û nû xiwazya kurdî* ,  weş.jîn,Silîmanî  2003,r43

## 4.5.Postmodêrnîzm

Wek ku "gotê" dibêjt: mirov dê pêşkevt lê her rehet û tenah nabt, raste mirov pêşkevt, belê heta kîjan radê rehet û tenah bû? Çawan pêşkevt? Yan gotna wî rehaye, ku qet tenah nabt? Belê li chekê dî jî dibêjt: hêza me di wê çendê de ye ku em çucar bi dumahîk nahên, diyare serbarê nebûna rehetî û tenahîyê her bi dumahîk nahêt. Nexwe, mirov prosesek dînamêkîye, zindî û berdewame, bi dumahî nahêt belê dihête guhorîn. Guhorîna mirovî jî guhorînên berdewam, dihemî bwar û biyavande, dixwazt bê ku mirov prensîpên sereke jidest bidt. Belê, heger mirov tenah bû, aya êdî pirsyaran nakt? Êdî lêgeryana xiwe berdewam nakt? Îdî li hêvîya çu namînt? Jiberku mirov çendîn zatan pêk dihêt, lewra dixwazm pirsyarek dî bikim: erê zeftkirna wan zatan mumkne? Pêşkevtna mirovî jalê teknolojî û înformasyonîve heta radekê tenahîya aqlî û bedenî dabîn dikt, belê to bêjî bşêt ruh û derûna mirovî tenah bikt*? Ez bawerdikim zansit û teknolojî nikarn mirovê sade û sikar - li gor daxwazê - tenah bikin çunkî gewherê hebûna mirovî, ruhe*[164]. Ruh jî anko zatê herî bilind, zimanê wê dûre jihejmarê. Hindek nivîskarên tagrên zansit û teknolojyayê dibêjn: nivîserên hebûngerîyê reşbînin, nikarn çu pîşkêşî mirovî bikin, ew mirdarn û karê wan bûye vegêrana êş û eleman... Dibt ew nivîskar li gel xwe rast bin, belê bi heman rastîyê dixwazm pirsyarekê bikim: axir ew êş û elem jikûve dihên? Çawan peyda dibin? Erê ew êş û elem rastî yekin yan no؟

Bizava postmodêrnîzmê piştî modêrnîzmê hat da dumahîka modêrnîzmê ragehînt jiberku nkarî soz û peymanên xwe bich bihînt, herwek hizirmendê frensî (fransoa liyotar)dibêjt. Ew bawer dikt têgeh û pêkhatên kevin wek soşyalîzm û markîsîzm û lîbralîzm û... Hitd, neşyan wî mirovê sade û sakar tenah bikin çunkî wek teyorî heta radekê kamlanebûn, belê wek praktîzekrin li gel dorhîlî hevdij bûn. Erê raste wan têgehan neşyan sozên xwe bich bihînin? Eha li vê derê mirov pirsyarekê bazrînt: erê astê pêşkevtna hunerî, edebî, teknîkî, pîşesazî, zansitî, feleknasî û...hitd, bi saya postmodêrnîzmê yan jî rewşengerî û modêrnîzmêye؟

Erê postmodêrnîzm rexneye bo modêrnîzmê yan îmtîdad û berdewamîye? Heger rexne bit, to bêjî hindek elternetîvên dî bo kêmasî û lawazîya modêrnîzmê

[164] Kerîm Hîsamî, *yadî Hêmin* , weş.serdema nû , siwêd 1987,r43

peydakirbit? Jixwe heger îmtîdad bit, *çima dumahîka wê radgehînin? Erê eve ne vegeryane bo paş, bo serdemê markis û nîçe û froydî*?[165]

Erê postmodêrnîzm bi xwe coreke ji corên hizrî û epistmî, yan bi tnê danasîneke bo qûnaxeka zemanî ya taybet? Çend dikart beşdaryê di avakirna sîstemê dîmokrasî û dadwerîyê de bikt? Heta kîjan radê dikart bandorê li têgehîn mezn wek soşyalîzm, markîsîzm, lîbralîzm, globalîzm û... Hitd, bikt? Erê herfandna dorhêlî xayete, yan jî mehaneye bo avakirneka nû? Kîjan avakirne gelo? Heger nûkrinê dixwazt, erê nûkrin dikîjan warî de? Nûkrin bi merema bidestvehînana hêz û desthelatî, yan nûkrin bo nûkrinê? Lê kîjan corê desthelatê bi esehî? Axir (mîşêl foko) derbarê hêz û desthelatê dibêjt: zanîn hêzê nadt me daku em beranber hindekan bi karbihînin, belê ew bi xwe hêze û em bi kardihînin... heger postmodêrnîzm zanîn bit, li gor gotna fogoyî, aya em dikarn bêjn ku postmodîrnîzm jî hêze em bi kardihînin؟

Diyare postmodîrnîzm bizav yan felsefeyeka nûye, îmtîdade (ne bo modêrnîzmê) lê bo dîroka mîratê mirovatîyê. Hertişt nû dibt, belê tris ewe ku hertişt zû bi dumahîk bihît, çunkî postmodîrnîzm çu qalb û sînoran napejrînt. Pirsyarek dî rêkê li min û xwandevanê hêja digirt: *erê mirov dorhîlê heyî ret bikt û li elternetîvan bigert, yan heman dorhîlî sazbikt? Eve û gelek pirsyarên dî hene belê heta çi radê postmodêrnîzm dişêt berisvan bidt?*[166]

*Raste rewşengerîyê hindek valatî û pirsyar li dûv xiwe hêlan bê pirrbikt, raste jî tûşî rexnên tund jalê markis û nîçe û firoydî bû, belê nahête wê me'nê ku çu bandor li modêrnîzmê yan postmodêrnîzmê nekirbi*[167]*t.* Heger em bêjn modêrnîzmê nkarî elternetîv û çareserîyan bo prisgirêk û qeyranên demî bibînt, to bêjî postmodêrnîzm bikart? Herwesan, to bêjî postmodêrnîzm girentîyê bidt, ku destkevtên rewşengerî û modêrnîzmê neparêzt yan bihêztir nekt? Erê postmodêrnîzm dixwazt mirovî weku gewher biguhort, ku bi awayekê nû û cuda serederîyê li gel zatê xwe û tiştan bikt, yan daxwaz bi tinê guhorîna rewşa derekîya wî mirovîye? Erê guhorîna sîstemê

---

[165] Kerîm Deştî , *edeb û felsefe* , weş.şivan , Silîmanî 2004,r19

[166] Goran, *dîwanî Goran* , Muhemdî mela Kerîm , weş.korî zanyarî îraq, Bexda 1980,r76

[167] Marf Xeznedar, *lebabet dîroka edeba kurdî* , weş. Miwesse alraqye , Bexda 1984,r98

civakî û kultûrî bo xwe kirîye mebest heta em behsê guhorîna gewher yan mezherê mirovî bikin؟

Franiswa lêyotar:

franiswa lêyotar" wek serkêşê postmodêrnîzmê dihête naskrin. Heta radekê bandora "emanoêl kant" î li ser wî hebûye lewra bi heman prispektîvî li dîn, aqil, moralî û îstatîkê dinêrt, belê pitir gringî bi hêrmênotîkê da. Lê xayeta hêrmênotîkê jî her mahîyet û fînomînolojîye belê bi awa û mêtodên serwext li gel hindek ciyawazîyê. Liyotar ciyawazîyê dikt bingeh bo rêbaza xwe, ku nabt hizrek tinê xwe bi xwedanê hemî rastîyan bizant. Diyare rastî hizirkirnê dixwazt, belê heger hizrê pena bo xeybê bir, to bêjî bgeht rastîyê? Lew ew bawer dikt ku penaberîya hizrê bo hukmê reha û xeybê, corekê fenabûnêye. Postmodêrnîzm dixwazt bêjt hertişt qabîle bo hêrmênotîkê yan ravekrinê (badanê) û mahîyet yan rastî pirsyareke û li pey berisvan digert.

modêrnîzm bi dumahîk nehatîye, çunkî hêj berceste nebûye..." , erê çima berceste nebûye? Nikarî, yan wê bi xwe nevyaye da (paşî) bêwate nebt؟

habirmas" bi tundî berevanîyê ji modêrnîzmê dikt çunkî li ser esasê aqlî (Rationalization) û civakê pîşesazî (Industriy Societiy) dûrî binemayên dîn û mîtolojîyê hate damezrandin. Habirmas bawerdikt modîrnîzm di huner û pîşesazî û metiryalê de, encama modîrnîzma hizrî û epistmîye, lewra pêdvîye mirovê hizrî û epistmî bihête paraztin, dûrî hera û têkdan û sergermîyê. Bi wan mehane û alavan, ew hewl didt li hember postmodêrnîzmê bseknit. Raste ew merîdê terîqeta "edorno" bû, herwesa xelatê wî wergirtbû, belê şiya serixwebûna zatê xiwe biselmînt û berdewam li pey damezrandna civakê serdem bigert paşî biparêzt, çunkî hêj pêdvîya mirovatîyê pê heye, belê bawernakt ew civak ji rehmê postmodêrnîzmê derkevt çunkî ne li ser esasek hizrî, epistmî û rêkxistî xiwe pêşkêş dikt. Civak û mirov bûne bingehên xebat û lebata habirmasî, belê to bêjî paraztna mirovî û civakî bê yasa û exlaq û rêzgirtna kultûr û dîrokê encam bidt? Bi rastî jî hizir û peyamên habirmasî derbarê têgeh û pêkhatan hêjayî hêrmênotîkêne, lê heta kîjan radê em dikarn ji derheq derkevin؟

Di her biwar û biyavî de (bi taybet ravekirna pirtûkên asmanî) habirmasî gringî da hêrmênotîkê. Herwesan gringî da azadîya hizirkirn û ravekrinê jiberku ew azadî mirovan digehînt hevdû bi xwe heger jê derên bawerîyê cuda bin jî. Derbarê mahîyeta mirovî, dibêjt: kar û ziman me jiheywanan cuda dikin, kar dihêlt em hizrê di berjewendîya xwe de bikin û ziman dihêlt em gehandinê berdewam bikin... binêre çawan ewî bi xwe hêrmênotîk kirîye pirek da xwandevan derbazî cîhana ramanan bibt. Erê em dişên bêjn modêrnîzim bi heman prispektîvê li tevaya têgeh û pêkhatan dinêrt? Axir kîjan têgehê xweser û dabirr heye heta mirov êk awayê serederyê bo destinîşan bikt? Erê postmodêrnîzmê sînor dinavbera zat û serixwebûna pêkhatande hêlaye? Mirov têgeh û pêkhateyekê neserbixweye, *ji cih bo chî û ji dem bo demî cudaye, lê belê zindî û berdewame, çu qalban napejrînt û dînamêkîya xwe diparîzt, herwesan dîn, kultûr, ziman û exlaq jî berhevin bo guhorînê, belê to bêjî berhev bin bo nemanê? Sercem teyorî û prispektîvên berdest neşyayne danasîneka dabirr bo têgeh û pêkhatê zimanî diyarbkin, ku bibt sergeh bo mirovatîyê, lewra jî hewildan berdewam bin û îktîşafa rehendên nû jî berdewame.*[168]

Herwesa derbarê diyanetê jî. Gelek kes hizir dikin ku bi tinê corekê diyanetê heye, ew jî bi hizra min boçûneka formalîste. Belê habirmas dibêjt dû corên diyanetê hene: diyaneta rawestayî û ya dînamêkî. Em dikarn derbarê corên diyanetê li kurdistanê pirsyarekê bkin: erê çend corên diyanetê li rojhelatê bi giştî û li kurdistanê bi taybetî hene? Herwesan derbarê exlaqî jî . Em corekê exlaqî bi tnê nas dikin, ew jî xwandin û mîratê dîrokek selefîye, belê habirmas bi prispektîvek dî li exlaqî jî dnêrt, dibêjt: exlaq ji exlaqî cudaye, exlaqê kesatî heye û yê tevahî jî heye. Herwesa exlaqê vekrî û yê daxsitî jî heye... diyare exlaqê vekrî mirovane û kesatîye, azade, berheve bo guhorînê, li ser fezîlet û kamlanebûnê ava dibt, evîn û mihredaryê didt, ruha mirovî dibt sergeh bo her kar û kiryarekê... Hêza xwe ji azadî û jiyanê werdigirt . Exlaqê daxsitî jî exlaqek neazade, cvak û kultûr wî disepînin, neberheve bo guhorînê, belê bi tinê hîngê dê guhort heger civak û kultûr hatin guhorîn.

[168] Esma'îl Resul , *çend basêk derbarê rexneya edebî* ,Bexda 1981,r98

Di vir de emê peywendîya di nav bera felsefê û karê rexneyê wiha bidîn eşkerekirin ku, felsefe zanîstekî kevi a lêkolîna binçîneya jîyanê ye li gel her du Fîlozofên mezin ê Yunanî ( Arîsto û Eflaton ) serî hildaye. Peywendîya wê bi hemu alîyên jîyanê ve heye û bandora wê li ser hemuyan jî heye. Karê rexneyê jî karekî çareserîya merîfîye armanca wêjî çêkirina mijara xwendevane. Pêşkêşîyekê di nava helbestvan û nivîskar de dike bi tayber di navebera her du zanîsta felsefê û zanîsta rexneyê de dike. Karê felsefê û karê rexneyê peywendîyekî bi hêz dinavbera wan de heye. Mijara wêjeyê rengdayîna binyata civakê ye û rexneya wêjeyê jî lêkolîna şîrovekirinê ye. Karê felsefê jî binyata merîfîyetê ye. *Bi zanîsta felsefê re karê rexneya wêjeyê xweşiktir dibe. Ji ber vê jî tenê ne li gel rexne û wêjeyê belku li gel hemu zanîstên din felsefe peywendîya wê bi hêze*[169].

Di wêjeya kurdî de jî karê rexneyê qet ji wê kêmtir nîne ku di wêjeyê de heye. Felsefe jî zanistekî dîyare û bandora wê li ser hemu alîyê jîyanê heye di civaka kurdî de jî. Giringîya felsefê jî bi wê felsefeyê ve ye ku di cîhanê de hebûna wê heye.

Felsefe di sedsala 19 an de berê xwe da zanîstê û hewilda wekî zanîstekî rastî be. Wiha serîhidaye ku misoger dike dev ji wan hewildana bîne ew jî bi eşkerekirina wan sedemên serekî ke di pişt vê cîhanê. Ev jî ket dibin bandora vê de. Di encamê de rastî serîhildaye.

*Bê goman rêbaza wêjeyî jî ruyeke jiruyê rêbaza rexnegiran. Ev jî ji ber wêjey xwe bi xwe rexneyekî di rêbazên pêşî de ne. Romansîzm rexneya wê ji bo Kilasîzmê ye Rîyalîzm jî rexneya wê ji bo Romansîzmê ye. Bi vî awayî jî rêbazên wêjeyê di felsefê de derketîne holê*[170]. Her yek ji wan jî di cihê xwe de cîhanekî rêkxistî ji bo gerdon,mirov û çalekîyên mirovayetî heye. Felsefeya fîlozofan jî koka wê di wêjeyê de heye. Mînak huner di xwede bangeşeyê ji bo wê dike. Li piştî felsefeya kant jî di ( 1804 ) an de dibîne qet reyek ji bo nasîna tiştek di xwe de nîne,Ji bilî berjengê derekî

---

[169] Husîn Muhimed 'Zîz , *yaqut û zimrrutî kurdî* , (siruşt û ciwanî ) ,berg3 , weş .sîma .slêmanî 2007,r13

[170] Mes'ud Muhemed , *zarava pêwanesazî* , weş , roşnibîrî , sumer , Bexda 1988 ,r87

ne be.Kant karê hunerê ji rastîyê dibire pişt re jî formê di naverokê de cuda dike. ( Ciwanîya raste rast textê xwe di muzîk di xemilîne ku qet naverokekî felsefeyê jî nîne ku ev jî di xwe de armance ).

## 4.6. Form û îstatîka

Hemu ev bune sedemê felsefa Kant û ewên ku ketin di bin bandora wê felsefeyê de bibe piştgirîyek ji bo alîgirê huner ji bo hunerê û sembolê. Felsefeya ayîdlîstan hemû ciwanîyê tenê di felsefeyê de dibîne. *Lêbelê ev ayîdlîstîya mezin wekî ( Hegel ) ji bîr nakîn ku ( Yekêtîya form û naverok bandora wê li ser ya din heye )*[171].

Lê belê giringîyekî taybet a naveroka helwesta wêjeyê di derbarê çardewrê wê de derdikeve. Bun gerayê di sedesla ( 19 ) an de li ser destê Kîrkgorî hizirvanê Danîmarkî ( 1855 ) de serî hilda di pileya yekem de girîngî bi mirov û wan tiştan dida ku tevlî dibû. Wekî; mirin, guneh, serkêşî de bu bi wêjeyê pesin di rewşa xwe de bida.

Sarter di vê rastîyê de rabû bi nivîsîna roma û şanonameyên xwe yên wekî ( Hêlnc û Rêya Azadîyê ... her wiha ferheng û name nivîs hebun rêbazekî rexnayeyî nu hebÛ. *Sarter binemala xwe di xwe de şîroveyekî deronî û cuda li ser bû Dilêr û can Flubêr bi cih kir. Hebun gihişt wê ku bêje ( Erkê wêjeyê her bi tenê dahênan û berhem anîna ciwan nîne, belku pêwîste wêje ruyekî giştî be di ruyê hestê mirovan de*[172].

---

[171] Nefîsa Esma'îl Hacî , *teknîka vegêranê di kurte çîroka kurdî fazl 'umerî da* , ç1, weş , îketya nivîserên kurd –Dihok , weş .hawar ,Dihok 2005 , r67

[172] şukirye Resul , *teknîka vegîrranê di çîroka marf berzincî da* , ç1 , weş , wezareta perwerdê , Erbîl 2005 ,r113

## 4.7. Girîngîya Naverokê

Her wiha sosyalîzîm wekî bingehekê girîngîyê bi naverokê dide. Her çiqas ew bingehe ku her du felsefe jî tê de derketin lê her cîyawazin. Piştre jî bingeha felsefê yeke. Lê belê sosyalîzm felsefeya civakê ye. Ji ber vê jî belku ev naveroke armanca wê wêjeya sosyalîstê ye û pêşkêş dike. Wêjeya Sosyalîstê hinek girîngî bi cîhana ji derveyî mirob ( Civak ) ê dide. *Ewqasî girîngîyê bi cîhana di nav mirovan de nade.Bi vî awayî jî wêje û rexne bi cîyawazîya wê felsefê ku jê çavkanî wergirtîne û cîyawaz dibin. Ji ber vê jÎ em dikarin di vir de bêjên peywendîya di navbera Felsefe û rexneyê de sê cor hene*[173].

1-Rexnegir bi xwe fîlozofek be di rêya felsefeyekê de fêmkirina xwe ji bo wêjeyê pêşkêş dike. Wêje dibêje wekî çawe Eflaton û Arîsto di kevin de û sarte û hinek fîlozofên din êrexnegir di nihade bi wan rabûne.

2- Rexnegir di felsefeya xwe de hatibe ji derve bi wê bawerîyê de be ku ew felsefe di wî çerxî de hebe. Her cor ( Tîufîl Gotya ) ê rêbaza huner ji bo huner ew nîzîkatîya ku rêbaza wêjeyê di alîyekê de rêbazekî rexneyî di felsefeya kant de serî hildabe. Mînakek din alîgirê sembolê ye di felsefê de.

*3- Pêwîste rexnegir pişta xwe bi zaravayê felsefê û çerxa xwe ve girê bide û bi ser helbestê de bi cih bîne. Ev her sê cor jî di nava xwe de bi hev diçin û tevlî nava hev bune.*[174]

Bandorû û Peywendîya Di navbera Zimanê Wêjeyê û Zimanê Rexneyê De Piştî eşkerekirina komek babet pêwîstîya wê bi karê rexneyê ye. *Ew alîyên ku peywendîya wan bi karê rexneya wêjeyê ve heye. Di vir de di alîyê zimanî de zimanê wêjeyê û zimanê rexneyê nudike.*[175] Eger em behsa peywendîya di nav bera mijara wêjeyê û rexneyê bikîn peywendîyekî bi hêz di navbera wan de heye û yek bêyî a din

---

[173] Êbîh Muhimed Husin , *çend rêyek bo deqê* , ç1 , weşanên êketya nivîserên kurd –Dihok , weş , hawar , Dihok 2004 , r76

[174] Celal Mustefa , *biyavê xiwandinê* , ç1 , ji weşanên ekteya nivîserên kurd – Dihok , weş .hawar , Dihok 2004 ,r34

[175] Hesen Caf ,*çîrokî niwêy kurdî* , weş .'ela , Bexda 1985 ,r23

jî nabe.Ji ber ku rexne di boşayîyekê de çênabe belku pêwîstîya wê bi mijarekî wêjeyî heye. Dubare gelek mijar cihekî berçav di rêya rexneyê de bi dest dikeve. Peywendîya mijara rexneyê ew mijarên wêjeyêne berhem anînê du alîne û bi hevve girêdayîne. Ji ber ku wêje pêwîste armanc û cewherê rexneyî be. Ji ber vê jî bi hevve girêdan û tevlîhevîya wê li ser wê nîne belkû ( Toduruf û Rolan Bar ) derketîne rexne tenê derketina mijarê nîne ji bo her tiştekî belî girêdayîbe. Ev girêdanejî pêwîstîyekî wêjeyîye. Di vir de peywendîya di navbera mijarekî wêjeyî bi xwe be ji ber vê jî babeta serekî a rexneyê mijare. Lê belê ya mijara mirov û cîhanê ye. Her çi qas demê ku rexne dur be ji mijara wêjeyê di pileya yekemde avakirînekî cîhanîye. Wiha mijarê çareser dike. Ev şêwe sîstemê pêkhateyekî zimanîye. Ji ber vê jî beşa pêşî de me dîyar kir girîngîyek hevbeş di navbera mijara wêjeyê û rexneyê de kême. Ziman di her yek ji van de hevbeşe û her yek ji wan de jî armanc û şêwazekî cîyawaz de bi kartê.Ev jî di dualî de cîyawaz dibe. *Demaku lêkolîn di xweza û erkê her yek ji ziman rexne û ziman afirandine. Yan jî cîyawazîya her du zimana di xwezayê de di erekê wê deye.*[176] Zimanê wêjeyê di xwezaya xwe de zimanekî pir şerîîye û li ser bingeha şikandina zimanê asayî de di komek rê de pêkhatîye.Ji ber vê jî zimanê rexneyî li gorî fikra ( Rolan Bard ) zimanê duwemîne yan jî zimanê çareserî û pakîyê ye. Di alîyê ziman de peyrew dike zimanê wêjeyê zimanekî zanayîye û zimanê rexneyê jî zimanekî barkirîye. Eger em di nav de biçin di alîyê her du zarava de jî biçîn emê bibînîn zana û barkirin du beçên mantiqîne. Bi awayekî zindî pirsgirêka anîna amêran zanîsta serbi babetekê asanî dike. Zana di derbarê keresteyê zanîstê de cîyawaze dikarin derbikevin di xanika mejî û hizir yan demar de. Le belê barkirin gotarekî zimanîye. Di navbera her du zimanê barkirin û danînê de wê dîyarbikîn ku ew zimanê ku cara destpêkê berhemekê di afirîne zimanê zanayê afrênere. *Li gorî vê kar li ser wî zimanê wêjeyî dike. Destpêkêde karê xwe kirîye zimanê barkirin yan jî zêdekirina zanyarî û gotinê zêdetir li ser zimanê wêjeyê. Her tîpek jî zêde bê kirin ji dil zimanê barkriyê*[177].

---

[176] 'Bidulqadir Muhimed Amîn , *wêneya hozanan dinav edebyata modêrnîzm ya kurdî* , weş.serdem , Silîmanî 2002 ,r98

[177] Ferhad Pîrbal , *rîbazên edebî* , çapa îkê, weş.minare , Hewlêr 2006, r56

Cîyawazî di navbera zimanê wêje û zimanê rexneyê de wekî wê dîyarkirîye di erkê wateyî de wekê zimanê wêjeyê û rijandina ciwanîyêye. Ziman tê de ji xwe re bikartîne her çiqas hizir dike armanc di alîyê mirov û cîhanê de ye. Ji ber vê jî zimanê rexneyê zimanê şîroveyê ye. Di vir de her wekî me di pêşîyê de jî amaje kirîye. Zimanê wêjeyê wateyekî dide, le belê zimanê rexneyê şîrovekirina wê rexneyê ye.

*Eger em qala bandorîya di nav bera zimanê wêjeyê û zimanê rexneyê de bikîn di virde em dikarîn bêjîn ji ber ku ziman amrazekî hevbeş bîye û metirsî tevlî li nava her curekê de heye. Her ji ber vê jî rexne pêwîstî bi pileyekî bilind û şîyar û têkçûnê heye. Gotin û zarevayê xwe bi azadî û rihekî zanistî cihê bawerîyê dîyar dike*. [178]

Her çiqas şîrovekirin di cihekê de di gehije encamekê , lê belê di be encamekî peywendîyê û bandora zimanê wêjeyê li ser zimanê rexneyê dibe. Ji ber ku xwendina mijara wêjeyê bi wê zimanê pir şerîye di alîyê rexnegirde di karkirina xwe a li ser ziman de dibe. Dema gotina wêjeyê hewil û ciwankarîya wêjeyê dide wan mijaran di alîyê wê peywendîyê de dibe.

Her wiha peywendîyek din kî di navbera wêje û rexneyê de derdikeve hol. Vê carê di çar alîyan de hevbeşe û peyda dike. Biryardayîna li ser encama nubûnê jî ew jî : Wateya wêjeyê, zimanê wêjeyê, gotina wêjeyê, gotara wêjeyê ye.Armanca wê naverok, zimanê wêjeyê û rexneyê ye. Ji me re tê dîyarkirn ku bi Şazde ast bi nubunekî nu radigihîne. Ew jî bi rêya biryardanê bi encama nubûnê di nava wan de. Piştî her yek ji van çar alîyan dîyar dikîn ew 16 aste di nexşeyekê eşkere kirîye.

---

[178] Hîmdad Husîn , *derwazyek ji bo rexneya edebî ya kurdî* , çapa îkê , weş,mukiryanî , Hewlêr 2007,r9

## 4.8.Hebûna Rexneya Wêjeyê

Di van salên dawî de ji dil li ser wê kirîye ku belê mijara wêjeyê hebûna heyî yan na ? Bandorîya encamên mijarên wêjeyî çîne ? Her ji ber vê jî birwarê cuda belav dibe. Rexneya wêjeyê di wêjeyê de rêgezekî girînge û bi bandore jî li ser mijara nivîskar. Her wiha di nava gelek wêjeyên netewande cihê raste rast ê xwe girtîye. Rexneya wêjeyê bi xwe jî hunerek a şîrovekirina hevdana mijaraye. Derxistina alîyê ciwan û ne ciwan ê mijaraye. Di alîyê rastî û ne rastîyan xalên ê girîng ê zanîsta alîyê akademîk de jî bi bandore. Ji berî ku rexneya wêjey merîfîyê werbigire, *tam û hunera îstastîkî ya hunerê girîngîya wê gelekin di rexneyê de. Rexneya wêjeya ereban jî ji cahîlîya heya ebasîyan bi şêweyekî şibandinê xwe di razîne.* [179]

Di derbarê rexneya îstatîkî de jî wêjeya ereban di çavê wêjeya kurdî de berdewam di pêşketinê deye. Em dikarin navê bi dehan hizirvana vî alî bînîn ku di çarçêweya rêgeza bingehê de dernakeve.

Sedema lewazî û dapîna rexneya wêjeya kurdî di çavê rexneya ewrupa, tirkî , Farisî û erebî bi çend xalên girîng û dîyar de dizivire. Ji bo rizgarbuna ji vê rewşa ne guncav gelek nivîs û babetên îstaktîkî ê di nav de bi navê rexneya wêjeyê hatîye nasîn. Pêwîstîya wê bi lêkolîna babetan û girîngîya gorinan jî hildigire. Em di vê kurteyê de nikarîn bi temamî dîyar bikîn. *Pêwîste ev li ber çavê me be her dem di navde bi navê rexneya wêjeyê çend tiştekê bavêjin ku peywendîya wê bi rexne û wêjeya nivîsînê ve nebe û naçin di nav rexneyê de. Ev jî di nava hemu cîhanê de di çarçuveya karê akademîk û zanîstî de derdikeve holê*.[180] Ji ber vê jî di salên 70-80 an de wêje gelek baştir û watedar bû. Gelik ji me vê dizanin bi taybet di nava wêjeya cîhanê de dinava her babetek yan jî mijarekî wêjeyê de her karekî rexneyê dîyar dike.Mixabin dema em behsa rexneya wêjeya kurdî jî dikîn ev tê pêşçavê me heman

---

[179] Fuad Reşîd , *bunyadgerî di roşnibîrî û rexneya edebî ya kurdî* , îketya nivîserên kurd , çapa îkê, weş.arabxa , kerkuk 2007,r45

[180] N'mit Alle Hamd Nihêlî *,pêlê, rexneyî –komeka vekolîna di têkistanda* , çapa îkê , weş , hacî haşm , Hewlêr 2007 ,r34

hewildan bandorê li ser rexneya wêjeya cîhanê hebû. Di heman demê de li ser rexneya wêjeya kurdî jî hebû.

Niha di nava wêjeya kurdî de her yek ji wan bi zorê derketîye holê li ser hebûn û nebûna rexneya wêjeya kurdî.Belê raste niha ew nivîsînên bi navên rexneya wêjeyê li ser mijarê tê nivîsandin. Ev jî ji balkêşîyekê zêdetir qet tiştekî din nîne. Wêjeya kurdî her di vî alîde ( Rexneya Wêjeyê ). de nîne. Belku di gelik alîyên din de :Werger,mijaraxirab,lêkolînkirina kor,yên ku wêjeyê dixwîne destbi nivîsînê dike ji bo avêtina di nava wêjeya kurdî de.

Gelik ji nivîskarên kurd bê berpirsyartî mijaran dinivîsîn. Bêyî ku hinek din girîngîyê bi vê wêjeyê bidin qet bandorê li ser nivîsîna mijarê jî nake. Ji ber ku pêwîstîyekî ewe ku pêwîste nivîskarên wêjeyê bi ezmun bin di alîyê xwe de. Her wiha nivîskar bi xwe bi kêmasî di zanin di beramberî babetên wêjeyê de. Em dikarîn ji ber vê jî bêjîn qet pêwerekî zanîstî û akademî nîne ji bo sansora bike li ser mijara wêjeyê. Fikra wê jî nakin ku mijar heya kuderê bi bandor dibe. *Heya kengê wê bê afirandin. Di alÎyek din de jî çi pêwerek din li ser temen nîne ji bo nivîsandina pexşanekî rexneya wêjê pêwîste xwedîyê piştevanekî xort a wêjeyî û rewşenbîrî be. Her rexnegirek pêwîste çend zimanekê bizane bi taybet zimanên wekî ( İngilîzî, Firensî, Erebî, Farisî, Tirkî û İspanî )*[181].

Eger rexne jî hemu alîyekê nase neke, ew ni kare bi be rexnegirekî akademîk. Ji ber ku Bi wan nasandina rêbaz û pirtûkxanên wêjeyê û rexneyê dikarin karê akademî encam bidin. *Her wiha li gorî van zanyarîyên dîrokî jî di niha de û demê bordî de hemûna karê akademîk bandorê li ser karê rexneyê dike. Ev rêbaz û nîvîse di alîyê rexneyê de nakeve dibin bandora tiştekê de*[182], ji bilÎ karê rexneya akademîk. Em dikarin vê wekî pirsgirêk ne zanîn,ziman û ne naskirina wêjeyê, wergera birîndar, pirsgirêka nivîskar û xwendevan ev hemu rêgirin di pêşîya karê rexneyê de.

---

181 Yasrê Hesen , *wexerek di nihênyên deqêda* , ji weşanên îketya nivîserên kurd , Dihok , weş . Hawar 2004 ,r34

182 'Bidalqharî Şêx , *ezmûnên hozana kurdî* , weş.pak , Hewlêr 2001 ,r39

Gelek nivîsî û wergerên ne temam derbarê rêbaza pirtûkxanê di zimanê duwem û sêyem re hatîye di nava wêjeyê de. Ji ber vê jî gelek nivîsînên rexneyê jî pişt bi zarevayê rexneyê ve girê dide. Bi vê re jî nivîsîna wê te jî dibe ji peyvên ji armanca wê dur.Ewa ku di vir de em dikarin kêmekê qala wê bikîn nivîskarê binav û deng ê kurd ( Mesud Mihemed ) welî rexne girekî em dixwazin di rêya vê kurte gotinê de fêrbibîn ku ka rexne çawe tê girtin. Her wiha çawe rexneyê jî binivîsîn, çawe zimanê nivîsînê jî bi karbînîn. Ji ber vê jî li gorî min pirtûkên ( Mesud Mihemed ) ji pirtûkên din ê nivîskarên kurd kêmtir nîne. Ji ber ku ev nivîskare pişt bi nivîsîn û fikrê xwe ve girê daye. Fêrî nivîsîna gotar û pirtûkan jî buye bêyî ku çavkanîyan ji tiştek din werbigire.

Ji ber vê jî dikare wekî pirtûkxaneyekî rexneyî û wêjeyî û fikrî jî temaşe bikîn. Ji wan fêrî gotar û pirtûk nivîsînê jî bibîn. Destpêka rexneya wêjeyê ji hizir û fikrên Eflaton tê wekî şîroveyekî a wêjeyê. Danîna helbestê ji pieya janerê wêjeyê nivistir û derxistina helbestvana ji komarê ev hemû destpêkên ji bo rexneya wêjyê. Edî bi dirêjayîya dîrokê heya vî serdemî bi dehan seden kitêpxaneyên rêbaza vê rexneya wêjeyê çêbûye. wekî ( Formalîst, Pêlhate Xwazan û Bingehgeran ). Ji ber vê jî rexne di virde herî zêde berbi zanîstbûnê ve çûye. Bi vê wateyê re rexneya wêjeyê alîyê zanîstî de tê de dîyare.

Di rexneya wêjeyê de mînak du mijar li ber destê teye. Rexnegir hewil dide ka kîjan ji van mijaran baştire bizane. Ev jî erkê rexneyê bi giştîye. Her çiqas rêbaza wêjeyê hewil dide bizane pêkhênerê van herdû nijaran çîne û kîjanin ? . Dîroka wêjeyê jî dixawe lêkolînê li ser her du ya bike. Rexneya wêjeyê afrênerê behemek din a wêjeyê ye. Du mijar me hene, rexne lê digire eger ne be karî lêkolîna di mijara wêjeyê de pêşeroj têde be. Xwendevan jÎ tamê jê negire wêdemê em nikarin rexneyekî ciwan û zanîstî jî binivîsîn. Eger di mijarekî wekî roman û çîrok de me nekarî kodên wê vekîn wêdemê em nikarîn bi afirînîn jî. Mesud Mihemedê rewşenbîr jî  di alîyê zimanê nivîsînê de yan jî di alîyê rexneya wêjeyê de em dikarin fikir û sudekî mezin jê werbigirîn.Her ji ber vê em dikarîn di wî demî de qala rexneya wêjeyê bikîn pêwîste temaşeyî balkêşîya rexnegir jî bikîn. Piştre jÎ balkêşîyê bidîn her mijarekî a wêjeya rexneyee jî. Mijara wêjeyê li benda karê rexneyê ye.

Rexneya wêjeyê bi giştî li ser du alîyên girîng ê wêjeyê kar dike. Ew jî ( Ruyêwê û Naverok ) e. Ev her du alî lêkolîna rexneyê di nav xwe de digire. Dema ku mijar şîrovejirin û nubûna rexneyê di nava xwe de digire asta mijarê di alîyê ru û naverokê de derdikeve. Her du alîyê mijarê ( Ru û Naverok ) giringîya wan ji yên din kêmtire.

Ev livîn , gotin û lêkolîna di derbarê rexneya wêjeyê de tê kirin, ew zanîstîn ku asta mijarê nu dike û şîrove dike. Mijareî girîng, pir wate Û hilbijartî bi destê me dikeve. Di dawîyê de ji dilî di de xwendevan di alîyê başî ya wêjeyê de. Her wiha ev ji mere eşkere dibe mijar di encama karekî rexneyî û pir wata de dibe. Di alîyê hebuna karê rexneyê de qet gomanekê jî me ne hiştîye. Di hemu wêjeyên zimanên din de jî heman fikir heye ku mijara wêjeyê hebûna wê heye.

## 4.9.Rêbaza Kilasîzim û Rexneya Wêjeyê

Di gelek pênaseyên cuda de pesna kilasîzmê hatîye kirîn. Di vî beşî de jÎ emê beşek ji wan pênaseyan eşkerebikîn ku guncavin di alîyê kilasîzmê de. Li gorî ( Ahmet Hesên Alzyat ) Kilasîzim di ziman de bi wateya ( Kevin ) yan jî ( Qedîm ) û ( Lêkolînên ) tê. Her wiha hinek fikrên din jî li ser vî zarevayî hene. Peyva kilasîk ( Classic ) ji peyva kilasîkus ( Classicus ) hatîye girtîn.  Bi wateya ( Çîn ) tê. Her wiha ev peyve wekû ( Zarevayekê bi kar hatîye bi navê kilasîzma ku ji kilasîka latînî hatîye. Peyva (kilas ) jî di ferhenga vî zimanî de rastîya wê di destpêkê de gelek eşkere ne bûye. Ji ber vê jî buye wateya xwestinê bi wateya pola xwendinê tê. Piştrejî wekî rêbazekî wêjeyî yan jî dibistanekî wêjeyî û rexneya ewrupî bi kar hatîye.

Her wiha di pênaseyek din de peyva kilasîk bi wateya berhema xwe yan jî hemu wan berhemên nîştîmanîyê ku di nava milet de hatîne nivîsandire dibêjin kilasîk. Mînak : Em dikarin hemu berhemê helbestvanên nemir ê mezin bi kilasîka wêjeyê bidîn naskirin. Lêbelê dema teza me diçe ser pirtûkxaneya wêjeyê êdî ew wateya berfireh û cîyazajî hebuna xwe nîne. Zarevayê beşê kilasîkê qalibekî dî werdigire. Di vî alîde kilasîk ji wê pirtûkxaneya wêjeyî re tê gotin ku ji berîya hemu kîtpxaneyan di sedsala 17an de Li Firansa derketîye holê. Liser  wêjeya kevin a Yunanı û roma lêkolîn kirîye.

Ev rêbaze di alîyê serdema ji dayîkbûna wê de wekî kevintîrîn rêbaza wêjeyê û rexneyê hatîye zanîn. Li ewrupa serî hildaye, Ji ber ku di destpêka sedsala 15 an de çerxa raperîn û derketina zanîstê li ewrupa serî hilda. Di virde rewşenbîrîya hunerî erk li ser milê xwe girtîye bi navê ( Kilasîzma Nu ) bi tayber li İtalya hatîye bi navkirin. Ji ber ku di vê navçeyê de yekem car bingeha wê herî zêde çêbûye. Ev jî bi koçkirina zanayê Romanîya pêkhatîye. Piştî roxandina împeretorîya ( Konstantîno ) berê xwe daye bajarên din. Di turikê rewşenbîrîya kevin a Girekî û Romanîyan de li gele xwe hilgirtîne. Di vêniştîmana nu de dest bi belavkirina mijar û kêkolînên van kel û pelên nemir kirîne.

Dema ku dibêjin li Firansa serî hildaye ji ber ku ev pirtûkxaneye eger em di beşê giştî de lêkolînê bikîn belku ruyekyê wê ê firansî jî hebe. Ji ber vê jî heya niha du fikrên cudane li ser hebûn û serhildana vê rêbaza wêjeyî. Lê belê gelek ji fikran li gorî wan li îtalya serî hildaye. Ji ber ku îtalya civakekî xwedî xalên dîyar bû.

MÎnak Ronesan û romantîzm yan Sembolîzîm bi dîyar dikarin buyerekî giştî a ewrupa bike. Wekû heyînek giştîya ewrupa jî bê navkirin. Lêbelê wekî vê rêbaza wêjeyî ku di sedsala 15 an heya 18 li welatên cuda serîhildayê û jêre gotîne rêbaza Kilasîzmê.

Bawertirîn wate ji bo navê kilasîmê ( lêkolîn kirine ) bi vê re jî lêkolîn kirina mînakên bavê wêjeya Girekîyan cihê hilgirtina wan destur û zagonên destpêkêne ku Arîsto di pirtûka xwe a binavê ( Poetîka , Hunera Helbestan ) an de qala vê kirîye. *Bi taybetî piştî wêjeya latînî bi sedema lêkolîna wêjeyê Girekîyan neşumanî kirîye. Pêşketinek mezin bi xwere anîn*[183].

Çêbûna vê rêbazê destpêka wê ji ewrupa tê ji bo îtalya. îtalîyan jî di sedsala ( 16 ) an de çend carekê Pirtûka Hunera helbestan a Horas ûArîsto wergerandîye ser zimanê xwe. Lê belê bingeha kilasîzmê li ewrupa bi temamî ne çespandîye heya rexnegirê firansî ( Biwalo ) di sala 1684 an de pirtûka ( Hunera Helbestan )

---

[183] Xalîd Dilêr , *Hêmin û Hejar dost û dijwar* , weş.dîmukrasî ,2003,r94 .

nivîsandîye. Di vê pirtûkê de bingeha kilasîzmê çespandîye û karîye rihê serdem li gorîpirensîbê bingeha bawerîya ayîlojîya Biwalo bi razîne).Ev rêbaz di destpêkê de li îtalya serî hildaye. Li firansa jî hatîye xemilandin û piştre ev kilasîzme di wêjeya İngîlîz, Elmanî, Tirk, Fars,Ereb û kurdî de  hatîye misogerkirin. Edî dîroka serhildana kilasîmê li gorî wan misogerîyan ev qas zanyarî heye. Rêbaza kilasîzmê rêbazekî gelek kevin a wêjeyê ye. Hinek çavkanîyên wêjeyî wisan nîşan didin ku rêbazek din ji vê kevintir heye.Lê belê qet belgeykê eşkere nekirîye. Di alîyek din de jî hinek çavkanî amaje bi hebuna vê didin. ev rêbaza wêjeyî tenê karê wêjeyê wî serdemî wekî rêbaza wêjeyê nasandîye. Herwiha amaje bi wê kirîye ji ber çi rêbaza Romansîzmê,Dadayîzm û Rîyalîzmê hebûna xwe hebûn. Vê rêbazê jî hebûnek taybet heye ku nayê lêkolînkirin. Amajeyên wê me berbi wê ve dibe ku rêbaza kilasîzmê li gorî kevînîya pirtûkxaneya wêjeyê hatîye binavkrin wekî ( Kevin yan qedîm ). Di hinek cihan de jî wekî ref tê amajekirin. Polek di wêjenasî , berhemê wêjeye, wêjeya cîhanî hewildayîne çarçoveyekî dîyar û wêjeyî ji boberhemên wêjeyî çêbikie. ( Pirtûkxaneya kilasîmê yan Rebaza Kilasîzmê yan jÎ Mîtoda kilasîzmê bi van hemu navan tê naskirin.

Di serî de me behsa kilasîzmê kir li ewrupa bi taybet wêjeya îtalî firansî yan jî rojava bi giştî. Di vir de pêwîste em qala kilasîzmê bikîn,li rojehalt ( Wêjeya erebî, wêjeya tirtkî, wêjya kurdî û wêjeya farisî ) di vê çarçoveyê de emê serhildana kilasîzmê destnîşan bikîn.

Serhildana rêbaza kilasîmê di wêjeya erebî û îslamê de ji ( Xelîlê kurê Ehmedê Ferhadî ) ve (  Destur û weznwê di 16 eruz û behran de dîyar kiriye û destpê kirîye. Ev  jî buye desturekî nu di wêjeya kurdî erebî, farisî û tirkî de.

Li gel vê jî helbestvanên pêşîya serdema îslamê pabendê core şêwazekı hunerî bûn. Ne dikarîn jê biçin paş êdî dirêjî bi wan wate û qesîdeyan dida û lêkolîn jî nêzik dikirin. Di karên xwe de jî ne serbest bûn.belku pêwîstbû her wateykê bibe dariştina hevokekê û amade bikin. Her yek ji helbestvanên peşîya xwe bi kartîna û wan helbestvanan di xwastina bi karbînîn. Her ji ber vê jî helbestvan wekî pêwîst ne dikarîn kar li ser nivîskar bikin. Ji bo ku em bizanin çi faktor yan ju sedemek heye ji bo hunere wêjeyê dibe amaje bi rewş û civaka serdema kilasîzmê bike. Ji berî her

tiştî serdemjî zincîrek qonaxin di meydana sîyasetê de. Ji bilî cîhanîya  hukmetekî paşayî gelek bi hêz bi qerar bû. Rewşa civakî di alîyê rewşek din de hemu jî bandorê li ser rewşa wêjeyê û kilasîzmê bi giştî dike.

Pêwîste em li gorî wan destor û zagonan biçîn ku helbestvanên pêşîya xwe peyrewyan di kirin. Ji ber ku eger wisan nekin wê wêkî helbestvanên nepesend werin nasikirin. Ji ber ku di nava wan gohdarvanan de goh didin helbestvan hinek kesî pisporin di navnîşanan de. Wekî pêşî amaje hat kirin Nabêxe Eluzbîyan helbestvanên binav û dengê pêşîya îslamê li ser pêşîya rexnegiran di be şîroveya helbestvanan. Helbestên xwe nu dikirin û hizir û fikrên xwe ê rexneyî di vî alîde nîşan didan.Herwiha kombûna helbestvanan di bazara Okaz li bajarê Medınê de hewildanekî din a karê rexneyê bû di rexneya kilasîzmê de. Helbestvanên wî demî hewildanên berbi nabûn dij bi paşa û mîr axa û serdemê nubûnê ye.

Li gel vê jî emê temaşe bikîn di derbarê îslamê de bandore bi temam hebû di serhildana rexeneyê de. Ji ber ku rewşa civaka dine nubuna agirê dijminayetîye di nava rêbazê de. Duberekî wekî hev pêşbirkên daşorîn û sedemê serekî ê çalekîya vî karê rexneyê ne.

Bi vî awayî fikrê rexnegiran derdikeve li ser beramberkirina helbestên du helbestvanan bi balşî zanîna yek jiwan kijane bi hêztire. Her wiha ew cora renxneyê rexneya take kesî ji bo me destnîşan dike. Bi vî awayî rexneya pêşîya serdema îslamê li ser tama xorusk bingeh girtîye. Her weku di vê babetê de derdikeve. Helbestvanê pêşîya îslamê ( Terîfe İbn Ebid ( rxne li ( Mutelîs ) kirîye ^y dibêje : Wqd atna sî alhm end ahtzar  binac elîye alsmrîye Med.

Terefe dibêje: ( Cmik ) bu bş ( Naqd ) ji ber ku ( Sîerî ) nîşane ku li mikê ( Naqe ) ne lemlÎ ( Beîr ) bi her rewşê di vî demî de li ser destora hunera bingehdeye. Belku rexne ji temaşekirinekî di asta hiş Û fikrên di pileya sade de di destpêkê de bû.

Di destpêka çerxa îslamê de rexne ( Pêşketinekî zêde di xwe de dibîne û eger çawe be jÎ îslamyetî gelekÎ biha û mînake kÎ nuye û wisan jî belavkirîye. Bi taybetî jî mînakên kevin û cîyawaz bûn. Çawebe jÎ naveroka gelek helbestên helbestvanan î di alîyê belavkirina îslamîyê de mînakên wê çaweye...

Li gel vê jî bingeha zagonên helbestan û hunerên wêjeyî her li ser rêça serdema îslamê mayîne. Ji ber ku îslam komekî xîlayet û ser rewşa pêşî jî maye. Peywendîyekî afrênerê her li peyketinekê bi kêmasî maye. Lê belê ev rewş gelek dirêje çen goherînekî girîng daye. Wekî wêye ku îslam karekî bi temam di jîyana aborî de kirîye. Hemu karên xîlayetî di helbestên gelek helbestvanan de maye.

Lêbelê dema ku wêjeya erebî ji serdema Emewî Ebasîyan de gohertin çêbû û pêşket. Ev jî bu sedemê ku helbestvan dabeşî serbi çîn çîn û deste deste bibe. Tenê ev ne bu ku helbestvanan fikrên xwe ê rexneyî li ser wan yê din nudike. Belku dikarîn de alîyê helbestên dşnn yan jî helbestvanên din jî kirina nubûnê diyar bike.

( Omerbn welîd Ebdulae pirs ji ( Extel ) dike Kijan ji wan ji hemu kesê helbestvantire ?

Bersiv dide : ( Eger pêde hil gotin ( sitayîşkiri ) bilindîya deme eger (Daşorîn) jî kirinê nizim bike her wiha ( Eşa ) diçe alîyê ( Qîs ) û jê dipirse vêca kî ?

Dibêje : ( Kurê Bîst wate ( Teref ) piştî min wateya xwe ye ).

Lêbelê fikrê Ebunuas rayan wisan ku helbestvan xwedîyê şopandinê ye ew di nav de rastî pirsgirêka helbest û nivîsînê ne bûye. Herî zêde jî naskirina dariştin û helbestêye ). Belgejî ji bo vî fikrıî ew e ku ( Ebunuwas ) çend fikrên rexneyî ê giran heye. Derbarê helbestên pêşîya îslamê destpêka îslam û emewîyane. Her wiha derbarê helbestvanên hevçerx ê xwe jî ( Dizivirînin ku helbestên

Nabîxe Elzubyanî gelek kar kirîye li ser helbasta ( Zuhêr ) û (îşa qeys ) wekî a herî baş zanîye. Bêyîku em sedemekê destnîşan bikîn. Herwiha rêzike ( Terîmahbn Hekinî ) gelek pê keyvxweşbû ku dibêje ( Ev baştirîn rêzikeke ( Trîmah ) gotîye. Rêzika wê jî eve.

Aza qebzit nfs altrmah axlft Erî alcd wastrz eynan qsad

Gelek caran hebu ku ebu nwas di hukma giştî de derdikevt. Bi taybet di dema rexnegirtinê de. Ji bo wêne alîyê ( Cerîrî ) digirt û di got : Baştirîn helbestvan derarê ( Beşarîş ) di got : Helbest geleke û dilkêşe di têbînîyên çerxa emewî û ebasîyan de.

Ev tê ber çavê me ku rexneya wan rexneyekî zanîstî û rewanbêjî bû. Pêwîst nake helbestvan hewil bide komekê çêbike piştre başî û xirabîya helbestê destnîşan bike. belku her bi xwe dikare vî karî bike.

Di vî rewşa serî de her zêde alîyê akademî û zanîsta karê rexneyê derdikeve. Her wiha alîyê rewanbêjî û bandora wê a di rexneyê de jî dîyar dibe. *Ev jî dizivire ji bo çend helbestvanên rexnegir. Di rastîyê de helbest wekî kelopelekî nîşanî hemu kesekê dide. Ji ber vê jî dema goh didin helbestan raste rast bihayek ji bo wê tê danîn. Hemu kesek di dema guhdarkirina helbestan de di kare karê rexneyî encam bide. Ev jî li gorî hêza xwe û fêmkirina ji rexneya wêjeyê tê.*[184]

---

[184] Newzad Ehmed Eswed , *hozanêtî têksit û şîrînya vexwandinê* , weş . Renc slîmanî 2001,r42 .

## ENCAM

Di dawiya van lêkolînan de em gihiştin wan encamên jêrê:

1. Rexneya wêjeyîy êke jwan karên gring jbo helsengandana metna edebî û berçav rûnî jbo ew kesên metnên edebî dxunin . Di alyên edebî gelek metin hene ku mrov ni karî bi hasanî û bi ekadîmî li ser wan bi axavî , lê karên rexney ji bo wan metna di xebtin .
2. Herwisa Rexneya Wêjeyê Beşeke ji wan zanîstane ku ji hemûyan re dibêjin ; Wêje nasî , beşên herî giring jî ( Dîroka Wejeyê, Rexneya Wêjeyê û Rêbaza Wêjeyê ) ye. Rexneya wêjeyê jî pêktê ji nasandina nirx û bihayê berhemên wêjeyî û şîrovekirina wan bi awayekî baş yan xirap.Dikare vê berhemê saz bike û çavkanîyên wê nîşan bide. Rexneya wêjeyê jî çiqek ya wêjenasîyê ye. Her netewek xwedîyê wêjeyekê be zanîst û qalibek yê xwe jî heye û cîyawaze ji beşên din jî. Ji ber ku sinorekî taybet di wêje nasîyê de heye. Lê belê haya niha dinava gelên rojhelat de yan jî dınava netewan de sinorek ji bo vî beşî ne hatîye danîn.
3. Her wiha di çend rêzek din de em dikarin di derbarê rexneya wejeyê de bêjîn Rexneya wêjeyê pêktê ji çalekîya afrêneran ku rexnegir pê bilindibe Bê goman şîrovekirina berhemên wêjeyî çawenîya rengvedanê heyînên cor bi cor ê jîyanê di nava berheman de dîyar dike. Hinek caran wekî kêlîyek a zanîsta wêjeyê di rexneya wêjeyê de tê nîşankirin. Rêbaza wêjeyê û dîroka wêjeyê jî di nava xwe de digire. Li gorî ramanê hinek zanayan rexneya wêjeyê rêgezeke ji rêgeza wêjeyê.
4. Rexneya wêjeyî di serdema nozdan da pêşveçûneka gelek zor di alyên ekadîmî dîtye , lê pişt serdema nozdan da çi goranek bi xora nedîtye ,herwesa pêwane û erkên rexneyî dnav herdukanda cuda hebû çunkî berê serdema nozdan da mijyê mrovî bi metna da difkrî lê yên modêrnîzm bi xoşî û beser birdna deman difkrî .

## Çavkanî


Ahlam Minsur , *bînay hunerî di kurte Çîroka Kurdî da* , weş.Serdem , Hewlêr 1999 .

'Alî Tahîr Hesen , *rexneya bunyadgerî di tiyor û praktîzekrinê* , ,çapa îkê , weş,dezgeha Serdem , Silîmanî 2008.

Anwer Muhimed Tahir , *çend gutarekê rexneyî* , ç1 ,1988.

'Arf hîtu , *Hizir û Dîtin* , weş. Êketya nivîserên kurd, Dihok 2004 .

'Bdalirhmin 'Bidulxefur Husin , *ezmûnên nûxwazî di alyên grûpên nukrî* , zanîngeha Koye 2012.

'Bdalle Yasîn 'Elî , *peydabûnî rexney edebî le şî'rî klasîkî kurdî ta cengî cîhanî yekem* , (master) , Hewlêr 1988.

'Bdalxalq Î'qubî , *Rexna edebî û dibistanan* , weş.Aras , Hewlêr 2007 .

'Bdî Hacî , *Çend tiyorên rexneya edebî* , çapa îkê , dezgeha Spîrêz , weş . Hacî Haşm , Hewlêr 2008 .

'Bidalqadir Muhimed Amîn ,*Wêneya şî'rî di edebyata romansîzm ya kurdî* , çapa îkê weş. Serdem , Silîmanî 2002 .

'Bidalqharî Şêx , *Ezmûnên hozana kurdî* , weş.Pak , Hewlêr 2001 .

Celal Mustefa , *Biyavê xiwandinê* , ç1 , ji weşanên ekteya nivîserên kurd – Dihok , weş .Hawar , Dihok 2004 .

------------------ , *biyavê xwandinê* , (vekolîn) , weş. Êketya nivîserên kurd Dihok 2004 .

Cemîl Muhemed , *Çîrokên mîllî yên filklorî* , weş. Êketya nivîserên kurd, Dihok 2005.

Dîwan û ferhengî Nalî , *lêkolînewe û sax kirdnewe* , dr.Marf Xeznedar , Bexda Dîwanî Kurdî , çapî sêyem , Hewlêr1973.

Dîwanî Nalî , *lêkolînewe û lêkdanewey 'Bidulkirîmî Muderîs û Fatih 'Bdaulkirîm û Muhimdî Melakerîm* , Bexda 1976.

*Dîwanî Salim* ,çapî duwem , Hewlêr 1972.

Ebdula Agrîn , *bandora hizir û netewe li ser çîroka kurdî li kurdistana 'Îraqê (1970-1961)* ,ç1, weş ,zanîngeha Selahedîn , Erbîl 1999 .

'Ebdula Agrîn , karîgerî bîrî netewey le geşesendî kurte çîrokî kurdî da , weş. Zankoy Selahedîn , Hewlêr 1999 .
Êbîh Muhimed Husin , *afret di çîroka kurdî da* , weş.îketya nivîserên kurd , Dihok
------------------------ , *çend rêyek bo deqê* , ç1 , weşanên êketya nivîserên kurd – Dihok , weş , Hawar , Dihok 2004 .
Ehmedî Xanî , *Mema û Zîn* , têkista krîtîk û tircme , Mosko 1962.
'Elaedeyn Sicadî , *Edeba kurdî û vekolîna le edeba kurdî* , weş. Me'arf , Bexda1967 .
------------------- , *deqekanî edebî kurdî* , Bexda1978.
------------------- , *Edebî kurdî û lîkolînewey edebî kurdî* , Bexda 1968.
Emîn 'Bdulqadir , *têksit di navbera gotara rexneyî û rêbazên edebî da* , weş. Êketya nivîserên kurd, Dihok 2008 .
Emîn Feyzî Beg , *encûmenî edeyban* , Bexda 1983.
Eristotalîs , *Hunerî Şî'rî* , weş.xana wergêranê , Silîmanî 2005.
Esma'îl Resul , *çend basêk derbarê rexneya edebî* ,Bexda 1981.
'Ezîz Gerdî , *kêşên hozanî dinav klasîkyeta kurdî û cuday dinavbera 'Eruza 'Erebî û Farsî* , weş .wezareta roşnibîrî , Hewlêr ,1999 .
'Ezîz Gerdî , *rewanbêjî da edebyata kurdî da* , weş.şarewanî , Hewlêr 1975.
--------------- , *rexne û edeb* , weş,hiwadis , Bexda 1974.
--------------- , *Serwa* , dezgeha aras , weş , Aras , çapa îkê , Hewlêr 1999 .
Fazîl Mecîd Mehmud , *xiwezayî di hozanên Goran da* , çapa îk ê , weş. Serdem , Silîmanî 2007.
Fazil 'Mir , *awrek le zimanî kurdî* , dezgeha ya çap û weşanê , weş ,wezaretî perwerde , Erbîl 2004 .
Fazl 'Mir , *zimanê sêyem , kanî ya heruher nukrin* , weş, kolîja şerî'ê , Dihok 2001 .
Ferhad Pîrbal , *hozana nû ya kurdî , (1985-1898)* .dezgeha kurdistan , Hewlêr 2005 .
---------------- , *rîbazên edebî* , çapa îkê, weş.Minare , Hewlêr , 2006.
Fuad Reşîd , *bunyadgerî di roşnibîrî û rexneya edebî ya kurdî* , îketya nivîserên kurd çapa îkê, weş.Arabxa , Kerkuk 2007.
Goran, *dîwanî Goran* , Muhemdî Mela Kerîm , weş.korî zanyarî îraq, Bexda 1980.
Hacî Qadrî Koyî , *dîwan* , vekolîn( Serdar Himîd , Karîm Şareza ) , Bexda 1986.
Hawjîn silîwe ,*binyata wêneyên şî'rî di şî'rên şîrko bêkes*, weş. Serdem, Sliîmanî
Heme Se'îd Hesn , *hizru şêwaz di çîroka kurdî da*, weş.Aras , Hewlêr 2005.

Hêmin , *hizir û helwêst û hozan* , ç1 , weş . Dezgeha dîmukrasî , Slîmanî 1993

Hesen Caf ,*çîrokî niwêy kurdî* , weş .'Ela , Bexda 1985 .

Heval Selîm Teyb , *bunyadgerî di nav rexneya kurdî da* , destipêkê heta sala 2003ê , çapa îkê , *dezgeha spîrêz* , weş , Hacî Haşim , Hewlêr 2006.

Hîmdad Husîn , *derwazyek ji bo rexneya edebî ya kurdî* , çapa îkê , weş,Mukiryanî , Hewlêr 2007.

----------------- ,*rêbazên edebî* , çapa îkê , weş,Mukiryan , Hewlêr 2007 .

Husîn 'Arf , *çîroka hunerî ya kurdî* ,1960-1925 , weş.Dar Tba'e ,Bexda 1970 .

Hoşeng şêx muhemed , *gutarên rexneyî* , ji weşanên îketya nivîserên kurd – ,Dihok 1986.

------------------- , *gutarên rexneyî* , (witar) , weş. Êketya nivîserên kurd ,Dihok2005.

Husîn 'Lî Şanuf , *şî'rî şa'îranî hevçerx* , wer(Şikur Mustefa) , Bexda 1975.

Husîn Muhimed 'zîz , *yaqut û zimrrutî kurdî* , (Siruşt û Ciwanî ) ,berg3 , weş .Sîma .Slêmanî 2007.

'Îmad Weysî Xald , *cefeng dihozana ryalsitîka kurdî da devera behdînan 1991-1970* , dezgeha spîrêz , weş, wezareta perwerdê ,Hewlêr 2004.

Kakey Felah , *karwanê hozana nû ya kurdî* , bergê îkê , weş.zanîngeha selahedîn , Hewlêr 1987.

Kameran Mukrî ,*çîroknivîs* , weş.Sumerye , Bexda 1988 .

Kamil Husin Besîr , *rexne sazî û dîrokên peyrewkirin* , Bexda 1983.

Kemal Mîrawdelî ,*felsefe wicwanî* , (Îstatîka) , weş, qan' , Silîmanî 2005.

Kemal M'ruf , *edebyata kilasîk û nû xiwazya kurdî* , weş.Jîn,Silîmanî 2003.

Kerîm Deştî , *edeb û felsefe* , weş.Şivan , Silîmanî 2004.

Kerîm Hîsamî, *yadî hêmin* , weş.Serdema nû , Siwêd 1987.

Marf Xeznedar , *kêş û qafye le şî'rî kurdî da* , Bexda 1962.

-------------------- , *lebabet dîroka edeba kurdî* , weş. Miwesse Alraqye , Bexda 1984.

Mehuy , *dîwan , vekolîn ( Mela 'Bdalkirîm Muderîs û Muhimdî Mela Krîm ) ,çapa dûyê* , Bexda 1984.

Mela 'Bdalkirîmî muderîs, *bedî' û zeman û 'eruza namî* , weş, dar Cahiz ,Bexda 1991.

Mes'ud Muhemed , *zarava pêwanesazî* , weş , Roşnibîrî , Sumer , Bexda 1988

Mhimd Bekir , *pexşane şî'rî kurdî* , weş .Aras , çapa îkê ,Hewlêr ,2004.

Muhemed Me'ruf fetah , Sebah Reşîd Qadir ,*hindek alyên morfolojî* , weş ,Rûn
Muhimed mela kerîm , *nalî le kilawrojney şî'rekanî da* , Bexda 1979 .
Nefîsa asma'îl hacî , *teknîka vegêranê di kurte çîroka kurdî Fazl 'Umerî da* , ç1, weş , îketya nivîserên kurd –Dihok , weş .Hawar ,Dihok ,2005 .
Newzad Ehmed Eswed , *hozanêtî têksit û şîrînya vexwandinê* , weş . Renc Slîmanî ,
Nî'mit Alle Hamad Nihêlî , *deravek ji rexn*ê , weş.Hawar , weş. Êketya nivîserên kurd , Dihok 2010 .
----------------------------- *, şêwazgerî* , dezgeha spîrêz , çapa îkê , weş , hacî haşm , Hewlêr2007 .
---------------------------- *,pêlê, rexneyî –komeka vekolîna di têkistanda* , çapa îkê , weş , Hacî Haşm , Hewlêr 2007 .
Perêz Sabîr , *rexna edebî ya kurdî û pirsa nûkrinê* , dezgeha Aras , weş.Aras 2006.
--------------, *bînay hunerî di çîroka kurdî da* , heta cenga cîhanî ya dûyê , weş.Serdem , Silîmanî 2001 .
Refîq Hîlmî , *Hozan û wêjeya kurd,* bergî êkê , weş.xwêndinî bala , Erbîl 1988.
--------------- *,şî'rû edebyatî kurdî* , çapî duwem , Hewlêr1988 .
Reşîd Findî , *geryanek di nav edeba kurdî* , weş. Êketya nivîserên kurd ,Dihok 2005
--------------- , *hizrînek di zimanê kurdî da* , weş. Êketya nivîserên kurd,Dihok 2006.
Rolan Bart , *çêja deqê* , çapa îkê, weş.Minare , Hewlêr 2007.
Selam Balayî , *liber derzînka têkistan* , weş. Êketya nivîserên kurd Dihok 2004.
Selîm Reşîd êalh *„şêwaz di çîroka kurdî da* , weş.wezareta roşnibîrî , Silîmanî 2005.
Semed Ehmed , dinav bazneya deqê da , ç1 , di blavkirya wezareta roşnibîrî , Slêmanî 2003 .
Şêx Rezay Talebanî , *dîwan* , Bexda 1946.
Şikrî Muhimd 'yad , *tiyorên edeb* , wergîran(Serdar Ehmed) ,weş.Mardîn , Hewlêr 2010.
Siwarey Êlxanî zade , *tapobume lîl* , ç1 , weş ,Salhan , Taran 1379 .
Siyar Temir *, şanoya hevçerx û hev dîtin* , weş. Êketya nivîserên kurd,Dihok 2005 .
şukirye Resul , *teknîka vegîrranê di çîroka marf berzincî da* , ç1 , weş , wezareta perwerdê , Erbîl 2005 .
'Usman Deştî , *nawerkên siyasî û civakî di hozanên hêmin da* ,weş.ofsêtî tîşk , Silîmanî 2003.

Xalîd Dilêr , *Hêmin û Hejar dost û dijwar* , weş.dîmukrasî 2003 .

Xurşîd Reşîd Ahmed , *rîbaza romantîk* ya kurdî , weş . Cahîz , Bexda 1989.

Yasrê Hesen , *wexerek di nihênyên deqêda* , ji weşanên îketya nivîserên Kurd , Dihok , weş . Hawar 2004 .

---------------- , *binyatê rîtmê di şî'ra nû ya kurdî da* ,weş .Spîrêz , Hewlêr,2007

'Zedîn Mustefa Resul , *edebyata nû ya kurdî* , weş , wezareta xiwendna blind , Erbîl 1989 .